



K.T

ZANINGEHA VAN YÜZÜNCÜ YİLÊ

ENSTÎTÛYA ZIMANÊN ZINDÎ

ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Ê ÇANDA KURDÎ

TEZA LÎSANS A BİLIND

LAYENÊ PERWERDEKIRINÊ DI GOTINÊN MEZINAN DA

AMADEKAR

Mohammad Nooruldeen SAEED

ŞÊWIRMEND

DR. ÖĞR. ÜYESİ KEMAL KAYA

WAN- 2019

T.C
VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENİSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI

Yüksek Lisans Tezi

ATASÖZLERİNDE EĞİTİM- ÖĞRETİM YÖNTEMLERİ

HAZIRLAYAN
Mohammad Nooruldeen SAEED

DANIŞMAN
DR. ÖĞR. ÜYESİ KEMAL KAYA

VAN- 2019



T.C.
VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
Yaşayan Diller Enstitüsü

TEZ KABUL TUTANAĞI

YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Dr. Öğr. Üyesi Kemal KAYA danışmanlığında, Mohammed Nooruldeen Saeed SAEED tarafından hazırlanan “Layenê Perwerdekirinê Di Gotinên Mezinan Da” adlı bu çalışma, 10/06/2019 tarihinde aşağıdaki jüri tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı'nda Yüksek Lisans Tezi olarak kabul edilmiştir.

Başkan(Danışman) : Dr. Öğr. Üyesi Kemal KAYA

İmza: 

ÜYE : Dr. Öğr. Üyesi Nesim SÖNMEZ

İmza: 

ÜYE : Dr. Öğr. Üyesi Mazhar TUNÇ

İmza: 

ÜYE :

İmza:

ÜYE :

İmza:

ONAY: Yukarıdaki imzaların, adı geçen öğretim üyelerine ait olduğunu onaylıyorum.

10/06/2019
Prof. Dr. Yürat DEMİREL
Enstitü Müdürü


BİLDİRİM

Hazırladığım tezin/raporun tamamen kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi taahhüt eder, tezimin/raporumun kâğıt ve elektronik kopyalarının Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Kürt Dili ve Kültürü ABD arşivlerinde aşağıda belirttiğim koşullarda saklanmasına izin verdiğimi onaylarım:

- Tezimin/Raporumun tamamı her yerden erişime açılabilir.
- Tezim/Raporum sadece Yüzüncü Yıl Üniversitesi yerleşkesinden erişime açılabilir.
- Tezimin/Raporumun yıl süreyle erişime açılmasını istemiyorum. Bu sürenin sonunda uzatma için başvuruda bulunmadığım takdirde, tezimin/raporumun tamamı her yerden erişime açılabilir.

[Jüri Tarihi]

[İmza]

Mohammad Nooruldeen SAEED

KURTE
MOHAMMAD NOORULDEEN SAEED
LAYENÊ PERWERDEKIRINÊ DI GOTINÊN MEZINAN DA
TEZA LÎSANSÂ BÎLÎND
ZANÎNGEHA VAN YÛZÛNCÛ YIL
ENSTÎTÛYA ZIMANÊN ZINDÎ
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ
Şewirmend: KEMAL KAYA
2019, Wan. IX + 122

Ev xebate li ser layenê perwerdekirinê ne, di gotinên mezinan da. Gotinên mezinan di hemû layenên civakî da pêwîst û pêdivîne. Ji ber vê yekê di vê xebatê da hewcebûna rawestina li ser perwerdekirina di gotinên mezinan da, bi girîng dît û analîza wan bi awayekî akademîk hat dîyarkirin.

Gotinên mezinan wek berhemeke gelên kevnare jibo îro û her wextî tîn bikaranîn. Anko e'ynika gelane ku hemû astên civakê ronî dikin.

Ev xebate jî, ji despêk, du beşan û encamî ve pêktê.

Beşa yekem “*Di Folklorê Kurdî Da Gotinên Mezinan*” Beşa Duyem “*Di Gotinên Mezinan Da Layenê Perwerdekirinê*” hatîne behiskirin.

Peyvên Mîheng : Têgeh, Ziman, Çand, Perwerdehî û Gotinên Mezinan.

Hejmara Rûpelan : 122

Şewirmendê Tezê : Dr.Öğr. Üyesi Kemal KAYA

ÖZET

Mohammad Nooruldeen SAEED
ATASÖZLERİNİN EĞİTİM- ÖĞRETİM YÖNÜ

Yüksek Lisans Tezi
VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANA BİLİM DALI
DANIŞMAN: KEMAL KAYA

2019, Van. IX + 122

Bu çalışma atasözlerinin eğitim açısından nasıl bir önem taşıdığını ortaya çıkarma çabası olarak ortaya çıktı. Bilindiği gibi atasözlerinin toplumsal etkisi oldukça geniş bir yelpaze teşkil etmektedir. Bu nedenle çalışmada atasözlerinin çeşitleri üzerinde durularak akademik bir bakış açısıyla konu farklı açılardan bir değerlendirmeye tabi tutulmuştur.

Atasözleri adeta bir milletin geçmişini ve toplumsal hayatının birçok veçhesini günümüze yansıtan birer ayna konumundadır. Toplumsal hayatın farklı yönleri ve toplumun eğitimi ile ilgili olarak atasözlerinin önemini ortaya koymayı amaçlayan bu çalışma iki bölümden oluşmaktadır.

Birinci bölümde “*Kürt Folklorunda Atasözleri*”, ikinci bölümde ise “*Atasözlerinin eğitim-öğretimde kullanımı*” üzerinde durulmuştur.

Anahtar Kelimeler : Kavram, Dil, Kültür, Eğitim ve Atasözleri.

Sayfa Adedi :122

Danışman : Dr. Öğr. Üyesi Kemal KAYA

ABSTRACT

Mohammad Nooruldeen SAEED

THE IMPORTANT OF PROVERBS IN EDUCATION&TEACHING

MASTER THESIS

VAN YUZUNCU YIL UNIVERSITY

INSTITUTE OF THE LITERATURE OF LIVING LANGUAGES

KURDISH LANGUAGE AND CULTURE DEPARTMENT

SUPERVISOR: KEMAL KAYA

2019, Van. IX + 122

This study emerged as an attempt to reveal the importance of proverbs in terms of education. As it is known, the social effect of proverbs constitutes a wide spectrum. For this reason, the subject has been evaluated from different perspectives with an academic point of view by focusing on the types of proverbs.

Proverbs are like mirrors reflecting the past of a nation and many aspects of its social life. This study, which aims to reveal the importance of proverbs in relation to different aspects of social life and education of society, consists of two parts.

In the first part “Proverbs in Kurdish Folklore” and in the second part “The use of proverbs in education” is emphasized.

Key Words :Concept, Language, Culture, Education and Proverb.

Number of pages : 122

Thesis Advisor : Dr.Öğr. Üyesi Kemal KAYA

PÊŞGOTIN Û SPASÎ

Ev xebate li ser layenê perwerdekirinê ne, di gotinên mezinan da. Gotinên mezinan di hemû layenên civakî da pêwîst û pêdivîne. Ji ber vê yekê me di vê xebatê de hewcebûna rawestina li ser perwerdekirina di gotinên mezinan da, bi girîng dît û analîza wan bi awayekî akademîk dîyar kir.

Gotinên mezinan wek berhemeke gelên kevnare jibo îro û her wextî tên bikaranîn. Anko e'ynika gelane ku hemû astên civakê ronî dikin.

Di vê xebatê da me gelek astengî kişandin. Kêmahî û durîya hinek çavkanîyan astenga me a herî mezin bu. Dixwazim wê yekê bînim ziman ku ev xebate çiqas hindik be jî, pêwîstîyek a folklorî di derbarê gotinên mezinan da pir bike.

Ez dixwazim wê helbesta mamoste û zanayê Kurdan Ehmedê Xanî amaje bikim dema di bêje:

Ev name ger xirabe ger qenc kêşaye me digel wê sed renc

Ev xebate jî, ji despêk, du beşan û encamî ve pêktê.

Beşa Yekem: Ev beşa bi navê “*Di Folklorê Kurdî Da Gotinên Mezinan*” bi giştî behsa gotinên mezinan dike.

Beşa Duyem: Ev beşe jî li jêr nav û nîşan behsa “*Di Gotinên Mezinan Da Layenê Perwerdekirinê*” dike. Bi gotineke din, behsa perwerdekirina gotinên mezinan di nav civakê da dike.

Ez berîya her tiştî spasîya Xwedayê mezin dikim u mamosteyên hêja û rêzdar ên beşe zimanê Kurdî li Zanîngeha Van Yüzüncü Yil ê dikim ku bi ked û dilsozîyeke herî zêde bi me ra westîyan. Her wiha ez pir spasîya. Dr. Kemal KAYA dikim ku erkê serpereştîkirina vê lêkolînê kirî.

Herwisa pir ji dil spasîya mamosteyê qedirgiran Dr. Nesim SÖNMEZ Zanîngeha Van Yüzüncü Yilê û Dr. Mazhar TUNC dikim ku bi pêşniyarî û rê nîşankirina wê ve gelek arîşe li ber min ronî bûn. Hem di warê Kurdîzanebûnê da hem jî di warê akademîk da alîkarîyên wan gelek çê bûn. Ji ber parvekirina fikir û ramanên xwe yên nirx bilind. Ji bo sererastkirin û xwandina tezê ji lêkolîner Ehmed

SERHEDÎ ra jî gelek spasdarim û mala wî ava. Her wiha di pêvajoya vê xebatê da ji bo sebr û tehemûl û alîkarîya wan kesên ku yarmetî dane me.

Dîsan vê xebatê pêşkêşî dayîk û bavên xwe dikim ku hertim alîkarên min ên maddî û manevî bûn zêdebarî xweşik û bira û hemû malbata xwe dikim.

Herwisa ez ji alîkarên xwe yên hêja û delal birêzan Hecî CEFER, Se'ed MÎHEMMED, Barzan KOÇERÎ û Mehdî MÎHO re jî bi dilgermî spas dikim. Ku gelek alîkar bûn digel min, her ji destpêkê û heya dawîyê. Û li dawîyê spasî ji bo her kesê ku alîkar bûye digel me jibo bi dawî anîna vê lêkolînê.

Mohammad Nooruldeen SAEED

Wan-2019

NAVEROK

KURTE	i
ÖZET	i
ABSTRACT	iii
PÊŞGOTIN Û SPASÎ	iv
NAVEROK	vi
KURTEBÊJE	ix
DESTPÊK	1
1. Têgeh û Pênaseyên Gotinên Mezinan	1
2. Têgeh û Pênaseyên Folklorê	5
3. Cureyên Folklorê	6
4. Dîroka Komkirina Gotinên Mezinan	15
5. Cureyên Gotinên Mezinan	20
6. Jêderên Gotinên Mezinan	22
6.1. Qur'ana Pîroz.....	22
6.2. Fermudên Pêxember (s.x.l).....	25
BEŞA YEKEMÎN: DI FOLKLORA KURDÎ DA GOTINÊN MEZINAN ..	29
1.1. Di Folklorê Da Cihê Gotinên Mezinan:	29
1.2. Gotinên Mezinan Lidef Kurdan	31
1.3. Di Gotinên Mezinan Da Alfyê Olî	32
1.4. Di Gotinên Mezinan Da Naverok	35
1.5. Taybetmendiyên Gotinên Mezinan	39
1.6. Di Gotinên Mezinan Da Rûxsar	41
1.7. Di Gotinên Mezinan Da Kêş, Serwa û Rîtim	43
1.7.1. Kêş:	43
1.7.2. Serwa:.....	45
1.7.3. Rîtim:	47
1.8. Di Hozanê Da Cihgirtina Gotinên Mezinan	48

1.9. Di Çendîn Welatan Da Yek Gotin	50
1.10. Di Yek Gotinê Da Wekhevî:	53
1.11. Di Yek Gotinê Da Dijayetî	55
1.12. Di Gotinên Mezinan Da Vegêr	56
1.13. Îdyom (Idiom)	60
1.14. Cudahîyên Gotinên Mezinan û Îdyoman	62
BEŞA DUYEM: DI GOTINÊN MEZINAN DE LAYENÊ PERWERDEKIRINÊ	66
2.1. TÊGEHÊN PERWERDEKIRINÊ	66
2.2. PIRAKTÎKA PERWERDEKIRINÊ DI GOTINÊN MEZINAN DA ...	73
2.2.1. Perwerdekirin Li Ser Rastîyê	73
2.2.2. Perwerdekirin Li Ser Karkirinê	75
2.2.3. Perwerdekirin Li Ser Kêm Axaftinê	76
2.2.4. Perwerdekirin Li Ser Çareserkirina Arîşan.....	78
2.2.5. Perwerdekirin Li Ser Zû Hişyarbuna Spêdeyan	78
2.2.6. Perwerdekirin Li Ser Bi Destveyînana Maldarîyê	79
2.2.7. Perwerdekirin Li Ser Nerakirina Minetan.....	80
2.2.8. Perwerdekirin Li Ser Zû Encamdana Karan	81
2.2.9. Perwerdekirin Li Ser Hilbijartina Hevalan	82
2.2.10. Perwerdekirina Jinan	83
2.2.10.1. Perwerdekirin Li Ser Neguhdarîkirina Jinan	83
2.2.10.2. Perwerdekirin Li Ser Lêxistina Jinan	84
2.2.10.3. Perwerdekirin Li Ser Hilbijartina Hevjinê	84
2.2.10.4. Perwerdekirin Li Ser Neînana Du Jinan	86
2.2.11. Perwerdekirin Li Ser Rêzgirtina Mezinan	86
2.2.12. Perwerdekirin Li Ser Hizrkirina Mirinê.....	87

2.2.13. Perwerdekirin Li Ser Mêrxasîyê.....	88
2.2.14. Perwerdekirin Li Ser Xêrkirina Bi Hişyarî	89
2.2.15. Perwerdekirin Li Ser Encamdana Karan Bi Binyateke Baş.....	89
2.2.16. Perwerdekirin Li Ser Hişyarbûna Ji Dijmin.....	90
2.2.17. Perwerdekirin Li Ser Yekgirtinê	91
2.2.18. Perwerdekirin Li Ser Nebelavkirina Gotegotan	92
2.2.19. Perwerdekirin Li Ser Rêzgirtina Cîranî	93
2.2.20. Perwerdekirin Li Ser Deyîndarîyê.....	94
2.2.21. Perwerdekirin Li Ser Merdanîyê	94
2.2.22. Perwerdekirin Li Ser Nerakirina Xeman	95
2.2.23. Perwerdekirin Li Ser Çandina Darûberan.....	95
2.2.24. Perwerdekirin Li Ser Vîyana Welatî	96
2.2.25. Perwerdekirin Li Ser Azadîyê	97
2.2.26. Perwerdekirin Li Ser Nerahêlana Xwezîyan.....	97
2.2.27. Perwerdekirin Li Ser Nefirota Erdê (Zevîyê).....	98
2.2.28. Perwerdekirin Li Ser Nerakirina Hesûdîyê	98
2.2.29. Perwerdekirin Li Ser Nekirina Pesnên Xwe	99
Gotinên mezinan û îdyomên di tezê da hatîne bikaranîn	100
ENCAM.....	113
ÇAVKANÎ.....	116

KURTEBÊJE

amd.	: Amadekar
b.n.	: Berhema navborî
b.	: bin
br.	: Berhevkirin
c.	: Cild
ç.	: Çap
g.	: Gotar
g.n.	: Gotara navborî
hej.	: Hejmar
hwd.	: Her wekî din
s.x.l.	: Slava Xwedê lebe
r.x.l	: Razîbûna Xwedê lêbe
r.	: Rûpel
k.	: Koçî
tîp.	: Tîpguhezî
vgz.	: Veguhezêr
wer.	: Wergêr
yd.	: Yên din
z.	: Zayînî

DESTPÊK

1. Têgeh û Pênaseyên Gotinên Mezinan

Di zimanê Kurdî da gotinên mezinan, gotinên bav û bapîran yan jî gotinên berê jibo gotinên mezinan hatîne bikaranîn (Sindî, Bedirxan, 1989: 8). Kurdên Îran, Tirkîyê, Ermenîya û Gurcîya jî dibêjinê “Qiseyî bavan”. Kurdên Azerbaycanê û Komarên Asyaya naverast jî dibêjinê “Gepîdî bavan” (Şukrîye Resul, 1984: 9). Herwisa di zimanê ‘Erebî da jî dibêjinê; Derb el–mesel, emsal, mesel û beyan. Di zimanê Osmanî da îbare, beyan û îstîlah jî jê ra hatîye gotin. Di Tirkî da jî “Atasözü” derbas dibe (Mazî, Çîya, 2006: 13). Li vir bo me dîyar dibe ku raste navê gotinên mezinan ji hev cuda ne. Lêbelê di ramanê da hemû wek hev in.

Gotinên mezinan ji çend peyvekan yan hevokekê yan bêhtir pêk tê. Ramanek hûr û kûr dide dest. Gotinên mezinan ji aliyê kesên jîr û zana ve bi zimanekê ron û rehwan hatîne nivîsandin. Astberzîya gotinên mezinan û sivikî û rehwanîya wan bûye sedemê mayîndeya wan di nava civakî da. Herwisa ev bûye sedemê veguhastina wan, ji bavan bo kur, nevî û nifşê dahatî. Gotinên mezinan kurt û rehwanin ji ber wê çendê ji beşên din ên folklorê bêhtir hatîne jiber kirin û bikaranîn. Kurtîya gotinên mezinan bûye sedemê parastina wan. Her gotineke mezinan di ramana xwe da rexneye yan çareye yan jî hukmî di navbera du kesan da dike. Em dikarin bibêjin babetê gotinên mezinan yê Kurdî li ser hemû bîyavên jîyanê hene çî cotîyarî, terş û tewal, deyndarî, zewac, rêzgirtina dayîk û bavan, parastina hevalîniyê û hwd. hene.

Tê gotin ku serûkanîya gotinên mezinan gundin anko jîyana siruştîye. Ji ber vê yekê jî li gundan xwandin û nivîsîn kêr bûye. Lewre zêde hewl dane jiberkirina gotinan. Dibe kesek li gundan xwandin û nivîsînê nezanibe. Lêbelê dibe bibe jêderek û çavkanîyek jibo komkirina çendîn gotinan. Tê gotin ku her kesekê ji navsalveçûyî biçê ber dilovanîya Xwedê, çendîn gotinan jî digel xwe dibe. Lewre heta vê demê xebateke mezin jibo komkirina gotinên mezinan ên Kurdî nehatîye kirin. Bi tenê beşeke kêr nebe. Her çende di van salên borî da xebat jibo komkirina folklorê bi

giştî û gotinên mezinan bi taybetî hatîye destpêkirin. Lêbelê dewlemendîya folklorê Kurdî pêdivî bi xebat û westîyanek bêhtir heye. Heta ku hemû folklor ji navçûnê xelas bibe.

Gotinên mezinan beşeke girîng a edebê folklorê pêk tînin. Jiber ku hemû kes xwe di gotinên mezinan da dibînin, çî mezin yan genc yan jî zarok. Gotinên mezinan weke jêderê bawerpêkirî ji alîyê hemû taxên civakî ve hatîye pesendkirin. Weke axaftinek û rênîşanderek bo başîyê û çakîyê tê bikaranîn.

Mînak:

Eger li gundekê du bira bi şer çûban, kesek bi navsalçûyî çûba bo pêkanîna wan. Ji wan ra gotiba “eger bira piştî bira bê, meger qeder layî Xwa bê” (Reşaş, Hemîd, 2010: 11). Yekser da ji kerb û kîna xwe beramber birayê xwe ête xwarê. Çî kerb û nevîyan di navbera wan da hebe da dest jê berdin û car din daçîne serûstûyê hev. Da bi vê gotinê wê kerb û nevîyanê vemirînin.

Gotinên mezinan weke gelek babetên din pênaseyeka wekhev nîne. Ji ber ku her pênaseyek ji ya din cudahî heye. Ji ber ku her zanayekê li gor bîr û boçûnên xwe pênasekirîye. Gotinên mezinan ji alîyê çendîn nivîskar û folklornasan ve hatîye pênasekirin. Em jî dê li jêr hinek ji wan pênaseyan bidine xweyakirin.

Elaedîn Secadî: Bi vî rengî gotinên mezinan pênase dike; Gotinên mezinan çend ramanekin. Di zimanê Kurdî da hinek gotin bi rengeke kurt hatîne nivîsîn. Lêbelê wateyeka bilind di nava wan da heye (Ansîklopedîya Parêzgeha Duhokê, 2017: 199).

Çîya Mazî: Bi vî rengî gotinên mezinan pênase dike; Gotinên mezinan hevokên bi darazî, hukmî û bi gotinên nava gel va jibo vegotin û rexneya tiştêkê, bûyerekê an ramanekê hatîne ziman (Mazî, Çîya, 2006: 13). Ev pênase behsa wê çendê dike ku gotinên mezinan ji alîyê hemû taxên civakê ve hatîne pesend kirin. Herwisa gotinên mezinan weku rexneyekê cihê xwe di nava gel da kirîye.

Gotinên mezinan beşekê girîng û bibiha a edebê folklorê miletan e. Bi encamê serpehatîyên di nava gel da karîger bûye. Herwisa ji devên kesên mezin hatîne gotin. Dîsan ketine ser zarê zimanên mezin û piçûkan û heta radeyekê ev gotin bûne destûrê jîyana civakî, aborî û siyasî a miletan (Şareza, Kerîm, 1976: 8).

Ansîklopedîya Birîtanî: Di Ansîklopedîya Birîtanî da bi vî rengî gotinên mezinan hatîne pênasekirin; Gotineka rehwan û muqîme, bi rengê giştî tê bikaranîn. Ji wan derbirînane ku di nava xelkê da berbilave. Herwisa parçeke ji her zîmanekê ku pê tê axaftin (Ansîklopedîya Parêzgeha Duhokê, 2017: 199).

Gotinên mezinan hinek peyvên kurt yan dirêjin ku jibo sedemê hatîye gotin û nivîsandin. Herwisa nivîskarê gotinên mezinan, rênîşandere jibo armancekê civakê (Şarezorî, Elî, 1981: 7). Gotinên mezinan ji alîyê hemû taxên civakî ve yê hatîne gotinê. Her gotinek mezinan peyameka xwe a heyî ku mirov ji karekê bi dûr bike yan mirov paldide jibo encamdana karekê. Ev hemû jî vedigere bo xemxurîya bav û kalên me bo haydarkirina civakî ji wan karên li gor wan neguncayî.

Firîdrîş Zayler: Gotinên mezinan çend derbirînekên bi rêkûpêk in. Behra bêhtir şîret û amojgarî pêve dîyare. Rûxsarê wan ji axaftina rojane hunerîtire (Şareza, Kerîm, 1976: 8). Derheqê wê çendê ku rûxsarê gotinên mezinan bi şeweyekê sivik û rehwan hatîne gotinê. Lêbelê ji şewazê axaftina rojane cudaye û hunerîtire.

Ehmed Emîn: Bi vî rengî gotinên mezinan pênase dike; Beşekin ji edebîyata miletan. Bi kurtî û wate ya wê ya berz anko rehwanbêjîya wê ji axaftina rojane tê cudakirin (Şareza, Kerîm, 1976: 11). Lewre bi sedemê wateya gotinên mezinan a berz û bilind mirov dikare ji axaftinên rojane cuda bike.

Kerîm Şareza: Dibêje; Gotinên mezinan çend peyvekên kurtên zîmanê Kurdî ne. Ku ramanek bilind têdaye ku ji kevin da hatîne di nava zîmanê Kurdî da. Çawanîya jîyanê, rewşit, bîr û baweran nîşan dide (Şareza, Kerîm, 1976: 11). Mirov dikare bibêje behra bêhtir a gotinên mezinan bi jîyana me a rojane hatîne gotin. Ev jî dibe xaleka cuda digel beşên din ên folklorê.

Gotinên mezinan berhemên miletan yê kevnarin û herdem li dev gelên destpêkî û sade. Anko gelên nû pêgehiştî mîna felsefê ne û karîgerin bi rewşitî. Diçine di nava rastî û hemû rûdanên jîyanê da ku hemû karên baş, nebaş û encamên gel gehîştîne ji babetên gotinên mezinan (Îzedîn Mistefa, 2011: 52).

Ji van pênaseyan bo me dîyar dibe ku gotinên mezinan hinek ji wan peyvên kurtin û hinek ji wana dirêjin. Ji alîyê kesên zana û jîr ji bav û kalên me ve hatîne gotin. Bi şewazekê ron û rehwan, cuda ji axaftina rojane yê hatîne dariştin bi şewazekê hunerî. Kurtîya gotinên mezinan bûye sedemê zû jiberkirin û mayînde bûna wan a di nava xelkê da. Ji bavî bo kurî û ji kurî bo nevî û ji dayikê bo zarokî.

Nivîskarê gotinan, civak bixweye û ji alîyê civakî ve yê hatîne pesendkirin û wergirtin. Heta wî radeyî yê bûyîne yasa û destûr jibo xelkî û li gorî gotinan çûyine, jibo bi rêvebirina jîyana xwe a rojane.

Her gotinek mezinan ji encamê rûdankê yan jî bi serborekê yê hatîne ziman. Mirov dikare bibêje ku gotina mezina peywendîyek xurt bi dîrokê ve heye. Jiber ku eger mirov bixwaze li dîroka miletekê mêze bike, dibe mirov li gotinên mezinan yê wî milletî binêre. Wê demê dê dîroka wê serdemê eşkere bibe. Ji ber ku her gotinek dîroka demeke dîyarkirî dide destnîşankirin.

Mînak:

Eger em li vê gotinê binêrin “Xwa le sultan Mehmûd gewretir e” ev gotine bo serdemê sultan Mehmûdê Xeznewî vedigere (Şukrîye Resul, 2008: 73). Mirov dikare wê demê destnîşan bike yê ku ev gotin tê da hatîye gotinê. Ev çende jî dê bi rêka dîrokê be. Lêbelê destnîşankirina dîrokê jibo behra bêhtir ji gotinên mezinan nayê kirin. Herwisa ew gotina dibêje; “Jina şermîn bi şarekê, zelumê şermîn bi parekê” ji ber ku li wê demê pare¹ kêmtirîn cureyê diravî bu, di kirin û firotinê da li serdemê dewleta Osmanî da (Wehîba Mihemmed, 2006: 15). Mirov dikare wê demê ev gotine têda hatîye gotin bi rêka dîrokê dîyar bike.

Ka çewa rûxsar girînge jibo mana berhemên edebî wisa naverok jî girînge. Rûxsar û naverok wekî du alîyên pareyî ne bê yek nabin. Naveroka gotinên mezinan weku rûxsarê gotinên mezinan berz û bilind e. Lewre naverok li gor pêdivîya civakî bo gotinên mezinan hatîye vehandin. Herwisa naverok di gotinên mezinan da naverokeka aborî, sîyasî, ayînî, mirovayetî, dadperwerî, karkirin hwd. bu. Ev hemû jibo perwerdekirina civakîye jibo encamdana karên baş û hişyarkirin ji şaşî û xeletîyan. Di gotinên mezinan da dibe rûxsar bête guhertin. Lê lêbelê çî caran naverok nayê guhertin. Jiber ku naveroka gotinan li gor pêdivîya civakî hatîye danan.

¹ Pare: Nave cureyek ji cureyên dirovî bû li serdemê dewleta Osmanî.

2. Têgeh û Pênaseyên Folklorê

Di çendîn zimanên cîhanî da peyva folklor jîbo jî bermayîyên bav û bapîran bikar tê. Di zimanê 'Erebî da zêdebarî peyva folklor, peyva "al-Turas al-Şe'bî" jîbo folklorê tê bikaranîn (Şukrîye Resul, 1983: 16). Peydabûna peyva folklorê bo demekê dûr û dirêj nazivire. Heta folklor bûye zanistekê serbixwe, di gelek qonaxan da derbas bûye. Têgehê folklor jî zimanê Îngilîzî hatîye wergirtin. Peyva folklor jî dû beşan pêk tê; Folk + lor, peyva "folk" bi ramana xelk, gel û herwisa ramana peyva "lor" jî bi zansit, zanîn, gotin tê watekirin. Anko ramana peyva folklor "zanîna gel, zanistê xelkî, gotinên gel" tê (Îbrahîm Ehmed, 2001: 10). Zaravê folklor her nehatibû bikaranîn heta zanayê Îngilîz "William John Thoms" li 22 adar 1846' anda bi nameyekê daxwaz jî rojnama "The Atheneum" kir ku peyva folklor bikarbîne jîbo keleporê navnetewî (Komelêk, 2009: 6). Jîbo cara yekê li zanîngeha Helsinkî hate pesendkirin ku folklor zanistekê serbixweye (Kumelêk, 2009: 13). Piştî vê demê folklor bo zanistekê serbixwe û wek têgeheka akademîk hatîye bikaranîn.

Nivîskarên Kurd Orduwanê Celîl û Celîlê Celîl jî li ser folklorê Kurdî dibêjin; zordestan gelek jî samanê Kurdan birîye. Lêbelê cihê xweşhalîyê ye folklor neketîye ber van êrişan û bo miletê Kurd yê mayî. Jîber ku çî kesek nikare gîyanê zîndî yê miletê jî rih û rîşalên wî gelî bîne der (Qenatê Kurdo, 1976: 5). Çî caran û çî kes jî nikare hestên mirov bidize. Kanîya folklorê hestên civakîne, eger ev hestan bêne dizîn jî dê her sîmayê wî neteweyî pêve dîyar be.

Her çende bi sedemê neçapkirinê hinek jî folklorê Kurdî jî nav çûye. Lêbelê zêdetir jî folklorê Kurdî di nava naxê Kurdan da a saxe û çî caran namire.

Derbareyê pênaseyên folklorê çendîn pênase hene, em dê hevl bidin bi şêweyekê kurt hinek jî wan pênaseyan dîyarkin.

Bûgin: Bi vî rengî pênase dike; divê bi rengekê wisa karîger be ku li hizra mirov neçe. Anko şîyan hebin di nava xelkî da bijît (Mukrî, Kameran, 1984: 6). Ji vê pênaseyê jîbo me dîyar dibe her berhemekê bikare di nava xelkî da bijît wê demê ew berhem dê bibe folklor. Lêbelê eger berhemek çend bihêz be, lê şîyanên hindê nebin jî alîyê civakî ve bête parastin, wê demê nabêjine wî berhem û folklor.

Gurgî: Bi vî rengî pênaseya folklorê dike; binyatê edebî folklor e. Folklor pêkhênê êkane ye jibo hemû hozanvan û rewşenbîran. Eger me dema borî bi başî zanî dê armancên me ên niha gelek baş bin, dê wê demê girîngîya folklorê bê zanîn (Îzedîn Mistefa, 2011: 7). Ji vê pênasê dîyar dibe ku folklor jêder û serûkanîya edebîye. Hemû beşên edebî koka xwe ji folklorê wergirtîye. Herwisa dibêje; eger me dema borî bi başî zanî û em hîn bunê. Wî çaxî dê armanc û hêvîyên me gelek baş bin. Dê li demên bînan de jî wê mifayî bigehîne me.

Hobitman: Li ser folklorê dibêje; Edebî folklorê bermayîya karê gelek serdeman e. Ev edebekê ji pêdivîyên jîyanê bû, ji aliyê civakî ve weke xweşî û nexweşî (Mukrî, Kameran 1984: 30).

Ebdulhemîd Yunis: Di ferhenga xwe da folklor bi vî rengî pênasikirîye; Folklor zaravekê cîhanîye, kesê destpêkê ev peyve bikaranî William John Thoms Îngilîz bu di 1846' anda (Edmon Lasso, 2016: 10). Jibo me dîyar dibe ku folklor bi hemû beşên xwe ve dîrokeka dûr û dirêj heye, heta gehîştîye vê qonaxa niha têda dijî. Ji dayikbûna berhemên folklorê sedemê xwe hebûn, her berhemek folklorê pêdivîyek wî civakî ya pirkirî, çi xweşî, nexweşî, bînfîrehî, şadî, dawet hwd. Anko ew demê berhemê folklorê hatîye afirandin pêdivîyek fer bû, di wî civakî da. Jiber ku hemû deman mirov lê digere daku jîyana xwe bi xweşî biborîne.

3. Cureyên Folklorê

Destnîşankirina cureyên folklorê karekê sivik û asan nîne. Jiber ku peyvek piçûke, ramaneka gelek mezin di nav xwe da helgirtîye. Her folkorekê hebe ji gelek beşan pêk tê. Renge cureyên folklorê ji gelekê bo yeke dî, yan jî ji dîyalêktekê jibo yeke dî yan ji şêwezarekê bo yeke dî cîyawazî hebe. Merc nîne hemû cureyên folkloran di nav gelên cîhanê da weku yek bin.

Folklor wekî gelek nivîskaran amajepêkirîye xudîka (neynika) civakî ye. Ev xudîke jî ne merce di nav hemû gelan da bi yek rengî û awazê be. Dibe rewîstek civakî yan dawet “dehwet – şayî - şahî - helperkê” ji folklorê gelekê li gel yê dî

cuda bit yan jî di nav folklorê miletekê da hebe û di nav yê gelekê dî hebûna wî nebit. Hemû gelan li gorî pêdivîya milletê xwe folklorê xwe dariştîye. Lewma nebuna hinek beşên folklorê di nav gelên cîhanê da çi kêmasîyan bo wî gelî naynin.

Mînak:

Eger em sehbikin dawetan dê bînî hinek cureyên dawetan yên li deverekê heyin û li deverên din nînin. Bêguman eve dê bite egerê hindê ku cudahî bikeve cureyên şahîyan di navbera her du deveran da.

Mînak:

Gelek cureyên şahî “dawet – şayî” yên li deverên kurmanca heyin bo mînak “kulîyanî, Sêpêk hwd”. Lêbelê dawet û şahîyên di nava kirmancên naverast da heyn cudane .

Ya pêwîste were zanîn ku peyva “kelepor – edebê millî” jibo peyva folklor li gorî hizra hinek zana û nivîskaran tê bikarînan. Eger em sehbikin boçunên hinek nivîskaran li dur vî babetî dê bînî bîrûboçun wek hev nînin. Li dur vê çendê di pirtûka “Karîgerî Keleporî Kurdî Le Şanoy Kurdî Da” nivîskar “Îbrahîm Ehmed Simo” keleporê Kurdî bo çar beşan dabeş dike, wek li xwarê eşkere dibe:

1. Keleporî Komelayetî
2. Keleporî Pêkhêner
3. Keleporî Materî
4. Keleporî Edebî (Îbrahîm Ehmed, 2001, 15).

Beşek ji kelturê millî ya zargotîne ku folklore. Folkor jî ji gotinên mezinan û qisey nesteq, metel, galtewgep, yarîkirin, hunrawe, awaz û guranî û şîn û lawandinewe, çîrok, dastan, efsane û hwd. Bixweve digire. Beşek dî jî dibêjinê “etnografya” ku kerestên madî bixwe ve digire. Wek şahî, jinxwastin, veguhêstina bûkê, mirî şuştin, çêkirina xwarnên millî û karên destî wekî şalûşepik û dirustkirina kilaş û kalik hwd. Bixweve girê dide (Sedredîn Nuredîn, 2005: 9-10).

Eger em sehbikin pirtûka “Sernicêk Le Derwazey Folklorê Kurdeweyê” dê bînin bi vî rengî dabeşkarî bo folklorê Kurdî hatîye kirin:

- A. Folklorê Wêje
- B. Folklorê Nîgar
- C. Folklorê Yarîyekan
- D. Folklorê Saz û Awaz
- E. Folklorê Leberkirdin û Razandinewe
- F. Folklorê Xurak
- G. Folklorê Amêrî Dirustker û Berhem Derhêner
- H. Folklorê Nerîtî Komelayetî
- I. Folklorê Kase û Kewêl
- J. Folklorê Nextîney Mal
- K. Folklorê Tîmarkirdin
- L. Folklorê Bawerî Kon
- M. Folklorê Xanesazî
- N. Folklorê Raw û Çek
- O. Folklorê Pîşekan
- P. Folklorê Kelupelî Ajalan
- Q. Folklorê Estêrewanî û Keş (Kumelêk, 2009: 19). Bi vî rengî dabeşkarî jibo folklorê hatîye kirin .

Hinek nivîskarên din çî cîyawazîyê di navbera herdu zaravên “kelepor û folklorî” da nakin. Lê di rastî da gelek cîyawazî hene, zaravê kelepor ji yê folklorê berfirehtir û giştîre. Kelepor kerestên berdest bi xwe ve digire. Her li ser vê çendê jî “Rîtşard Baytil” di ferhenga xwe de li ser folklorê, hunerên millî , dixe di nav

kerestên berdest da (al-Cizrawî, Mihemed, 2006: 47). Herwisan folklor babetên edebî û wêjeyî bi xwe ve digire ku cudaye ji babetên keleşorê .

Keleşor ji gelek beşan pêktê, em jî dê li gorî şîyanên xwe çend beşên keleşorê eşkere bikin. Beşên keleşorê:

1. Dawet (Şahî)

a- Şêxanî

b- Gulîyanî

c- Mîranî

d- Sêpêk

e- Milanê

f- Tilanê (Nureddîn Seî'd, 1986: 6).

2. Cilûbergên Kurdî

3. Xarin û Vexwarnên Kurdî

4. Rewşit û Tîtalên Jinhanîne û Bûk Veguhastîne

5. Nexiş û Nîgar

6. Yarî

7. Amûrên Karî

8. Amûrên Muzîkî

Li ser dabeşkirina folklorê gelek bîrûboçun hene. Em dê li gorî şîyanên xwe hinek ji wan bîrûboçunan li ser dabeşkarina folklorê eşkere dikin.

Bo nimune eger em berê xwe bidine dabeşkirina folklorê di pirtûka nivîskar Kerîm Şareza da tê dîtî bi vî rengî dabeşkirîye:

1. Efsane

2. Çîrok ya Sergûzeşte
3. Dastan
4. Goranî
5. Pêndî Pêşînan û Qisey Nesteq
6. Galte û Gep
7. Metel
8. Yarî (Şareza, Kerîm, 1976, 13).

Di pirtûka “Edebî Folklorê Kurdî” ya nivîskar “Kamuran Mukrî” da dabeşkarîya folklorê bi vî rengî hatîye kirin :

- 1- **Efsane**
- 2- **Dastan**
 - a- Qaremanêtî
 - b- Dildarî
- 3- **Serguzeşte (Çîrok)**
 - a- Çîrokî Pirupûç
 - b- Çîrokî Asayî
 - c- Çîrokî Komelayetî
 - ç- Çîrokî Dildarî hwd.
- 4- **Goranî**
- 5- **Pêndî Pêşînan û Qisey Nesteq**
- 6- **Galte û Gep**
- 7- **Metel**

Cudahîya dabeşkirina folklorê di navbera herdû pirtûkan da bi tenê yek babet di pirtûka nivîskar Kerîm Şareza da hatîye zêdekirin, ew jî “yarî” ye .

Em jî dê ligorî hizra xwe bi vî rengî folklorê dabeş bikin:

- a. Efsane
- b. Dastan
 - 1- Dastana Qehremanî
 - 2- Dastana Evînî
- c. Çîrok (Serhatî)
- d. Stranên Folklorî
- e. Gotinên Mezinan û Îdyom
- f. Mamik (Metel)
- g. Heyranok

Li jêr em ê cureyên folklorê tekûtek şîrove bikin, bi rengeke herî kurt.

Efsane: Gelek zana û rojhilatnasên wekî Mar, Nîkîtîn, Mînorskî, Simînov, Vîlçevkî, Lasko û herwisan nivîskarê Kurd 'Erebê Şemo û Ebu Vîyanî jî efsane kirîye keristeyek jibo saxkirina hinek bîrûbawerên ayînên kevin û nû yên Kurdan. (Îzedîn Mistefa, 1970:11). Eger ji layê felsefê ve, sehbikin efsaneyê em dikarin bi rengekê hişyarkirina civakî danîn. Herwisan bi bizavên mirovên seretayî tê zanîn. Bo têgehiştina cîhanê û nasandina wê (Îzedîn Mistefa, 1970: 12). Bav û bapîrên me bi rêya efsanê felsefa xwe dariştîye.

Dastan: Di berhemên dastana da, her rudanek barê jîyana mirov bi tenê nîne, belkî hêvîyên mirov jî tîne berçav (Îzedîn Mistefa, 1970:24).

Çîrok: Hemû gundî bi şevan da li mala mezinekê gundî yan axa yan muxtarî komdibin. Hemû gundan kesek yan pirtir hebî di gotinê çîrokbêj. Ku vî kesî çîrok di gotin bo xelkê xwe. Dema dibe şev hemû li malekê kom dibin, çîrokbêj da xwe girt heta hemû mêhvanî hatiban. Paşî da dest bi gotina çîrok kit. Gotina çîrokan di

şevbêryan da gelek ya berbelav bu. Li destipêkê çîrokbêjî digot hebû nebû çi ji Xwedê mezintir nebu û dest bi çîroka xwe dikir. Heta bi dumahî hatiba da bibêje çîroka me çu deştê dayik û bavên me çun biheştê û da çîrokê bi dumahî tîne.

Stranên Folklorê: Stranên folklorê yan goranî, li dîwanên axa yan began yan jî di dîwanên kesên mezin da stranên folklorê dihatine gotin. Di dîwanê da eger ji stranbêjekê folklorê pirtir heba herdûyan pêkve stran digot, yan da yek bidumahî tîne û yê din da li ser temam ke yan jî bi stranê herdûyan bişêweyekê duqolî berisiva yek bi stran didan.

Stranên folklorê jî dibine çend curek:

- 1- Stranên Tazîya
- 2- Stranên Destar Hêrkê
- 3- Stranên Dar Tevnê
- 4- Stranên Şera
- 5- Stranên Kuçek û Dîwanan
- 6- Stranên Geha Dirunê – Paletîyê
- 7- Stranên Serê Zavanu (Nureddîn Se'îd, 1988: 7).
- 8- Stranên Dawetan (Şahîya)
- 9- Stranên Şevbêrîyan
- 10- Stranên Zarokan

Li jêr me hinek cureyên stranan şirovekirin. Jiber ku da babet gelek dirêj nebe, bi kurtasî me hinek şirove kirin.

1. Stranên Dartevinê: Demê bihara kur û kiç pêkve diçin seyrana, diçine dartevinê da û pêkve stranan dibêjin. Dartevinê pêktê ji werîsekê li her layekê, darekê pan û dirêj dikin di navbera herdu werîsan da. Kur li layekê û kiç li layê din pêkve hêskê dikin. Di ber hêskê ra van stranan dibêjin. Lewma jêra dibêjin dartevinê (Nureddîn Se'îd, 1988: 7).

2. Stranên Lorîn: Ew stranin yên ku dayik diber hejandina landika zarokê xwe ra dibêje. Ev strane jibo nivandina zarokî têne gotin, yan jî renga dayik xem û xeyalên xwe yan xewin û xwezîyên xwe bi wê stranê der bibire.

Mînak :

Hey layê layê

Ezê landika xwe lalînim

Sibehîya rakim

3. Stranên Leyzandinê: Ev curê stranê dayik yan bav yan xwişk bo zarokê xwe dibêje. Ev strane bervajî ya lorînê ye. Strana lorînê bo nivistina zarokî têne gotinê. Lêbelê strana leyzandinê bo kenîna zarokî têne gotinê. Herwisan stranên leyzandinê kurtirîn ji yên lorînê .

4. Stran û Yariyên Piçûkan: Ev cureyê stranê ji hemû cureyên di cudaye ji layê gotinê ve jiber ku ev cureyê stranê zarok bixwe dibêje. Ku beruvajî cureyên dine ku dayik yan bav yan xwişk bo zarokê xwe dibêje. Ev stranên henê zarok bixwe dibêje li gel hevalan ji derveyî malê. Hinek caran yaryekê strana xwe ya taybet heye ku berî ew yariye destpê bike dê wê stranê bibêje. Dîsan hinek stranên din yên hene ku dumahîya stranê bigehe kê ew dê ji yaryê derkeve .

Gotinên Mezinan: Bikaranîna gotinan di axaftina rojane da çî zarok yan genc yan pîr bi regekê gelek berfire têne bikaranînê. Herwisan gelek caran mirov divê karekê bibêje beramberî xwe mirov dê bi rêka gotinek mezinan bibêje, da pirtir mebesta mirov bo eşkere bibe.

Îdyom: Îdyom jî di bikaranîna xwe da ji gotinê kêmtir nîne. Di îdyoman da merema axaftinker bara pirtir caran wateya duyemîne. Lêbelê dibe wata yekem jî mebest be.

Mînak:

Ewî marî bi destê min nekuje (Nizar Mihemed Seî'd, 2011:11). Yanî tu bi xwe dibêjî min têkelî wî karî neke .

Mamik: Hinek dibêjinê tiştanok, metel yan jî metelok. Li nav Kurdên Sovîyet dibêjine mamikê “tê derxistuk” (Zero, Ehmed Abdullah, 1985: 11). Li gundan di demê şevbêrîyan da, kesek da bibêje min mamikê heye, kê bersiva wî dizane. Da mamika xwe bibêje eger yekê zanîba da jê ra bibêje. Lê eger kesê nezanîba da xudanê mamikê bibêje hunê çi bidine min eger min berisiva wê jibo we got (Xalid Husên, 1985: 87). Destpêka mamikê dê xudanê mamikê bibêje mamikê mino ... mino yan mamê mino mamô yan tiştê mino tiştu yan tiştêkê min ji tiştane... û da dest bi mamika xwe bike (Zero, Ehmed Abdullah, 1985:10).

Mînak:

Mamkê mino ... Mino

Pîreka di rê da

Hizar kelem di rê da çîye?

Piştî hizrkirinek kur û dijwar da yek bibêje “kerenge yan kengire” (Zero, Ehmed Abdullah, 1985:17). Xudanê mamikê dê yekser yeka din bêje.

Heyranok: Heyranok û stran nêzîkî yekin jiber ku heyranok bixwe jî mirov dişê bibêje strane. Lêbelê ev strane kurtin û di navbera keç û kuran daye. Yanî bersîva yekê dide. Heyranok ji peyva heyranê hatîye. Peyva heyranok pêkhatîye ji peyva heyran + ok wekî paşgirekê li gel hatîye. Wek paşgire piçûk kirinê ye di zimanê Kurdî da. Helbet ev paşgire yê çuyî li gel peyva heyran bo xweşkirina peyvê û piçûkkirina peyvê. Evîndaran bi van beyitên kurt êş û azarên xwe derbirîne. Heyranok hene keçkan bo kuran gotîn û heyranok hene kuran bo keçan gotîne.

Mînak :

Kurko dîno ma tu dînî

Serbana têy xwe ve dihejînî

Ev çehiv bipeqin eger

Sê dana pê te nebînî (Nuredîn Saîd, 1988: 54).

Mînak :

Kiçkê dînê

Çi êvare, êvara xêra

Mela çûne mizgefta

Qeşe çûne kevnedêra

Were ramûsanekê bide min

Ji bavê te ra minete, ji dîya te ra xêre (Xeyat, Ebdul Ezîz, 2002: 13).

4. Dîroka Komkirina Gotinên Mezinan

Parastina gotinên mezinan di demên borî da bi şeweyê jiberkirinê ji nifşekê jibo nifşekê din bûn. Ku ev çende jî zêdetir jibo gundan dizivire ji ber ku zêdetir yê gotinên mezinan di mêşkê xwe da parastîne xelkên gundan bûn. Xelkê gundan piranîya wan nexwêndewar bûn. Miletê Kurd bi sedemê kawdanên wan yê siyasî, aborî û rewşenbîrî gelek ji folklorê xwe ji dest daye. Teqez kesekê navsalveçuyî bimire, ew komeka gotinên mezinan çîrok, çîvanok, serpêhatî û hwd. yê milletê Kurd li gel xwe dibe, ji ber ku zêdetir ji folklorê Kurdî nehatîye nivîsîn heta niha jî. Herwisa gelek ji folklorê pêdivî bi mûzexane (kevnarxane) û cihên taybet hene heta ku ew folklor ji navçunê bête parastin.

Di destpêka dîroka komkirina gotinên mezinan jî da wekî gelek karên din ji derveyî bajarên Kurdan destpêkirîye. Dûv ra rewşenbîrên Kurd jî dest bi komkirina gotinên mezinan kirine. Lêbelê bo demekê dirêj navegere. Jiber ku li vê dawîyê rewşenbîrên Kurd dest bi komkirina folklorê bi giştî û gotinên mezinan bi şeweyekê taybet kirine.

Kevintirîn destnivîsa gotinên mezinan li sala 1711' anda hatîye nivîsîn bi nav û nîşanê “Mêşrob Maşoste” li Ermenistanê. Lêbelê nivîskarê vê destnivîsê neaşkereye. Ev nivîs ji 15 gotinan pêk tê ku bi zimanê Kurdî û bi pîtên Ermenî ve hatîye nivîsîn. Ewe jî yek ji wan gotinane:

Mînak:

Deçim aş xerab debê

Deçim kanî zûha debê

Bê dewletî weha debê (Şukrîye Resul, 2008:10).

Duyemîn kevintirîn nivîsîn ya mela Mehmûdê Bazîdî ye ku li navbera sedsala 19' anda nivîsandîye. Ev nivîse li Lênîngiradê li Rusya hatîye parastin (Şukrîye Resul, 2008, 10)

Li 1878' anda li Yegîzarev pirtûkek bi navê serpêhatîya entografîya Kurdan derbareyê Kurdên bajara Yerîvanê hatîye nivîsandin. Li bergê dûyê li 1891' anda çapkirîye. Di vê pirtûkê da bi dehan gotin û qisên nesteqên Kurdî nivîsîne (Şukrîye Resul û Celal Teqî, 1984: 20).

Pirtûkek dî ya taybete bi folklorê Kurdî û Ermenî ya nivîskar “Serkîs Ayîkonî” ku têda bi sedan gotinên mezinan û biwêjên Kurdî û efsaneyên Kurdî bixwe ve digire. Ew tiştê karê “Ayîkonî” jî karên berî wî cuda dike. Ewe ka nivîskarî çawa bihîstîne wisa nivîsandîne ku di bergê 6' anda nêzîkî 200 gotin û biwêj têdane (Nuredîn Sedredîn, 2005: 14).

Li 1901' anda “Fon Likuk” çuye navçeya “Zencîrlî” a bajara Qonya ya li Tirkîyê. Di serlêdana xwe da hijmarek gotin û çîrokên Kurdî li gel “Nubihara” a Ehmedê Xanî û mewlûd nameya pêxemberî (s.x.l) li gel xwe birîne Şamê. Bi rêka hinek Kurdan şirovekirine û paşê çuye Elmanya yê. Ev pirtûke bi sê bergan li gel şirovekirina wan a bi Elmanî belavkirine (Şukrîye Resul û Celal Teqî, 1984, 21).

Zanayê Elmanî “Hugo Markis” du berhemên pirbiha bi zimanê Elmanî nivîsîne. Di berhemê xwe yê duyan da çîrok, destan û gotinên mezinan li bajarê

Mêrdînê bi kirmancî nivîsîye û sala 1926' anda li “Leningradê” çapkirîye. (Şukrîye Resul û Celal Teqî, 1984: 21)

Li 1933' anda “Îsmail Heqî Şaweyis” pirtûkek bi 603 gotin belavkir. Gotinên vê pirtûkê li ser babetên sîyasî, edebî, civakî, aborî, henek û pêkenînan bun (Îzedîn Mistefa, 2011, 51).

Li 1937' anda “Roje Lîsko” babetek belavkir li ser gotinên mezinan li Parîsê. Ev gotin jî, ji zarê devê xelkê û pirtûkên Kamîran Bedirxanî wergirtibu. Roje Lîsku pêhtir ji 280 gotinan komkirîye û li gor babetên namus, evînî, dîrok, hest û Suzan hwd. Rêzkerî bu. Her di vê salê da nivîskarê Frensî “Lusî Pul Margirî û Kamîran Bedirxan” pirtûkek gotinên mezinan belavkirin (Sindî, Bedirxan, 1989: 10).

Dîsan di 1938' anda pirtûka “Hezar Bêj û Bend” ji layê mamoste Meruf Çîyawog ve hate çapkirin (Qenatê Kurdo, 1976: 13).

Herwisan “Pîremêrdî” jî pirtûkek bi navê “Pendekanî Pîremêrd” nivîsîye. Di pirtûka xwe da Pîremêrdî gotinên mezinan bi hozankî nivîsandîne.

Li 1952' anda mamoste “Elaedîn Secadî” pirtûka xwe bi navê “Mêjûy Edebî Kurdî” li Bexda çapkir. Di vê pirtûkê da mamoste çendîn rûpel jibo gotinên mezinan terxankiribun. Her di pirtûka xwe da mamoste behsê rûxsar û naveroka gotinên mezinan kirîye (Şukrîye Resul û Celal Teqî, 1984: 31).

Pîyoter Lêrx nêzîkî 50 gotinên mezinan û jimareyek çîrok û destan bi wergêra Rusî dibergê duyemîn yê pirtûka xwe da belavkirine (Qenatê Kurdo, 1976: 6-7).

Mamoste “Şêx Mihemed Xal” li 1957' anda pirtûka “Gotinî Mezinan” bi rêzbandîya pîtan çapkir. Nivîskar bizavkirîye ku hinek jî wan gotinan di binkoka pirtûkê da şîrove bike (Sindî, Bedirxan, 1989: 11).

Li 1957' anda “Hacîyê Cindî” pirtûkek li jêr navê “Folklorî Kirmanca” çapkir. Ku tê da çendîn rûpel terxankiribun jibo gotinên mezinan (Şukrîye Resul û Celal Teqî, 1984: 40).

Hozanvanê Kurd Cegerxwîn li 1957' anda komek gotinên mezinan li Dîmeşqê çapkirin (Îzedîn Mistefa, 2011: 51).

Dîsan efserê xaneşîn “Cemîl Kenne” hinek gotinên mezinan komkirin û wergêrane ser zimanê “Erebî û li 1958' anda belavkirin (Şukrîye Resul û Celal Teqî, 1984: 31).

Di pirtûka “Gotin û Qisey Nesteqî Gelanî Rojhelat” da Qenatê Kurdo li gel M. Rudenko li 1961' anda belavkirine (Şukrîye Resul, 2009: 81)

Li 1961' anda mamoste “Mihemed Tewfîq Werdî” beşê duyemîn ji namîlka folklorê Kurdî belavkir. Di vê namîlkeyê da hinek gotinên kirmancîya serî ligel ramana wana bi kirmancîya xwarê belavkirîye (Şukrîye Resul û Celal Teqî, 1984: 43).

Li 1965' anda zanayê Sovyetî yê bi regez Kurd Ç. X. Bekayêv hinek gotin ji Kurdên Azerbaycanê yên yekitîya Sovîyet wergirtîne û çapkirine (Şukrîye Resul û Celal Teqî, 1984: 43).

Li 1967' anda mamoste “Sacîd Aware” di pirtûka xwe da bi navê “Lêkulînewey Edebî Niwê Kurd” beşek bo gotinên mezinan terxankirîye (Şukrîye Resul û Celal Teqî, 1984: 44).

Herwisan “Mehfuz Mele Silêman” pirtûkek ku pêk tê ji 4000 gotinên Kurdî di 1970' anda çapkirîye (Ansîklopedîya Parêzgeha Duhokê, 2017: 201).

Di 1969 û 1970' anda Ordîxanê Celîl dû pirtûkên piçûk li ser gotinên mezinan û qisey nesteq belavkirin (Qenatê Kurdo, 1976: 10). Herwisan Orduxanê Celîl û Celîlê Celîl pirtûka “Gotinî Mezinan û Qisey Nesteqî Kurdî” bi zimanê Kurdî – Rusî nivîsîne. Di vê pirtûkê da bi şêweyekê pêdivî û kurt û zanistî li ser biha û mêjûya vekolîna gotinan nivîsîye (Qenatê Kurdo, 1976: 11).

Herwisan li 1972' anda “Qazî Qadrî Fettahî” gotinên bi Kurdî û Farsî belavkirine (Ansîklopedîya Parêzgeha Duhokê, 2017: 201).

Herwisan pirtûkek dî ya hey ya “Mela Mehmudê Dêrşewî” ye ku ji 871 gotinan pêk tê û li sala 1980' anda çapbuye.

Herwisan nivîskar “Hecî Cefer” pirtûkek ku ji 2250 gotinan pêk tê, bi navê “Gotinên Mezinan Li Devera Behdînan” li 1986' anda li Bexda çap buye.

Herwisan li 1997' anda pirtûkek gotinên mezinan ya nivîskar “Mesûd Xalid Gulî” bi 1071 gotinan li Duhokê hatîye çapkirin (Wehîba Mihemed, 2006: 17).

Dîsan di gelek rojname û kovaran da giringî bi gotinên mezinan hatîye dayînê li jêr navê “Wateyên Mezinan, Qisey Nesteqî Kurdî, Watey Becê û Pendî Pêşînan”. Ji wan kovaran jî “Rojî Kurdistan , Kurdistan , Rojî Niwê , Ronahî , Silêmanî , Gizing , Şefeq , Rizgarî , Beyan , Pêşkewtin , Azadî , Xebat , Dengî Kurd , Birayetî , Hawkarî , Rîya Taze , Kurdistan û Hawar” (Şukrîye Resul û Celal Teqî, 1984: 34).

Herwisan Rojhilatnasan karekê qedirbilind kirîye jibo parastina folklorê Kurdî û bi rengekê taybetî gotinên mezinan. Gelek ji Rojhilatnasan ev berheme li dev xwe tomarkirine û wergêrandine liser zimanên bîyanî bi vî rengî xizmetek bêhemta jibo zimanê Kurdî kirine. Dîsan berhemên Kurdan jibo xelkên bîyanî dane naskirin. Dê hewlbidîn ku berhemên hinek ji wana bidin eşkere kirin.

Pyotir Lêrx nêzîkî 50 gotinên mezinan û jimareyek çîrok û destanên bi wergêrana Rusî di bergê duyemîn yê pirtûka xwe da belavkirine (Qenatê Kurdo, 1976: 6-7).

Rojhilatnas “Î. Nuêl” efserekê Îngilîz bo li Kurdistanê gotarek binavê “Taybetmendiyên Kurdan Di Gotinên Pêşîyan û Qisey Nesteq Da” belavkirîye (Qenatê Kurdo, 1976: 14).

A. Jaba li Erzîromê konsolosê imparatoryeta Rus bu. Kerestekê zor yê folklorê û ziman û entografya zimanê Kurdî komkirîye (Qenatê Kurdo, 1976:7).

Herwisan S. A. Yegîzarov li jêr navê “Mêjûya Entografya Kurda” li parêzgeha Yerîvanê pirtûkek nayab belavkirîye. Li ser jîyana civakî, rewşit, şîn û şahî hwd. ya gelê Kurd axaftîye ligel hinek têkstên folklorê Kurdî.

5. Cureyên Gotinên Mezinan

Gotinên mezinan bi gelek reng û cureyan hatine gotin. Em dê li gorî şîyanên xwe hinek ji wan cureyan eşkere bikin ên gotin pê hatine gotin. Helbet eşkere kirina hemû cureyên gotinên mezinan karek zûr û zehmet dibe û babet jî dê gelek dirêj be. Emê bi kurtasî hinek cureyên gotinên mezinan eşkere bikin. Ka ev gotin bi çî reng û şêwazî hatine gotin:

1. Gotinên Mezinan Yên Bi Rengê Hevokeka Kurt: Di vî cureyî da gotinên mezinan bi tenê hevokeka kurte. Ev hevok jî ramana xwe dide.

Mînak:

Derdê şivên tim peze (Öncü, Mehmet, 2009: 145).

2. Gotinên Bi Rengê Hevokeka Dirêj: Di vî cureyî da gotin li ser rengê hevokê dirêj hatîye gotin .

Mînak:

Her kur di çavên dîya xwe da egîdeke (Celalî, Mela Êsiv, 2014: 105).

3. Gotinên Bi Rengê Helbestê: Di vî cureyê gotinê da gotinên mezinan wekî cure kêşekê tê da tê dîtîn. Gotinên bi hozankî di nav gotinên mezinan da pirin .

Mînak:

Tifenga dûr hukim nede destê nezani, dê bît qetlê serê xudanî (Hecî Cefer, 1986: 32).

Eger bibî be pula, dinya bidey be kula, debê birzî le naw xola (Akreyî, Xalid, 2010: 25)

4. Gotinên Bi Navê Tiştan Hatine Gotin: Ev gotin wisa hatîne gotinê ku li ser navê hinek tiştan hatîne gotin. Wekî li ser navê gîyanewera (ajal), fêkî hwd .

Mînak:

Beq dibêje, heke newîrim dê dirim (Hecî Cefer, 1986: 21).

5. Gotinên Bi Rengê Du Hevokên Watedar: Di vî cureyî da gotin bi rengê du hevokên watedar ên ji hev cuda hatîne gotin. Ku eger em wan hevokan ji hev veqetînin jî, her hevokê wateya xwe a serbixwe heye.

Mînak:

Avê berêt ber aša birin. Tu pisyara kengira dikey (Hecî Cefer, 1986: 11).

6. Gotinên Bi Rengê Şibihandinê: Di vî cureyê gotinê da tişteke bi tişteke din hatîye şibihandin.

Mînak:

Ava li dov berîyê wekî maça li bin perîyê (Hecî Cefer, 1986: 11).

7. Gotinên Bi Rengê Pirsîyar û Bersîvê: Di vî cureyê da gotin dibin du par. Ku pareka wê weke pisyarêye û para din jî weke bersîvê ye.

Mînak:

Cotyaro ew çîye tu diçînî? Got: Dema hişîn bî tê bibînî (Dêrşewî, Mela Mehmûd, 1980: 71).

8. Gotinên Bi Rengê Pênasekirinê: Di vî cureyê da li destipêkê navê karekê tê. Paşê jî dê wî karî şirove bike, dê pênasekê jêra bide eşkerekirin.

Mînak:

Ew mirovê şehrezaye, ewê makerê ji pêşve binyasît, heke li dur zivirî faîde nakit (Hecî Cefer, 1986: 15).

9. Gotinên Bi Rengê Kar û Encaman: Di vî cureyê da gotin bi rengê wisa hatine gotin ku beşek kareke û beşa din jî encamê wî karî ye .

Mînak:

Bibîne zehmetê, bixwe nemetê (Hecî Cefer, 1986: 20).

10. Gotinên Bi Rengê Vegêrana Rûdanekê: Gotinên bi vî rengî zorin. Di vî cureyê da gotin rudanekê bo mirov vediguhêze.

Mînak:

Beqal wê difiroşit tişta liba hey (Dêrşewî, Mela Mehmûd, 1980: 43).

Rojê ewre, bi şev sayî, sal xerab.

Jin cîwane, mêr kale, mal xerab (Celalî, Mel Êsiv, 2014: 179).

11. Gotinên Bi Rengê Danûstandinê: Di vî cureyê gotinê da, danûstandin di gotinê da tê dîtin .

Mînak:

Şêrî got rovî, te ev zanînahe ji kuve anîye? Got: Bi xwîna li teşka gorî da (Dêrşewî, Mela Mehmûd, 1980: 203).

Ceh dibêjît: Genimo, heta di bîte rimo, ez dê bi feqîrara gehimo. Genim dibêjît cehî: Ceho, cehano, heta ez dibime nano tu dê bî alîka ker û golkano. (Hecî Cefer, 1986: 34).

6. Jêderên Gotinên Mezinan

Hemû gotinên mezinan paşmaveyê hinek jêder û serhatîyanin. Yanî ji tunebunê nehatîne gotin. Her gotinekê jêdera xwe yê heye. Hinek gotin jêderên wan pirtûkên esmanî ne û yên hinek din jî gotinên zana û mirovên çakin (rûspî) û hinekên din jî serborên jîyanê bo wan bûye jêder û çavkanî. Mirov dişêt bibêje kû di demên pêşîn da fêrbûna zimanê ‘Erebî bo Kurdan zehmet bûye. Herwisa xwandin û nivîsîn jî kêmbû. Lewre hewldaye ber hindê ku gotinek bi kurtî û Kurdî li ser wê gotina ‘Erebî gotîye. Em dê hinek bizavan bikin ku li gorî şîyanên xwe hinek ji wan jêderan bidin eşkerekirin. Lêbêle ev yek nayê vê wateyê ku gotinên Kurdan di bin bandora çand û zimanên ‘Ereban danê, teqez Kurd xwedî welateke gelek kevnare û çandeka qedîmin û miletekî niştecihin. Jêderên gotinan:

6.1. Qur’ana Pîroz

Xweyê sebrê di bit melikê Misrê (Dêrşewî, Mela Mehmûd, 1980: 93).

- إِنَّ اللَّهَ مَعَ الصَّابِرِينَ (Beqere 153)

Xwedê yê li gel bênfirêha – sebrkêşa (Sigêrî, Îsmâîl, 2011, 23).

Wateya evê gotina Xwedê di gotinên mezinan da rengvedaye. Herwisan ev gotin jî bi bêhin firehîyê hatîye gotin. Bi bêhna fireh bêsîre dibe duşav (Dêrşewî, Mela Mehmûd, 1980: 50). Dîsan ev gotine jî li ser bêhênfirehîyê hatîye gotin.

Mînak:

Sebir tehle, belê berê wî şîrîne.

Piştî her serevrazîyekê nişêvîyeke.

- فَإِنَّ مَعَ الْعُسْرِ يُسْرًا (Şerih5)

Piştî her nexwêşîyekê xwêşîyeke (Sigêrî, Îsma'îl 2011, 596) .

Eger di vî derbarî da em sehbikin vê gotina mezinan dê bînin, wateya xwe ji vê gotina Xwedê wergirtîye. Yanî piştî her nexwêşîyekê xwêşî û aramîyek ya li dûv da .

Dinya ware, axiret male (Hecî Cefer, 1986: 54).

- ذَلِكَ مَتَاعُ الْحَيَاةِ الدُّنْيَا وَاللَّهُ عِنْدَهُ حُسْنُ الْمَآبِ ﴿Al-i Îmran 14﴾

Di sureta Al-i Îmran da ayeta 14 anda Xwedê dibêje hejêkirina dilxwazîyan ji jinan û kuran û maldarîya gelek û bi hev re ji zêr û zîvan, eve hemû xwêşîya dinyayê ye di çavên xelkî da hatîne şîrînkirin û dumahîka baş ewe ya li cem Xwedê (Sigêrî, Îsma'îl 2011, 51).

- وَمَا الْحَيَاةُ الدُّنْيَا إِلَّا مَتَاعُ الْغُرُورِ ﴿Al-i Îmran 185﴾

Xwedê di ayetek din da ya suret Al-i Îmran da dibêje teqez jîyana dinyayê ye ji xemil û xêr û pergalê xapandinê pêvetir tiştêk di nîne (Sigêrî, Îsma'îl 2011, 74).

- قُلْ مَتَاعُ الدُّنْيَا قَلِيلٌ وَالْآخِرَةُ خَيْرٌ لِمَنِ اتَّقَى وَلَا تُظَلَمُونَ فَتِيلًا ﴿Nîsa77﴾

Dîsan di sureta Nîsa da ayeta 77 anda Xwedê dibêje: Bêje xwêşîya dinyayê ya kême û axiret bo ye parêzgarîyê bike çêtire (Sigêrî, Îsma'îl 2011, 90).

Bi vê çendê em dişên bibêjin ku serokanîya vê gotinê ji ramana van ayetan hatîye wergirtin. Mebest jî ewe ku dinya namînit bo mirov ya bi mifa û sûd bi tenê axiret yanî dumahîka mirov. Ev ramane wekheve li gel ramana vê gotinê dinya ware axiret male.

Însan tovê mirinê ye (Hecî Cefer, 1986: 16).

- أَلَيْسَ تَكُونُوا يُدْرِكُكُمُ الْمَوْتُ وَلَوْ كُنْتُمْ فِي بُرُوجٍ مُّشِيدَةٍ ﴿Nîsa78﴾

Xwedê di sureta Nîsa ayeta 78 anda dibêje: Hun li kêderê bin, xwe hun di kelhên asê jî da bin , her mirin dêgehîte we (Sigêrî, Îsma'îl 2011, 90).

- كُلُّ نَفْسٍ ذَائِقَةُ الْمَوْتِ ﴿Al-i Îmran 185﴾

Hemû xwudan rih û gîyan dê tam kine mirinê (Sigêrî, Îsma'îl 2011, 74).

Ev herdû ayete wê çendê bo me eşkere dikin ku hemû mirov dê mirin wekî vê gotinê jibo me eşkerekirî.

Heta mirinê kirine (Dêrşewî, Mela Mehmûd, 1980: 79).

- وَأَعْبُدْ رَبَّكَ حَتَّىٰ يَأْتِيَكَ الْيَقِينُ (Hicr 99)

Xwedê di sureta Al-Hicr ayeta 99 anda dibêje: Heta dimirî Xwedê xwe bi perêse. (Sigêrî, Îsma'îl 2011, 267).

Ev gotina mezinan jî me paldide bal wê yekê ku heta mirinê divê mirov kar bike bo axireta xwe. Dîsan em dikarin bibêjin ku ev gotina mezinan du layenên naverokê bi xwe ve digire. Ramana wê ya din ewe ku mirov bo jîyana xwe jî kar bike û bo axireta xwe jî karbike.

Bila Xwedê yar bit, dinya hemû bila neyar bit (Dêrşewî, Mela Mehmûd, 1980: 48).

- إِنَّ مَعِيَ رَبِّي سَيَهْدِينِ (Şuara 62)

Xwedayê mezin di sureta al-Şuara li ayeta 62 anda demê Musa pêxember ligel gelê xwe ji Fîrewin revîn. Gelê Musa gotê, eve gehiştin me. Musa jî got nexêr Xwedê min yê li gel min dê rêkekê bo min vekit û nişa me bide (Sigêrî, Îsma'îl 2011, 370).

Jina bêheya wek girara bê xwê ye (Dêrşewî, Mela Mehmûd, 1980: 192).

- فَجَاءَتْهُ إِحْدَاهُمَا تَمْشِي عَلَىٰ اسْتِحْيَاءٍ (Kasas 25)

Xwedayê mezin di sureta al-Qeses da li ayeta 25 anda, demê gotubêja keça Şuayîb pêxemberî (s.x.l.) li gel Musa pêxemberî (s.x.l.) bo me vediguhêze, dibêje: Yek ji wan bi şerim ve hat (Sigêrî, Îsma'îl 2011, 388).

Yanî Xwedayê mezin di vê ayetê da behsa şermkirinê dike. Vî rewîştê baş pal dide bal keça Şuayîb pêxemberî (s.x.l.). Eger ev rewîşte, rewîşte baş neba Xwedê pal nedida bal keça pêxemberekê va. Evê gotinê jî jêdera xwe ji vê ayetê girtîye .

Qencî qencîyê, yê xerabî xerabîyê dibîne, lê zû yan dereng (Öncü, Mehmet, 2009:231).

- هَلْ جَزَاءُ الْإِحْسَانِ إِلَّا الْإِحْسَانُ (Rehman 60)

Xwedê di pirtûka pîroz da li sureta Rehman ayeta 60 anda dibêje: Qencîyê çu xelat ji qencîyê pêvetir nînin (Sigêrî, Îsma'îl 2011, 533) . Bo me eşkere dibe ji vê ayetê ku yê qencîyê bike dê qencîyê bîne. Vê gotinê jêdera xwe ji vê ayetê wergirtîye.

Yê xwarî telefe, yê day selefe (Öncü, Mehmet, 2009: 234)

- وَمَا أَنْفَقْتُمْ مِنْ شَيْءٍ فَهُوَ يُخْلِفُهُ وَهُوَ خَيْرُ الرَّازِقِينَ (Sebe 39)

Xwedê di Qur'anê da di sureta Sebe ayeta 39 anda dibêje: Her tiştêkê hun di xêrê da bimezêxin (infak) ew xelatekê li şûnê didane (Sigêrî, Îsma'îl 2011, 432). Ev gotine rasterast ji têksitê Qur'anê hatîye wergirtin.

6.2. Fermudên Pêxember (s.x.l)

Di gelek gotinên mezinan da mirov dikare bi eşkerayî karîgerîya fermudan li ser gotinan bibîne. Li jêr em dê hinek gotinan yên kuka xwe ji fermudeyan wergirtî dîyarbikîn.

- Xaletê bêhna deyîkê jê dihêt (Hecî Cefer, 1986: 42).

- عَنْ عَلِيِّ رَضِيَ اللَّهُ عَنْهُ عَنْ رَسُولِ اللَّهِ صَلَّى اللَّهُ عَلَيْهِ وَسَلَّمَ أَنَّهُ قَالَ : الْخَالَةُ بِمَنْزِلَةِ الْأُمِّ . (591) :

(Ebû Davûd , Sunena Ebû Davûd 2009:

Ji rîwayeta Elî (x.l.r) ji pêxemberê Xwedê (s.x.l.) wî got “xalet li rêza deyîkê ye”.

- عَنْ ابْنِ عُمَرَ، أَنَّ رَجُلًا أَتَى النَّبِيَّ صَلَّى اللَّهُ عَلَيْهِ وَسَلَّمَ فَقَالَ: يَا رَسُولَ اللَّهِ، إِنِّي أَصَبْتُ ذَنْبًا عَظِيمًا فَهَلْ لِي تَوْبَةٌ؟ قَالَ: هَلْ لَكَ مِنْ أُمِّ؟ قَالَ: لَا، قَالَ: هَلْ لَكَ مِنْ خَالَةٍ؟ قَالَ: نَعَمْ، قَالَ: فَبِرَّهَا

(Sehîha Tirmîzî, 1904: 313).

Ji kurê Umerî, zelamek hate def pêxember (s.x.l.) got: Ya pêxemberê Xwedê, ez ketîm nav gunehek gelek mezin da, erê tewbe jibo min heye ? Got erê te dayîk heye? Got: Nexêr. Got: Erê te xalet heye? Got belê, gotê: Li gel baş be.

Eger em sehbikin ramana van fermûdan û ramana vê gotinê dê bibînî bi rengekê rasterast ramana vê fermûdê bi vê gotinê di nav Kurdan da belav buye.

- Mirov ser sê tišta tê kuştin:

Li ser namusa xwe, axa xwe, malê xwe (Hecî Cefer, 1986: 96).

- عَنْ أَبِي الْأَعْوَرِ سَعِيدِ بْنِ زَيْدِ بْنِ عَمْرٍو بْنِ نُفَيْلٍ، قَالَ: سَمِعْتُ رَسُولَ اللَّهِ صَلَّى اللَّهُ عَلَيْهِ وَسَلَّمَ يَقُولُ: مَنْ قُتِلَ دُونَ مَالِهِ فَهُوَ شَهِيدٌ، وَمَنْ قُتِلَ دُونَ دَمِهِ فَهُوَ شَهِيدٌ، وَمَنْ قُتِلَ دُونَ دِينِهِ فَهُوَ شَهِيدٌ، وَمَنْ قُتِلَ دُونَ أَهْلِهِ فَهُوَ شَهِيدٌ. (Ebû Davûd , Sunena Ebû Davûd 2009: 151).

Ji bavê E'wer Seî'dê kurê Zeydê kurê Umerê kurê Nefel got: Min li pêxemberê Xwedê (s.x.l.) bihîst, got: Yê were kuştin ser malê xwe ew şehîde û yê bê kuştin ser xwîna xwe ew şehîde û yê bê kuştin li ser dînê xwe ew şehîde, yê bê kuştin ser wê yekê ku yek bixwaze xirabîyê li gel bike yan jî bixwaze zordarîyekê lê bike û were kuştin ew şehîde.

Eger em vê fermûdê kurt bikîn, dê ji me re yekser ev gotin xweya be.

- Jina bêheya wek girara bêxwê ye (Dêrşewî, Mela Mehmûd, 1980: 192).

- قَالَ رَسُولُ اللَّهِ صَلَّى اللَّهُ عَلَيْهِ وَآلِهِ: إِنْ مِمَّا أُدْرِكُ النَّاسَ مِنْ كَلَامِ النَّبِيِّ الْأُولَى : إِذَا لَمْ تَسْتَجِ فَاصْنَعْ مَا شِئْتَ. (Buxarî, Sahihîha Buxarî, 1993: 2268).

Pêxemberê Xwedê (s.x.l.) got: Ji wê çenda ji gotinên pêxemberên destipêkê gehîştîye mirovan: Eger şerim neke te çî bivêt bike.

- فِي الصَّحِيحِينَ عَنْ أَبِي هُرَيْرَةَ قَالَ: الْحَيَاءُ شُعْبَةٌ مِنَ الْإِيمَانِ (Buxarî, Sahihîha Buxarî,) 2015: 28).

Ebu Hureyre dibêje: Şermînî beşeke ji îmanê ye.

- فِي الصَّحِيحِينَ عَنْ عُمَرَ بْنِ عَبْدِ الرَّحْمَنِ قَالَ: الْحَيَاءُ لَا يَأْتِي إِلَّا بِالْخَيْرِ. (Buxarî, Sahihîha Buxarî, 1993:2267).

Ji Umranê kurê Husenî ji Pêxemberî (s.x.l.) got: Şermînî nayêt îla xêre. Bi ramanek din : Şermînî hemû xêre.

Vê gotinê bi rengeke rasterast serçaweyê xwe ji van Fermûdeyan wergirtîye .

- Yê qenc qencîyê, yê xerab xerabîyê dibîne, lê zû yan dereng (Öncü, Mehmet, 2009: 231).

- رَوَاهُ عَبْدُ الرَّزَّاقِ، وَأَصْلُ الْحَدِيثِ فِي صَحِيحِ مُسْلِمٍ، وَلَفْظُهُ: إِنْ اللَّهُ كَتَبَ الْإِحْسَانَ عَلَى كُلِّ شَيْءٍ. (Ebû Davûd ; Sunena Ebû Davûd, 2009: 437).

Ji vegêr Ebdilrezaq tê rîwayet kirin, binyatê fermûdê di sehîha Muslimî da, bi vî rengîye ‘‘Teqez Xwedê başî ya li ser her tiştî nivîsîye’’.

Ji van fermûdan bo me eşkere dibe ku ev gotine bi ramana xwe ve ji van fermûdan hatine wergirtn.

- Yê xwarî telefe, yê day selefe (Öncü, Mehmet, 2009:234).

- وعن أبي هريرة رضي الله عنه أن النبي صَلَّى الله عليه وسلَّم - قال: ما من يوم يُصبح العباد فيه إلا ملكان ينزلان فيقول أحدهما: اللهم أعط منفقًا خلفًا، ويقول الآخر: اللهم أعط مُمسكًا تلفًا (Buxarî, Sahihîha Buxarî, 2015: 307).

Ji Bavê Hureyre (r.x.l.) Pêxemberî (s.x.l.) gotîye: Çi roj naborin li ser bendên Xwedê û lê bibe spêde, îla du melayîket tîn xwar, êk ji wan dibêje: Xwedayê min her êkê di mezêxit başîyekê yanî berdewamîyê bidê, yê dî dibêje: Xwedê min yê nemezêxit û vegirit tu jinavçûnê bidîyê.

Ev gotin û ev Fermûdeya pêxemberî (s.x.l.) yek mebestin. Ku dibêje yê xêran bike wê Xwedê jêra zêde bike. Yê xêran neke Xwedê lê kême bike.

- Heke ya Xwedê hat ya e’bda betale (Hecî Cefer, 1986: 108).

Pêxember (s.x.l.) di Fermûdekê da. Behsê vê çendê kirîye dema dibêje: Eger mirov hemû kom bibin, zîyanekê bigehînin te, neşên heke ew nebit ya Xwedê bo te heskirî. Eger hemû mirov kom bibin mifayekê bi gehînin te neşên îla ew nebe ya Xwedê bo te heskirî.

Mirov li naveroka vê Fermûdeyê binêre. Dê hîn be ku vê gotina mezinan wateya xwe ji vê Fermûdeya pêxemberî (s.x.l.) wergirtîye.

- Axaftina xoş, bihara dilane (Hecî Cefer, 1986: 11).

- عن أبي هريرة رضي الله عنه قال: قال رسول الله صلى الله عليه وسلم: الكلمة الطيبة صدقة (Buxarî, Sahihîha Buxarî, 1993:1090).

Ji bavê Hureyre (r.x.l.), got: Pêxemberê Xwedê got: Peyva xweş û baş xêre.

Mirov dikare bêje vê gotinê koka xwe ji vê fermûdê wergirtîye.

- Xwedê gotîye: Ji te hereket ji min bereket (Hecî Cefer, 1986: 46).

- عن أبي هريرة رضي الله عنه أن رسول الله صلى الله عليه وسلم قال: لأن يحتطب أحدكم حزمة على ظهره خير له من أن يسأل أحدًا فيعطيه أو يمنعه (Buxarî, Sahihîha Buxarî, 1993:730).

Ji Bavê Hureyre (r.x.l.) Ji pêxemberî (s.x.l.) gotîye: Eger êk ji we barekê daran liser pişta xwe hilbigirit bo wî bixêrtire ji hindê destê xwe ber yekê veke evca bide yan nede.

Yanî eger mirov kar bike baştîre ji hindê mirov xwastinê bike. Eger mirov karkir Xwedê dê bo mirov bereketê dixê.

Jina nebijêre esl xêre (Dêrşewî, Mela Mehmûd, 1980: 162).

- عَنْ أَبِي هُرَيْرَةَ رَضِيَ اللَّهُ عَنْهُ عَنِ النَّبِيِّ صَلَّى اللَّهُ عَلَيْهِ وَسَلَّمَ قَالَ : تُنْكِحُ الْمَرْأَةُ لِأَرْبَعٍ : وَلِحَسْبِهَا... والخ (Buxarî, Sahihîha Buxarî, 2015: 829)

Ji Bavê Hureyre (r.x.l.) ji pêxemberî (s.x.l.) got: Jin tê mehirkirin ser çahar tişta: Ser esl û fêslên wê hwd.

Ev gotine jêderê xwe ji vê Fermûdeyê wergirtîye .

Herwisan gelek gotin, li ser gotinên zanayan û kesên şareza û jîr ve ên hatîne gotinê. Lêbelê me bi tenê behsa hinek wan gotinan kir ên koka wan ji ayetên Qur'ana pîroz û Fermûdeyên pêxemberî (s.x.l.). Her çende eger me nivîsandiba, da gelek gotinên din jî hebin ku koka wan ji Fermûde û ayetên Qur'ana pîroz.

BEŞA YEKEMÎN: DI FOLKLORA KURDÎ DA GOTINÊN MEZINAN

1.1. Di Folklorê Da Cihê Gotinên Mezinan:

Folklor ji gelek beşan pêktê, di hemû beşên folklorê da, bikaranîna gotinên mezinan ji beşên dî yên folklorê pirtire. Ewe jî bi egerê zutir jiberkirina wana ji beşên din tê. Dîsan gotinên mezinan ji layê hemû taxên civakî ve têne jiberkirin û bikaranîn. Herwisan dibe hemû kesan ew kêf nebe ku çîrokên folklorê, dastan, stran, mamik hwd. Jiber bikin û di axaftinên xwe yên rojane da bêjin. Ewe beruvajî gotinên mezinane ku zû têne jiberkirin û pirtir têne bikaranîn, jiber sivikî û wate ya wan ya bilind. Gotina mezina watayek mezin bi hinek peyvên piçûk dariştîye. Dibe ku mirov jibo piştgirî yan bo pirtir ronkirina axaftina xwe gotinekê bibêje. Lêbelê mirov nema kare ku bo pirtir ronkirina axaftina xwe çîrok yan serhatî yekê bibêje. Lêbelê mirov dikare gotinekê bêje. Jiber ku gotin kurtin û gelek dema mirov nabe ku beruvajî ne li gel beşên din yên folklorê ku ew beş dirêjin.

Bikaranîna gotinan di nav miletî da, ji layê hemû civakî ve ye bi rengekê giştî, çî zarok, sinêle (ciwantî), genc, pîr, jin û kiç bin, hemû bikartînin.

Mînak:

Eger kesek şaşîyekê bike li şuna kesê beramber bo eşkerekirina şaşîya wî çîrokekê yan serhatî yan bo demekê bo baxive. Dê yek gotinê jibo bibêje, ew bixwe dê şaşî yan xeletî ya xwe fêm bike. Herwisan eger mirov raste rast şîretan lê bike dibe hêrs bibe. Lêbelê bi rêka gotinê dê pirtir karîgeriya xwe lê bike .

Gotinên mezinan beşeke herî mezin ji folklorê Kurdî bixwe ve digire. Peywendîya gotinên mezinan bi hemû beşên din yên folklorê ve peywendîyeke xurte. Dibe ku dema gotina dastan yan çîrok yan hwd. da mirov ligel dastanê gotinê jî bibêje. Gotinên mezinan di nav gelek beşên din yên folklorê da cihê xwe girtîye.

Di gotinên mezinan da gelek gotin jibo zarokî, jinê, zelumî, gencî hwd. yên hatîne gotin.

Mînak:

Ew gotina dibêje: Eger minal siwarî ker bikrêt gewrebê danî zil ebê (Umêd Ehmed, 1980: 11). Ev gotine bo wê çendê hatîye gotinê ku mirov zarokî siwarî ser kerê neke. Jiber ku zarokî şîyan nînin xwe li ser bigire. Bo pirtir parastina zarokî ev gotin ya hatîye gotin da ku siwarî kerê nebe. Jiber hindê yê tirsandî, li dahatî da dê kareke xerab biserê wî were. Ev gotin bo zarokê piçûk yê hatîye gotin. Jiber ku zarokê sav gelek şîyanên hizrkirinê nîne. Ku bi pirse û bêje çima didanên mirov necan dibe eger mirov siwarî kerî bibe .

Dîsan ew gotina dibêje şêr şêre, çi jine, çi mêre ev gotine bo hindê ya hatîye gotin ku zîrekî û şarezayî ya mirovan ne di regezê wan daye, belkî ya di karê wan da. Bi egerê gotinan bîrûbawerên nû jibo xelkê dirust dibin (Îdrîs Ebdullah, 2014: 9). Jiber ku gotin dê serbora kesekê kar kirî, vediguhêze daku kesên din wê xeletiyê dûbare nekin.

Mînak :

Dara xwezîyê kes li ber siha wê ne rûniştîye xwarê. (Dêrşewî, Mela Mehmûd, 1980: 123). Yan jî gotineke din heye dibêje: “Bi xwezîya kes negehişte cotê kezîya” jibo me eşkere dibe, ji van gotinan ku çi kar bi xwezîyan ve nayên. Eger me hêvîyek hebe divê jibo wê hêvîya xwe kar bikin, nek xwezîyan bo bixazîn û bi destên vala ve runin xarê û li benda çarenivîsê bextî bin .

Herwisan di gelek gotinan da navê gîyaneweran hatîye gotinê. Eve jî dibe egerek ku pirtir gotin bêne bikaranîn. Renge mirov neşet gotinê rasterast jibo kesê beramber bibêje, hîngê mirov dê gotinek li ser wê rewşê yan wan rudanan bibêje, hîngê yê beramber bi xwe dê têgehit ka mebista mirov pê çîye.

Mînak :

Mêrga bi firîz, gayê dev gilîz, zelumê hîz çi cara lê nabine payîz (Hecî Cefer, 1986: 98). Ev gotin behsê wê yekê dike ku mirovê hîz tu cara pîrnabe .

1.2. Gotinên Mezinan Lidef Kurdan

Gotinên mezinan di nava civakê Kurdî da cihekê berz û bilind girtine, çî ji alîyê bikaranînê ve be yan jî ji alîyê şêwe, rûxsar û naveroka wan ve be. Kesên xudan bawername û yê nexwêndewar gotinên mezinan di jîyana xwe ya rojane da bikar tînin. Eger em digel kesekê navsalveçuyî ku dibe navê xwe jî nezane binivîse, tê bibînî bi sedan gotin jiberin. Li ser her babetekê gotinek yan bêhtir ya heyî ku bo bilindkirina astê axaftina xwe bikar tîne. Herwisa gotinên mezinan ji alîyê zarokan ve jî di axaftinê da têne bikaranîn weku piştgîrî bo axaftina xwe bikar tîne.

Gotinên mezinan ji beşên din ên folklorê bêhtir têne bikaranîn û jiberkirin. Jiber ku renga hemû kes hez dastana yan çîroka nekin, çî bi sedemê dirêjîya babetê yan naverokê be. Lêbelê gotina mezinan hemû kes jê hez dikin, ji ber ku eger kesek hez şeran û gotinên li ser mêranîyê neke û dê gotinek aborî yan ayînî yan li ser siruştî bo xwe jiber bike, li gor pêdivîya axaftina xwe ya rojane bikarbîne. Her babetekê hebe pêwendî bi jîyana gelê Kurd ve heyî, béguman dê di nava folklorê da û bi taybetî jî di nava gotinên mezinan da bête dîtin.

Sererayî pêşkeftina civakî û guherîna amûrên karkirinê jî lêbelê her ew gotinên li ser karkirinê di nava gotinên mezinan da têne bikaranîn û di jîyana rojane da jî têne dûbarekirin.

Mînak:

Yan naçim aşî, yan ezê aşvanî bikûjim (Dêrşewî, Mela Mehmed 1980: 304). Ev gotin wê demê hatîye gotin demê karê aşvanîyê berbilav di nava xelkê da. Lêbelê her çende ev kare niha gelek kêmbûye li çav berî niha. Lêbelê her ev gotine di niha jî da têne bikaranîn. Ji vê gotinê xalek gelek girîng ya folklorê bi giştî bo me dîyar dibe ku berhemên folklorî ne bitenê jibo demekê destnîşankirî têne gotin, belkî bo heta hetayê têne gotin. Ev jî dizivire bo hindê di folklorê da alîyê naverokê bêhtir û girîngtîre ji yê rûxsar ve. Jiber ku eger em alîyê rûxsarê va li gotinê binêrin dê bînin peyvên “aş û aşvan” di niha da gelek bikêmtir têne bikaranîn. Lêbelê ev gotine têne bikaranîn jiber ku naveroka wê girîngtîre ji rûxsarê wê. Lêbelê eger em ligor rûxsarî biçin renga peyvên wê gotinê hema nayêne bikaranîn.

Merem ji vê gotinê ewe ku yan dê karekê bi zêdeyî bike yan jî nake. Peyvên aş û aşvan bitenê weku mînakekê hatîne bikaranîn di nava vê gotinê de.

1.3. Di Gotinên Mezinan Da Alîyê Olî

Kurd di çaxên pêşîn da gelek olperest bûne. Eger em li dîroka gelê Kurd binêrin dê hîn bin ku her dem mîletê Kurd olê xwe parastîye. Mîletê Kurd bi dirêjahîya dîrokê, parastin li ser ola xwe kirîye. Gelê Kurd di her çax û demekî da olek ji xwe re girtîye. Olê Kurdan li berîya ayînê îslamê da perestvan û alîgirên ola Zerdeşt pexamber bûn. Paşî piştî ayînê îslamê hatî, gehîştîye deverên Kurdistanê. Kurdan ev ayîn qebulkir weku ayinekê Esmanî. Kurd bûne musulman, her çende hemû na. Lêbelê piranîya Kurdan bûne musulman. Di nava Kurdan da gelek olan hebûna xwe heye. Mîna olê zerdeştî, olê kirîstîyanan, olê êzidîyatî, olê kakeyîyan hwd.

Di dîrokê da bo Kurdan hatîye gotinê ku Kurd mirov perwer bûn, rêz li dayik û bavan girtine hwd. Ev axaftina me gotî di nameka serkirdê leşkerê îslamê da, bo me dîyar dibe, demê deverên Kurdan rizgarkirin. Serkirdê leşkerê îslamê namek bo xelîfê musulmanan Umerê Kurê Xetabî rêkir û tê da bo nivîsî “Emên hatî di nava mîletekê da ku ew îslamê bikartînin bê nav. Rêzê li pîrên xwe digirin, bihayî didine dayik û bavan hwd.” (Nîbar Bedî’, 10 Sibat 2012). Anko li gor binemayên îslamê jîyana xwe birêve dibin, bi tenê navê îslamê bikarnayînin. Ev çende jibo hindê dizivire ku di dîrokê da Kurd xudan ol bûn. Ev çend rewîştên baş ên ku mirov dikare bêje rewîştên olîne di nav Kurdan da, jibo hindê vedigere ku hemû ol pişt didine mirov ku karên baş bike û ji karên xerab bi dûrkeve. Başî û xerabî di nava hemû olan da weke yeke. Ji vê yekê bo me eşkere dibe ku Kurd dîvçûyên olî bûn bi dirêjahîya dîrokê. Berî îslam jî derkeve Kurd her olperest bûn.

Despêkê da zanist û ol di mizgeftan da hatine xwandinê. Ji xwe yekemîn ayeta Qur’ana pîroz bo pêxember Mihemmedî (s.x.l.) hatî, gotê bixwûyîne. Anko ola îslamê di destpêka xwe da girîngî bi zanist û zanîne daye. Destpêka fêrbûna zanist û zanîne mizgeft bûn. Di van mizgeftan da zanistên şer’î hatine xwandinê. Paşê da bawername bi feqeyan werin dayînê. Di gotine van feqeyan melayê 12 zanistî-îlmî.

Yekemîn car fêrkirin di mizgefta pêxemberî (s.x.l.) de hatîye kirin. Yekemîn mamosteyê mizgeftan jî Mihemmed pêxember (s.x.l.) bi xwe bû. Ku hevalên xwe hînî binema û erkên îslamê dikir. Ev jî li mizgefta Qebayê a ku dikeve bajarê Mekeyê. Ku ev mizgeft dibe yekemîn melbendê xwandina zanist û zanîna binemayên ola îslamê.

Di nava Kurdistan da jî cihê xwandin û nivîsînê her mizgeft bûn. Weku me eşkere kirî ku ji destpêka hatina îslamê Kurdistan ev ol wergirt û li peyî ola îslamê tev digerîyan. Her cihekê hebe piçûk be yan mezin be, gund be yan bajar be, mizgeftêk lê heye. Ew mizgeft jî bûye serûkanî jibo belavkirina zanist û zanîne.

Li deverên Kurdistan zanistên olî û edebî li tekya dihate xwandin. Ku ev tekya jî di mizgeftan da bûn. Tekya cihê belavkirina zanist û zanîne bûn. Tekya mîna xwendîgeh û zanîngehên niha bûn. Gelek cureyên zanistan di tekyan da hate xwandin. Zêdebarî zanistên olî, gelek zanistên din jî têda di hatine xwandin. Gelek tekya li deverên Kurdistan hebûn. Hinek ji wan tekyan gelek bi navû deng bûn û hinek jî kêmtir nav û dengê wan hebû.

Di nava Kurdistan da zêdebarî navê tekya, bi navê xaneqa jibo cihên belavkirina zanist û zanîne dihate bikaranîn (Ansîklopedîya Parêzgeha Duhokê, 2017: 186).

Ev ayîn perwerîye jî di jîyana millet da bi rengekê giştî reng veda ye û bi taybetî jî di alîyê wêjeyî da karîgerîya xwe li ser berhemên wêjeyî kirîye. Yek ji wan alîyên wêjeyî jî gotinên mezinane. Di gotinên mezinan da mirov dikare karîgerîya yekser ya ayînî li ser gotinan bibîne. Gelek ji gotinên mezinan, ayetên Qur'ana pîroz û fermûdên pêxemberî (s.x.l.) û ji binemayên ayînê îslamê serçawe wergirtîye. Li ser vê çendê jî mînak zorin. Her gotinekê bi şewazekê cuda, serçaveyê xwe ji olê wergirtîye.

Mînak bo gotinên mezinan pirin yên serçaveyê wan alîyê olî be. Em li gor şîyanên xwe hinek mînakan didine dîyarkirin.

Mînak :

Xwoş here dê bi belayê ra gehî, hêdî here dê bela bi tera gehît (Hecî Cefer, 1986: 42).

Ev gotin behsa hindê dike û gereke me bawerî bi qeza û qederê hebe. Ya Xwedê bo me heskirî dê ew be. Eger mirov çend ji qedera xwe dûrbikeve wê ew bi

mirov re bigehe. Ev çende babetekê here girînge di hemû olan da. Di ola îslamê da, bawerî bi qeza û qederê yeke ji binemayên ola îslamê ye.

Xudanê sebrê be, mîrê misrê be (Hecî Cefer, 1986: 43).

Ev gotin behsa wê çendê dike, ku mirov xudan sebir be. Mirov bêhna xwe li ser hemû karan fireh bike. Di gelek gotinan da mezinan em destek dane hindê ku lezê di karan da nekin, Jiber ku hemû karên bilez bèn encamdayîn, wê encamê wan bi şaşî derkeve holê. Di kevin da Misr bi nav û deng bû. Hemû kesê nedikarî bibe mîrê Misrê. Bav û kalên me ji me re gotîye kesê bi sebir be herwekî mîrê Misrê ye.

Mînak:

Xwedê rizqê gurgê kore jî dide (Hecî Cefer, 1986: 45).

Eger em li ayet û fermûdên pêxemberî (s.x.l.) binêrin. Em dê gelek ayet û Fermûdeyan bibînin merema wan wekî vê gotinê ye. Merema ji vê gotinê ew e ku Xwedê rizqê gurgê kore jî dide. Ev gotin ser hindê ye eger mirov bawerî bi Xwedê hebe. Xwedê dê rizqê mirov bide ka çawan rizqê gurgê kore dide. Ev gotin bawerîya mirov bi Xwedê û rizqê mirov zêde dike. Gotineke din jî wekî vê gotinê heye dibêje; Xwedê hêlîna teyrê kore jî çê dike (Hecî Cefer, 1986: 43). Merem jê ew e ku Xwedê bi dilovanîya xwe rizqê hemû kesan dide. Xwedê zordarîyê li gîyaneweran (ajalan) nake evca çawan tê li mirovan bike.

Mînak:

Xwedê heqê vî destî bo wî destî nayêlît (Hecî Cefer, 1986: 45).

Di vê gotinê da, dadperwerîya Xwedê ji me re eşkere dibe. Merem pê ew e ku Xwedê mafê kesê li ser yê din ji bîr nake. Xwedê sitema mirovan ji bîr nake. Eger yek zorîyê li yeke din bike. Xwedê wê zorîyê jêra nayêle.

Mînak:

Xwedê êkê dikete hizar, hizara dikete êk (Hecî Cefer, 1986: 46).

Ev gotin behsa wê yekê dike ku Xwedê bereketa xwe têxe her tiştî.

Mirî ne mel'ûn bit gor lê teng nabit (Dêrşewî, Mela Mehmûd, 1980: 264).

Ev gotin jî serçaveyê wê fermûdên pêxemberî ne. Ku di gelek Fermûdeyan da, behsa jîyana di gorî da kirîye. Herwisa behsa hindê jî hatîyekirin ku eger mirî nebaş be, wê di gorî da were êşandin, gor dê lê teng be.

Mînak:

Mirî bi xêr bit, mirî şo bi xwe tê (Dêrşewî, Mela Mehmûd, 1980: 264).

Mirin wekî babetekê serekî di gotinan da cihê xwe girtîye. Ev gotin ser hindê ye eger mirî baş be, karên baş li dinyayê kirbin. Mirîşû bi xwe tê, yanî bo şuştinê mirovên wî heyîrî namînin. Lêbelê eger xerab be, kesê ku wî dişût bi zor û zehmetî tê.

Mînak:

Heke ne dit hakimê heyî, xwelî li serê hatimê teyî (Dêrşewî, Mela Mehmûd, 1980: 291).

Hakimê heyî merem pê Xwedê ye anko dadwerê sax. Eger Xwedê nede mirov. Dana mirovan ji xwe ye. Dana mirovan çend be, eger ya Xwedê digel nebe, tê xwelî li serê mirov be.

Hosta necar were binve wekî her car şev yeke û dergeh hezar (Dêrşewî, Mela Mehmûd, 1980: 296).

Di vê gotinê da bo me eşkere dibe, eger Xwedê dergehê li mirov bigire yeke din vedike. Herwisa ev gotin wî çaxî tê gotin demê karek ser mirov zehmet yan dijwar be. Dê yek jêra bêje “Hosta necar binive wekî her car şev yeke dergeh hizar”. Bi merema wê yekê ev gotin tê gotinê ku Xwedê dê dermanekê ji derdê tera bibîne. Ev gotin bi rengê din jî tê gotin; hosta necar binve wekî her car Xwedê yeke û dergeh hizar. Di merema xwe da her du gotin weke yekin.

Xwedê hind baranê dide hingê erd ragirt (Dêrşewî, Mela Mehmûd, 1980: 97).

Ev gotin wî çaxî tê gotin ku dema tengasîyek ser yekê da were. Hêş ew tengasî bi dawî nehatibe. Ew hizr dike wê tengasîyeke ji wê mezintir ser da were. Wî çaxî dê ev gotin jêra were gotinê. Herwisa ji vê gotinê tê famkirin ku Xwedê karekê ji şîyanên mirov zêdetir bi mirov nade.

Xêr xudanê xwe dinîyasît (Hecî Cefer, 1986: 42).

Ev gotin behsa hindê dike ku xêr li xudanê xwe xwedî derdikeve li dinyayê û axiretê. Ramana vê gotinê jî di gelek metnên ola îslamê da derbaz bûye. Ku xêr hem li dinyayê xudanê xwe wê ji tengasî û nexweşîyan dûr bixe û hem li axîretê jî.

1.4. Di Gotinên Mezinan Da Naverok

Ka çewa rûxsar girînge bo mana berhemê edebî wisa naverok jî girînge. Rûxsar û naverok weke du alîyên diravîne bê yek nabin. Naveroka gotinên mezinan

weku rûxsar ê gotinên mezinan berz û bilind e. Naverok ligor pêdivîya civakî bo gotinên mezinan hatîye vehandin. Naverok di gotinên mezinan da naverokeka aborî, sîyasî, ayînî, mirovayetî, dadperwerî, karkirin hwd. Ev jî hemû bo perwerdekirina civakî ye bo encamdana karên baş û hişyarkirin ji şaşî û xeletîyan. Di gotinên mezinan da dibe rûxsar bêhtir bê guherîn. Lêbelê çî caran naverok nayê guhertin. Jiber ku naveroka gotinan li gor pêdivîya civakê hatîye danan. Alîyê naverokê di gotinên mezinan da yek ji babetên here girînge ku hêjayî şirovekirinê ye. Eger rûxsar di gotinan da çend girîng be girîngîya wê nagihêje alîyê naverokê. Em dê bizavan bikin ku hinek ji wan alîyan dîyarbikin. Naveroka gotinan

1. Alîyê Aborî: Eger em li gotinan binêrin dê bibînin ku çendîn gotin yên li ser alîyê aborî ve hatine gotin. Da ku xelk girîngîya vî alîyê girîngê jîyanê bizane. Di çendîn gotinên mezinan da gotin û şîret li me kirine, em destek dane ku vî babetî bi girîngî werbigire. Bav û bapîrên me çendîn gotin li ser vî bavitetî gotine.

Mînak:

Neçe bajêra bê dirav, neçe gunda bê mirov (Hecî Cefer, 1986: 106). Eger mirov biçê bajêran bê dirav. Wê demê mirov dê poşman be. Ji berku ew bajêrê mirov diçê dibe mirov kesê lê nas neke. Eger mirov kete tengasîyekê wê demê dê pare mirov xelas bike. Eger pare jî nebin, wê demê dê karê mirov zor be.

2. Alîyê Dîrokî: Gotinên mezinan mîna gelek babetên din yên edebî rengvedane jibo dîrokê. Alîyê dîrokê bi eşkerayî di gelek gotinan da xweya dibe. Ku di wan gotinan da behsa rûdanên dîrokî yên wî serdemî hatîne kirin yan jî rûdaneke em yên jê hişyarkirin ku nekevîne di wê şaşîyê da.

Mînak:

Newal xalîye rovî tê de walî ye (Celalî, Mela Êsiv, 2014: 168). Ev tê wê ramanê ku serdema ev gotin tê da hatîye gotinê, wî demî bo ku demê walîtî derketî holê. Ji wê demê û şunde bikar hatîye.

3. Alîyê Sîyasî: Gotinên mezinan di hişyarkirin û rêxistina gelê Kurd da rolekê dîyar û pêşçav hebûye. Di vî warî da gelek gotinên mezinan hene.

Mînak:

Destê tinê deng jê nayê (Dêrşewî, Mela Mehmûd, 1980: 110). Eger yekgirtin nebe serketin jî nîne. Destikê bivirî dare, lew dar dêt birînê (Hecî Cefer, 1986: 52). Ev gotin nîşanî me dide ku gereke em bixwe li xwe xweyî derkevin. Nabe zîyanek ji me bixwe bigehe me.

4. Alîyê Civakî: Ew babetên civakî yên di gotinên mezinan da hatîne behskirin. Wekî amojgarî, mêranî, welat parêzî, karkirin, hevaltî (dostînî), ayînî, rastî, afret (jin), zordarî, zelamî û merdayetî ne. Bi şiklê li jêr tîne rêzkirin.

Amojgarî: Behra bêhtir ji gotinên mezinan gotin û şîret û amojgarîne. Bav û bapîrên me, bi wan gotinan va em hişyarkirin ji karên xirab û nebaş.

Mînak:

Qencîya bê me'rîfetî wek nanê bin av ketî (Hecî Cefer, 1986: 80).

Qedrê mêvanî serferazîya xudanî (Hecî Cefer, 1986: 80).

Mêranî: Mêranî yek ji rewîşt û tîtalên mîletê Kurdane ku ev sîma di gelek gotinan da rengvedaye.

Mînak:

Sed bi êkîne, êk bi sedaye (Hecî Cefer, 1986: 67).

Heke mêr mêr bît, bila xencera wî kêr bît (Hecî cefer, 1986: 113).

Welat Parêzî: Di gotinên mezinan da gelek gotin li ser welat parêzîyê hatîne gotin.

Mînak:

Heke tu bûye beg û paşa, li mîletê xwo neke haşa (Hecî Cefer, 1986: 110).

Karkirin: Karkirin beşek gelek mezin ji naveroka gotinên mezinan bixwe ve digire.

Mînak:

Destê neket, bo birînê başe (Hecî Cefer, 1986: 50).

Rêncberê xwe be, axayê mala xelkê be (Dêrşewî, Mela Mehmûd, 1980: 127).

Hevaltî (Dostîni): Miletê Kurd her ji kevinda girîngî bi hevalîniyê daye û çendîn gotin li ser gotine.

Mînak:

Dijminek geleke, sed dost pîçekin (Hecî Cefer, 1986: 54). Anko jibo hevalîniyê dive mirov hişyarî xwe be ka dê digel kê û çawa hevalîniyê bike.

Ayîni: Gelek gotinên mezinan verêja ayet yan Fermûdeyekê yan têkistekê ayîni ne.

Mînak:

Dinya ware, axiret male (Hecî cefer, 1986: 54).

Rastî: Alîyê rastîyê di gelek gotinan da hatîye behskirin.

Mînak:

Rastî di nav agirî da nasojît (Hecî Cefer, 1986: 58).

Afret (Jin): Di gotinên mezinan da gelek gotin bi jinê û li ser jinê hatîne gotin.

Mînak:

Jin heye terşa mala, jin heye rewşa mala (Hecî Cefer, 1986: 63).

Jintîyê jiber jintîyê mal kir, hewîyê jiber hewîyê xwe ciwan kir (Hecî cefer, 1986: 65).

Zelamî û Merdayetî: Di gelek gotinan da ev babete yê hatîye behskirin.

Aw bitba le pirdî, namerd meperewe (Îzedîn Mistefa Resul, 1970: 99). Anko eger av mirov bibe, bila li ser pira nemerda ra derbas nebe.

Zordarî: Her di kevin da Kurd bi zordarîyê razî nebûne û di gelek gotinan da behs lê hatîye kirin.

Mînak:

Bila mirovê mirî bît, neku di bin zilma dijminî bît (Hecî Cefer, 1986: 23).

1.5. Taybetmendîyên Gotinên Mezinan

Wek aşkera her babetekê hinek taybetmendî yên heyin ku pê tê naskirin. Gotinên mezinan jî gelek taybetmendî hene ku pê têne naskirin. Em dê bizavan bikin hinek ji wan taybetmendîyan li jêr eşkere bikin:

1. Her gotinek mezinan waneyek ciwan dide destê mirov. Gotinên mezinan bi hemû warên jîyanê yên hatîne gotin. Vegêrê gotinê mebesta wî hişyarkirin û fêrkirine jibo hindê da kesên derdûr nekevne wê xeletîyê. Yan jî eger bixwaze karekê bike bizanî çawa û ji kî ve destipêbike (Îdrîs Ebdulla, 2014: 7).

2. Gotinên mezinan bi egerê serpêhatîyên dirêj ên gelî hatîne gotinê (Deşteki, Umer, 1972: 4). Gotinên mezinan nexşê li berane ka çawa nexîşkirina beran bi zehmete, wisa gotinên mezina bi zehmetî yên hatîne gotin ku ji encamê rojên dûr û dirêj yên hatîne gotin .

3. Gotinên mezinan weke yasa û destûrên jîyanê ên civakî, aborî û sîyasî lê hatine. Di nava gel da jibo rêvebirina jîyana rojane tî bikaranîn (Şareza, Kerîm, 1976, 8). Ev jibo astberzîya rûxsar û naveroka gotinên mezinan dizivire.

4. Gotinên mezinan û biwêj axaftinên mîletî ne. Nivîskarê wana civak bi xwe ye (Îzedîn Mistefa, 1970: 79). Ya dîyare her gotinek mezina ji alîyê kesekî ve yê hatîye gotin û ev gotin ji alîyê gelî ve hatine wergirtin. Borîna demî û berdewamîya bikaranîna wê navê nivîskarî nemaye, jiber hindê xwedanê gotinên mezinan gel bi xwe ye.

5. Gotinên mezinan û biwêj, di nav axaftinan da dijîn û pêhtir jibo ronkirina axaftinê tî bikaranîn (Şukrîye Resul, 2008: 7). Gelek caran piştî Qu'ran û fermûdên pêxemberî (s.x.l.) gotina mezina tînin wek belge jibo axaftina xwe.

6. Ne di gotinên Kurdî bi tenê da, lêbelê di gotinên gelên din jî da hest bi kêş û curekê musîqayê têkirin. Eve dibe e mercê cudakirina gotina ji axaftinên rojane (Şareza, Kerîm, 1976:15). Çend bigeryê li çerx û felek, rizq êke nabit gelek (Hecî Cefir, 1986: 37).

7. Gotinên mezinan ligel xwe kurte çîrokê jî tîne di nav folklorê da. Jiber ku her gotinekê çîroka xwe ya hey (Îzedîn Mistefa, 1970: 80). Lêbelê kurtîya gotinê buye eger ku çîrok bêne jibîrkirin. Çîrok jî dirêje lewma bi tenê gotin ya hatîye jiberkirin. Her çende li cem bav û kalan çîroka her gotinekê ya hey. Piştî gotinê çîrokê jî dibêje.

8. Dibe hinek caran wek hevî di yêk gotinê da li dev dû yan sê gelan hebe yan jî cihê peyvan hatibe guherandin. Lêbelê ramana wê yekê nade ku ji hev wergirtine (Îzedîn Mistefa, 2011: 56). Piranîya dîyalêktan di zimanê Kurdî da buye egerê wekhevîyê di gotin da. Dîsan ji bajarekê bo yeka din cîguherîn bi peyvên gotinê hatîye kirin.

9. Gotinên mezinan û biwêj nêzîkî hevîn lêbelê nikarin cîyê hevdu bigirin. (Îzedîn Mistefa, 2011: 78). Mirov dişet bibêje gelek ji gotinên mezinan dibine qisên nesteq. Lêbelê qisên nesteq nabine gotinên mezinan. Bikaranîna gotinên mezinan û qisey nesteq ji beşên dî yên folklorê pirtire.

10. Gotinên mezinan risteyek kurte bi ramanek berifrehe. Hinek caran ramana wê ya eşkere dibe û hinek caran jî pêdivî bi hizrkirinê ye heta di ramanê bigehîn (Îzedîn Mistefa, 1970: 79).

11. Gotinên mezinan yên Kurdî her ew taybetmendîye yên heyin, yên di gotinên mezinan yên gelên xwedan dîrokên kevin (Îdrîs Ebdulla, 2014: 9). Merc nîne ew gotinên di nav pirtir ji gelekê da heyin ji êk wergirtibin. Jiber ku kawdanên jîyanî li her cihekê hebe wek yekin. Lêbelê jibo mînak eger gelekî wergirtibit jî ew gotin ya li gorî rewş û kawdanên civakê xwe ya guncandî.

12. Gotinên mezinan pêhtir ji alîyê nexwendevanan ve hatîne parastin. Ji bav bo kurî û dayîk bo zarokî hatine veguhastin (Rustemî, Ehmed, 2012: 17). Melbendê gotinên mezinan gundin û zêdetir jî xelkê gundan yên nexwendevan bûn. Ev gotine ji

layê wan ve hatîne jiberkirin û bav bo kurî, dayîk jibo zarokê hatîne veguhastin ji nifşekê bo êke dî. Bi vî rengî gotinên mezinan hatîne parastin.

13. Gotinên mezinan kevin nabin. Çiqas jî pêşkeftina jîyanê di hemû biwaran da hebe. Gotinên mezinan li gorî civakê tene guherandin (Îdrîs Ebdulla, 2014: 10).

Mînak:

Avê vexo ji kanîya, jinê bîne ji eslîya, da bibînî e'cêbîya (Hecî Cefer, 2013: 265). Eger rewşa civakê çend bête guherandin û berv pêşve biçit, çi caran ev gotine kevin nabit. Berdewam gel pêdivî vê gotinê ye. Amojgarî û şîreta vê gotinê li hemû dem û wextan bo mirov pêdivîye.

14. Gotinên mezinan fêrkirin û perwerdekirin têda tê dîtin (Rustemî, Ehmed, 2012:19).

Mînak:

Xwarina evro bihêle bo subahî, şolê evro nehêle bo subahî. (Hecî Cefer, 1986: 46). Ev gotin bi rengê şîretê ye bo mirov ku gereke mirov karê xwe ji sibe ra nehêle. Dibe sibe mirov karek din hebe.

1.6. Di Gotinên Mezinan Da Rûxsar

Rûxsar û naverok babetekê girînge jibo berhemê edebî, rûxsar û naverok temamkerên yekin, bo gehandina raman û merema berhemê edebî. Eger babetê edebî naverokek gelek baş hebe. Lêbelê rûxsar jî wek naverokê pêwîst nebe. Li wê demê ew naverok jî dê ya leng be. Di gotinên mezinan da rûxsar jî wekî naverokê bi şêwazekê hunerî yê berz yê li ser hatîye nivîsîn.

Lêkolînerê Îngilîz Arter Tatblur di vî bareyî da dibêje “Gotinên mezinan hevokeka bi rêkûpêke û bi şêweyekê ciwan hatîye dariştin. Wek ramanek bi tîvil û pir mifa di nava xelkê da belavbûye” (Efan Heme Şerîf, 2000: 101).

Ehmed Emîn li ser gotinê dibêje; gotin cureyeke ji cureyên edebî, bi peyvên kurt û ramana ciwan û rehwanbêjîyê ji axaftina rojane tê cudakirin. (Efan Heme Şerîf, 2000: 101). Ji axaftinê bo me dîyar dibe ku gotinên mezinan bi peyvên kurt û pir raman hatîne gotin. Şêwazê wan ji yê axaftina rojane cudaye.

Hinek caran gotinên mezinan bi şêweyê hozanê ne.

Mînak:

Ey bihar, roj bûne zeman, kabanî bûne beqal, rêk bûne hizar (Akreyî, Xalid 2010: 10).

Navê kelupelên Kurdewarî yên di jîyana rojane da kar pê tê kirin, di gotinên mezinan jî da rengvedaye. Wekî bivir, das, cut, nêçîr hwd.

Mînak:

Seyê bi te'dayî biçîte nêçîrê, nêçîrê naket (Hecî Cefer, 1986: 68).

Eger bum şivanê gundekî, ji her malekê di sitînim nanekî (Akreyî, Xalid, 2010: 12).

Hinek gotin bi şêweyê pisyar û bersivê ne.

Mînak:

Cotîyaro ew çîye tu diçînî? Got: Dema hişîn bî tê bibînî! (Dêrşewî, Mela Mehmûd, 1980: 71).

Hinek gotin wisane ku şibandin ya têda anko tiştekî weke tiştekê din lê bike.

Mînak:

Zarok fêqîyê nav malê ne (Nîhad Se'dullah, 1976: 252).

Di gotinan da navê gelek gîyaneweran yê hatîye gotinê. Bi taybetî ew gîyanewerên di jîyana rojane da hatine dîtin. Kew, darkuke, bizin, pezkovî, hirç, ker, hêstir hwd.

Mînak:

Bila ez xwarina şêrabim, neku nêçîra rovîya bim (Hecî Cefer, 1986: 22).

Eger se bo hevalê gurgî, pezî çî halê xwo namînt (Akreyî, Xalid, 2010: 12).

Eger ga keft, sîkard zor dibin (Akreyî, Xalid, 2010: 14).

Serê du berana li dîzekê nayê kelandin (Dêrşewî, Mela Mehmûd, 1980: 194).

Navê werzên salê û gulan û fêqî jî di gotinên mezinan da yên hatîne gotin.

Mînak:

Adarê befrê xwe havête guhêt darê, çû nema heta êvarê (Xalid Hesên, 1985: 79).

Sibat naçît bê gîya, adar naçît bê gulî (Hecî Cefer, 1986: 68).

1.7. Di Gotinên Mezinan Da Kêş, Serwa û Rîtim

1.7.1. Kêş:

Di hinek gotinên mezinan da, mirov dişet cure kêşekê destnîşan bike. Ew jî li gorî rêzkirina gotinê bo du nîve dêran e. Bo kêşdarîyê me pişt bestin li ser serwayê kirîye. Jiber ku di hinek gotinên mezinan da serwa heye û ew serwaye parçeyên wê gotinê jihev cuda dike (Ansîklopedîya Parêzgeha Duhokê, 2017: 226). Wekî eşkere dibe gotinên mezinan ji layê xelkekê xwerû ve hatîne gotin. Ewe jî buye egerê sadeyî ya kêşê. Herwisan ew sadeyî ye di gotinên mezinan da, egerekê serekîye ku ew gotin tîn jiberkirin û parastin ji navçunê.

Gelek cureyên kêşan di gotinên mezinan da hatîne bikaranîn. Em dê bizavan bikin hinek ji wan kêşan eşkere bikin.

Cureyên Kêşan

1. Kêşa (5) birgeyî birîtma (2+3)

Ew xem, bo ew dem. (Hecî Cefer, 1986: 17)

ew/ xem (2 birgeyî)

bo/ ew/ dem (3 birgeyî)

2. Kêşa (6) birgeyî birîtma (3+3)

Îlonê, tam donê (Hecî Cefer, 1986: 16).

Î/ lo/ nê (3 birgeyî)

Tam/ do/ nê (3 birgeyî)

Kêşa (6) birgeyî ya du rêzî

Em çûne qîvara

Em hatîn êvara (Hecî Cefer, 1986: 15).

Em / çû / ne / qî / va / ra (6 birgeyî)

Em / ha / tîn / ê / va / ra (6 birgeyî)

Kêşa 6 birgeyî ya yek rêzî

Jin û mêr tevir û bêr (Celalî, Mela Êsiv 2014: 108).

Jin / û / mêr/ tev / rû / bêr (6 birgeyî)

3. Kêşa (7) birgeyî birîtma (3+4)

Bihare, gurgî hare (Hecî cefer, 1986: 24).

Bi/ ha/ re (3 birgeyî)

Gur/ gî/ ha / re (4 birgeyî)

4. Kêşa (7) birgeyî birîtma (7) ya du rêzî

Ewê hate himbankê

Ew dê hête qazankê (Hecî Cefer, 1986: 13).

E / wê / ha / te / him / ban / kê (7 birgeyî)

Ew / dê / hê / te/ qa / zan / kê (7 birgeyî)

5. Kêşa (8) birgeyî birîtma (4+4)

Ava xastî, naçit hestî (Hecî Cefer, 1986: 11).

A / va / xas / tî / na / çit / hes / tî (8 birgeyî)

Kêşa 8 birgeyî ya yek rêzî

Ji hêlînê, çu kulînê (Dêrşewî, Mela Mehmûd, 1980: 138).

Ji / hê / lî / nê / çu / ku / lî / nê (8 birgeyî)

6. Kêşa (9) birgeyî birîtma (4+5)

Ziman sore, hereket kore (Mehmet, Öncü, 2009: 699)

Zi / man/ su/ re (4 birgeyî)

He/ re / ket/ ku / re (5 birgeyî)

7. Kêşa (10) birgeyî birîtma (5+5)

Ji kerê weye, maker hurî ye (Dêrşewî, Mela Mehmûd, 1980: 137).

Ji / ke / rê / we / ye (5 birgeyî)

ma / ker / hu / rî / ye (5 birgeyî)

Mala mêrane, kanya zêrane (Celalî, Mela Ûsiv 2014: 156).

Ma / la / mê / ra/ ne (5 birgeyî)

Kan / ya / zê / ra / ne (5 birgeyî)

1.7.2. Serwa:

Serwa giringîyek zor heye di hozanê da piştî layenê kêşê di pîla duyemîn da tê. Herwisan li dev hinek zanayên din giringîya serwayê pirtire di hozanê da ji kêşê. Evca ew hozan ya kêşdar bit yan jî ya bêkêş bit. Di hozanê da hozanvan dişet dest li kêşê berde. Lêbelê neşet dest ji serwayê berde. Jiber ku serwa wekî muzîka ji dervayê hozanêye û gîyaneka din dide hozanê .

Zimanas Meruf Xeznedar, bi vî rengî serwayê pênase dike. Serwa ewe ku dêrên hozanê bi peyvekê bi dumahîk bên, eger ew peyv ji layê kêş û awazê ve wekî yek nebin tinê du pîtên dumahîka wan wekî yek bin dê bêjinê serwa (Xankî, Kuvan, 2011: 150). Her çende serwa jibo hozana klasîka Kurdî tê gotin. Lêbelê em di karin bo gotinên mezinan jî bikarbînin.

Dê hewlbidîn di hinek mînakên da dengên serwa û pêş serwa û paş serwa eşkere bikin.

A. Serwaya her sê dengên serwayê .

Ê ku çu helebê hat, ê ku çu helawê nehat (Öncü, Mehemet, 2009: 223).

Peyvên serwayê	dengê paş serwa	dengê serwa	dengê pêş serwa
Hat – nehat	t	a	h

B. Serwaya dengê serwa û paş serwa.

Garan hat zevyê, kabanî bezî teşyê (Hecî Cefer, 1986: 90).

Peyva serwa	dengê paş serwa	dengê serwa
Zevyê – teşyê	ê	y

C. Serwaya dengê serwa û pêş serwa.

Lawê derewîn, dixwut carek firavîn (Dêrşewî, Mela Mehmûd, 1980: 250).

Peyva serwa	dengê serwa	dengê pêş serwa
Derewîn - firavîn	n	î

D. Serwaya bitenê dengê serwayê.

Yê neha bidet, dê deha sitînît (Hecî Cefer, 1986: 127).

Peyva serwa	dengê serwa
Bidet – sitînît	t

1.7.3. Rîtim:

Rîtim pêktê ji du curan rîtima derekî û rîtima navekî. Em dê behs li rîtma derekî kîn ku ew jî dibe binyatê sade û lêkday .

a. Binyatê Sade: Ku pêktê ji yekeyeka rîtmî û bi dubarebona wê rîtim dirust dibe .

1. Binyatê (4+4)

Kî wefaye / ew biraye (Dêrşewî, Mela Mehmûd, 1980: 243) .

2. Binyatê (3+3+3+3)

Duhin li / çirê ke / û seyra / melê ke (Dêrşewî, Mela Mehmûd, 1980: 118).

3. Binyatê (4+4)

Mijê çîya mişt / befir runişit (Hecî Cefer, 1986: 100).

Kesê mino / destê mino (Dêrşewî, Mela Mehmûd, 1980: 233).

4. Binyatê (4+4+4+4)

Hewa sare / cilik stare / hewa germe / cilik şerme (Hecî Cefer, 1986: 120).

5. Binyatê (5+5)

Warê bêxudan / çi lê şîn nabît (Hecî Cefer, 1986: 125).

b. Binyatê Lêkdayî: Mebest pê ewe ku ji du yekeyên rîtmî yan pirtir yê cîyawaz pêktê.

1. Binyatê (4+6)

Yê mêr kuj bît / tiblêt wî divajîne (Hecî Cefer, 1986: 126).

2. Binyatê (4+7)

Min kir te kir / erzê binavê xwe kir (Celalî, Mela Êsiv 2014: 154).

3. Binyatê (8+7)

Ga dimirit çerim dimînit / mêr dimirit nav dimînit (Dêrşewî, Mela Mehmûd, 1980: 232).

4. Binyatê (6+8)

Zikê birçî têr dibin / Lêbelê çavê birçî têr nabin (Dêrşewî, Mela Mehmûd, 1980: 130).

1.8. Di Hozanê Da Cihgirtina Gotinên Mezinan

Eger em sehbikin bikaranîna gotinên mezinan di hozanê da, dê bînin ku vedigere jibo demekê gelek dûr û dirêje. Çûyîna gotinên mezinan bo nav hozanê, ne bi tenê di edebê Kurdî da dikeve berçav belkî di edebê gelên din da jî ev çende heye. Em dikarin bibêjin gelek ji hozanvanên Kurd îlhama hozana xwe ji gotinek mezinan wergirtine, yan jî ramana gotinekê dinav hozana xwe da helandîye û kirîye hozan. Zêdetir ji wan hozanvanên gotinên mezinan di hozanên xwe da bikaranîne, naveroka gotinê kirine dinav hozana xwe da. Yanî bitenê naverok kirîye dinav hozana xwe da û li gorî qalibê hozana xwe ya nivîsandîye.

Destpêka çuyîna gotinên mezinan bo nav hozanê vedigere jibo edebê ‘Erebî û li serdema Cahilî. Hozanvanê serdema Cahilî ‘‘Tirfe Kurê Ebdî’’ di mi’eleqeyek² xwe da ya bi nav û deng gotina mezinan a ‘‘pêy nawê xot be hewal wergirtinewe mandûbikeyit, çunkî her pêt radegeyên rê’’. Tirfe Kurê Ebdî bi vî curî bikaranîye.

‘‘Setobdî leke al ayamu ma kuntu cahîlen

Weyetîke bîlexbarî men lem tuzewîdu’’ (Şareza, Kerîm, 1976: 4).

Di edebê Farsî jî da hozanvanê mezin Xeyamî, gotina ‘‘dengê daholê ji durve xweşe’’ bi vî rengî bikaranîye:

² Mi’eleq: Di serdema cahilî da Şi’rên hatine bijarte di diwarê Ke’beyê da hatin daluqandin, ra tèn gotin.

“Men mîgoyem kî abê angûr xweş est

În neqîd bigir dest ez an nîyse bidar

Ka awazê dehol şenîden ez dûr xweş est” (Şareza, Kerîm, 1976: 5). Yanî dengê diholê ji durve xweşe (Hecî Cefer, 1986: 48).

Herwisan hozanvanê mezinê Kurd “Ehmedê Xanî” jî hozanên xwe bêpar nekirine ji bikaranîna folklorê û gotinên mezinan.

Mînak:

Dema li beytên dawîya Mem û Zînê li gel pênivîsê xwe diaxive û dibêje:

Ey xame, te jî gelek dirêj kir

Ev name bese, te pir qirêj kir (Şemrexî, Huseyn, 2009: 220). Vê derê bi ramana hindê bikaranîye ku eger axaftin zêde bit ya bêtêmasî nabit wekî vê gotinê “yê gelek biaxivît, wê xelet bît” (Hecî Cefer, 1986: 126).

Her çendî kelimî şubhê dur bît.

Bêqedir dibît dema ku pir bît (Şemrexî, Huseyn, 2009: 220). Yanî em dikarin bêjin gotina “eger axaftin zîv bit neaxaftin zêr e” bi vê ramanê bikaranîye. Herwisan di gelek hozanên din da jî “Ehmedê Xanî” folklor di hozanên xwe da bikaranîye .

Herwisan hozanvanê Kurd “Ehmedê Nalbend” jî gotinên mezinan û folklor li gel parçe hozanên xwe têkelkirine.

Mînak :

“Tu rovîyekê mîletî nede bi şêrê bîyanî

Hema tu bin rê ketî dê li te xut guştê ranî

Dermanê vî îletî lazim tu bi xwe bizanî”

Li vêrê Nalbendî mifa ji vê gotinê wergirtîye “Mirovê bîyanî hizar sala bidê guştê ranî, duymahîyê dê li ser key peşêmanî” (Nizar Mihemed, 1984: 27).

Dîsan hozanvan “Ebdulrehman Mizîrî” di gelek hozanên xwe da, bingehîya hozanên xwe ji folklorê wergirtîne.

Mînak :

Ew kanîya te av jê vexwarî, darûbera têwerneke. Di parçe hozanek xwe da bikaranîye .

Ew landîka nav daye min

Ew dara sîtav daye min

Ew kanîya av daye min

Darûbera

Têwer nekem

Têwer nekem (Ridênî, Wesfî, 1983: 19).

Hozanvan Pîremêrdî li ser gotina “Eqil be gewreyî û piçûkî nîye” bi rengê gelek ciwan di hozana xwe da bikaranîye. Dema dibêje:

Eqil be gewre û piçûkî nîye

Karî dîwanî berbûkî nîye (Şareza, Kerîm, 60, 23).

Hozanvanê mezin Pîremêrdî pirtûkek hozanê bi çîwarîne, bi naveroka gotinên mezinan nivîsîne. Gelek hozanvanên din jî folklor û bitaybetî gotinên mezinan di hozanên xwe da bikaranîne bi rengê rastexwe gotin ya kirîye di nav hozana xwe da yan jî li gel hozana xwe têkelkirîye yan ramana gotinê bi hozankî di nav hozana xwe da bikaranîye.

1.9. Di Çendîn Welatan Da Yek Gotin

Aşkereye di nav çanda gelan da gelek hevpişkî hene. Êk ji wan tiştên hevpişk di nav gelek civakan da hene gotinên mezinanin. Jiber ku hemû gel û civak yên di

rewşên nexweş û aloz da derbazbuyin. Evan rewşa karîgerîya xwe li ser takên civakî kirîye ta berhemekê civakî bîne hebûnê.

Mînak:

Li ser karî Kurd dibêjin “karê evro nehêle bo sibehî” her wekî vê gotinê di zimanê ‘Erebî jî da yê hey dema dibêjin “la te’cel e’mel al-yewm îla al-xede” (Îdrîs Ebdullah, 2014: 42). Elman jî dibêjin “tîştê tu evro dikarî bikî, nehêle bo subehî” (Hecî Cefer, 1999: 9). Li def her gelekê hebe ya baştîre her karekê li ser milê mirov bit, teqez zûtir bi dumahî bînit baştîre. Eger em li van gotinan binêrin bitenê rûxsar hatîye guherandin, naverok her wekî xwe ye. Li vêrê em neşên bêjin jêderê vê gotinê ji layê Kurdan yan ‘Ereban yan jî Elmanan ve hatîye gotin. Gelên dî ya wergêraye ser zimanê xwe. Jiber ku şîreta dî vê gotinê da hemû gel bikartînin. Renge ev gotine li dev gelek gelên dî jî bête bikaranîn. Jiber hindê mirov neşetê vê gotinê bi zimanekê taybet ve girêbide .

Gelek caran êk gotin pirtir ji welatekê heye, sereray hindê ku ew gotin ji layê rûxsarî ve ne mîna hevîn û ramana peyvên wê jî ne mîna hevîn. Lêbelê eger em danîne beramberî yek dê bo mirov eşkere bibe ku ev gotine beramberî gotina wî zimanî ye.

Mînak:

Kurd dibêjin “gul bê sitrî nabe” beramberî vê gotinê di Îngîlîzî da bi vî rengîye “who loves the rose should put up with it is thornis”. Ramana wê bi Kurdî jî “yê ji gulê hezbike divê tevî sitiryê wê bistînin” (Mazî, Çîya, 2006: 43). Raste ev herdû gotin peyvên wan nemîna hevîn. Lêbelê bêdudilî her kesê van gotina bibîne dizane ku beramberî yekin û yek watayê didin. Wateya wê jî ewe eger mirov karekê bike divê hizra nexweşiyên wî karî jî bike. Sereray ciwanî yan başî yan mifayê wî karî, divê her hizra nexweşî yan ji destdan û hwd. bike.

Herwisan gotina Kurdî ya dibêje “axaftina şev û roja nabit êk” beramberî wê di zimanê ‘Erebî da dibêje “kelam al-leyl yemhu al-nihar” (al- Cizrawî, Ehmed, 2008: 36). Yanî axaftina şevê ya êvara nahêle. Raman ji herdû gotinan ewe ku axaftin û sozên li şevê tene dan li rojê bicî nayên yan jî nabine êk axaftin.

Dîsan gotina Kurdî a “bi zimanê xweş mar ji kunê derdikevît” wekî vê gotinê bi ‘Erebî jî ya hey ‘lîsan al-teyîb îtle’ al-hey mîn al-zaxur” (Al-Cizrawî, Ehmed, 2008: 50). Beramberî wê bi Tirkî jî yê hey “Tatlı dil yılanı deliğinden çıkarır” (Mazî, Çîya, 2006: 24) Yanî “zimanê şîrîn marî ji kunê dînit der”. Ev gotine di van her sê zimanên hevsuyên hev da hene. Gelek bi zehmete mirov binyatê vê gotinê bo zimanekê bivegerîn. Jiber ku vê gotinê cihê xwe di nav her sê zimanan da kirîye. Gotinên bi vî rengî gelek zorin, di hemû zimanan da yên heyin. Ne bitenê di zimanên hevsuyên (cîranên) hev da, belkî di hemû zimanan da yên heyin .

Dîsan gotina “bi gulekê nabe bihar” di folklorê Îngîlîzî da cihê xwe girtîye bi vî rengî “One swallow dose not make a summer”. Yanî “hecheckek nake havîn” di Tirke jî da tê bikaranîn “Bir çiçekle yaz olmaz” yanî bi gulekê havîn nayê (Mazî, Çîya, 2006: 23-43). Di zimanê ‘Erebî jî da bi vî şiklî bikartê “len yehulu al-rebî’ bîwerde wahîde” yanî bihar bi gulekê bitenê nayê (Îzedîn Mistefa, 2011: 53). Raste peyvên van gotina ne wekî hevîn. Jiber ku zimanên wan û werzên wana jêk cudane. Bu mînak li cihekê wekî Îngîlterê û Tirkîyê dibe havîna wan wekî biharê be. Lewma şûna biharê peyva havînê hatîye bikaranîn. Merem ji vê gotinê ewe eger kesekî karek ji mirov re got, nabe yekser mirov jê bawer bike.

Dîsan gotina “hel destim gurg demixwa, da denîşm aw demba” di berhemê “Kelîle û Dimne” ya feylesofê Hîndî Baydebayî da tê dîtin (Deşteki, Umer Şêxela, 1972: 5). Ev gotine di zimanê Kurdî jî da bi hemû zaravan ve tê dîtin. Eger em ji layê coxrafî ve binêrin sinorê van herdu gelan, dê dûratîyek bêsinor binin. Renge em şaş bin heke bêjin ev gotine ji zimanê Hîndî da hatîye di nav zimanê Kurdî da. Jiber ku di demên borî da rêyên geştê gelek bi zor û zehmet bûn. Dîsan her ramana vê gotinê di Kurmancî da jî heye. Destê bin berdaye! Bikêşî wê bi meriqit nekêşî wê bi selxit (Dêrşewî, Mela Mehmûd, 1980: 104).

Mînak:

Kurd dibêjin “cer bi rêya avê ve dişkê”. Frensî dibêjin “her car cerik biçîte avê, dumahîya wî şikandine”. Îngîlîz dibêjin “her car cerk bi saxî ji bîrê nazvirîteve” (Hecî Cefer, 2013: 264). Ev gotine bi yek naverokê di sê zimanên cuda da tê dîtin. Herwisian renge ew gelên ev gotine di nav da ji layê coxrafî ve gelek jêk

dûr bin. Eve jibo kelturê miletan dizivire. Jiber ku hemû gel di wê rewşê da borîne ku dumahîya cerkê avê her şikandine li ser kanîyê yan jî bi rîya kanîyê ve.

Ev gotina mezinan di zimanên Kurdî û 'Erebî da ya hey, dema dibêje "dost û dijmin le tengawî da beder dekewin" beramberî wê bi zimanê 'Erebî dibêje "eînde al-şedaîd torefo al-exwan" (Şareza, Kerîm, 1988, 145). Yanî di nexweşyan da bira "bi ramana heval yan dost hatîye" eşkere dibin. Di gotinên mezinan da mirov neşet bibêje ev gotine li ser awaza vî zimanî têt, resenbuna wê gotinê jibo wî zimanî dizivire. Jiber ku hinek kawdanên heyîn hemû civak yên di nav da jîyayin. Bu mînak Eger em behsê karkirinê bikin dê bînin hemû civakan piştevanîya lê kirî, fêca jiber hindê em dibêjin destînişankirina resenayetîya binyatê gotinê dê gelek bi zehmet be. Her çende di hinek gotinan da mirov dişet binyatê wê gotinê destînişan bike. Bu mînak eger em sehbikin wan gotinan yên navê hinek gîyaneweran têda heye, dibe mirov bizanibe ku ew gotin ser bi gelekê destînişankirîye.

Mînak:

Eger gotinek navê meymun têda be. Wê ji me re eşkere bibe ku ev gotin koka wê ser bi wan zimanan ve ye yên meymun di nav daristanên wan da heye. Her civakekê li gorî pêdivîya xwe gotin bo xwe berhem anîne .

1.10. Di Yek Gotinê Da Wekhevî:

Di zimanê Kurdî da çendîn zaravên cuda cuda hene, her zaravek ji van zaravan xwudan ferhenga taybet bixwe ye. Gotinên mezinan jî êke ji wan babetane yên ku taybetmendîya xwe ya cuda ji zaravên din hene. Her gotinek bi zaravekê rûxsarekê din heye. Mifayê vê çendê jî ewe ku ferhenga zimanê Kurdî ya berfireh kirîye.

Mînak:

Di kirmancî da ev gotine bi vî şiklî bikartê "mêrê fedyok bi kundekî, jina fedyok bi gundekî" (Mazî, Çîya, 2006: 20). Her ev gotine bi vî rengî jî hatîye gotin

“jina şermîn bi şarekê, mêrê şermîn bikarekî” (Hecî Cefer, 1986: 62). Ev gotine yek ramanê digehînin ku ew jî şermînî bo jinê şanzîye û jibo zelumê kêmasîye. Ev gotinên henê raste bi yek ramanin û lêbelê ne yek gotinin. Jiber ku her yek gotineke, eve jibo dewlemendikirina ferhenga gotinên mezinan giringîya xwe heye. Gelek gotin di zaravên Kurdî da yên heyîn wekî yek, mirov dişê bibêje rûxsar û peyv û naverok wekî yekin.

Mînak:

Eger em sehbikin gotina “bi destê xwe agir berda mala xwe” dê bînî wekî vê gotinê di zaraveyê Soranî jî da ya hey “bedestî xoy agir berdawete malî xoy” (Rustemî, Ehmed Mihemed, 2012: 20). Ji van herdû gotinan eşkere dibe, dibe bitenê wergêran ya hatîye kirin bo van gotina. Herwisan gotina “aqir tacî sere belam Leserî hemû kes nîye” (Reşaş, Hemîd, 2010: 12). Wekî vê gotinê ye “aqil taca zêrîne lêbelê di serê hemû kesa da nîne”. Eger em sehbikin van gotinan dibînin ji layê rûxsar û naverokê ve weku yekin. Dîsan gotina “çi biçînî ewey dedurûyewe” (Reşaş, Hemîd, 2010:64). Di zaraveyê Suranî da tê bikaranîn û wekî wê di kirmancîya jorî jî da tê bikaranîn “çi biçînî tê wî bibînî” wekî vê gotinê ye.

Gotinên bi vî rengî gelek zorin.

Mînak:

“Ne malê bibewe ser male babê jinê

Ne le hewraz bikêşe tûtunê

Ne kiçê bide kurî bêwejinê” (Ararat Ehmed, 2008: 12). Ev gotine di Kirmancîya naverast da bi vî rengî heye. Evê gotinê sê şîretên tê dane. Li def Kurdan kêmasîye, eger zelum mala xwe bibit nêzîkî mala xezîrê xwe. Herwisan li hevrazan nabit tûtunê bikêşin. Jiber ku rêk bixwe hevraze bêhna mirov teng dike. Herwisan dibêje kiça xwe nede kurê bîyejinê. Jiber ku bi nazdarî yê perwedekirî. Nêzîkî vê rûxsar û naverokê di kirmancîya xwarê jî da heye bi vî rengî.

Mînak:

Sê bê'aqil hene li dinê

Êk yê biçt peya rêkê bitinê

Dû yê li evrazya bikêşt tîtnê

Sê yê malê barket biçîte mal baba jinê (Hecî Cefer, 1986: 69). Yan jî gotina dibêje “berxê nêr her jibo kêrê ye” bi sê derbirînên di jî hatîye gotin “berxê nêr day bo kêrê” , “berxê nêr, seba kêr” yan “berxê nêr bo ser birîne” (Hecî Cefer, 1989: 33). Ramana vê gotinê ewe ku berxê nêr bo serjêkirinê ye. Her deverêkê li gorî şêwezarê xwe ev gotina gotîye. Ewe jî bûye egerê dewlemendikirina ferhenga gotinên mezinan.

Di Kirmançîya jorîn da gotineka hey dibêje “yê biçit masîyan dê quna wî şil bit”. Her wekî vê gotinê di kirmançîya naverast jî da heye dema dibêje “ewey masî bigrêt qingî ter ebêt” (Sacîd Aware, 1989: 114). Ev gotine wekî yekin di rûxsar û naverokê da. Ev gotine li navçeya Şemzînan a giredayî bajara Hekaryê, tê bikaranîn “Heke nezan bît û guhdar bît çarek diçîtê, ema heke nezan bît û neguhdar bît çî care naçinê” ku mirov diçêt bibêje hema her ev gotine di kirmançîya naverast da jî heye. Bi vî rengî tê bikaranîn “nezanê neguhdar derdê wî ye derdek bêderman” (Dêrşewî, Mela Mehmûd, 1980: 280). Herwisan eger kesek dikarê xwe da yê serkeftî nebit û guhdarîya kesê nekit dibêjinê “nezanê neguhdare”. Bitenê rûxsar di vê gotinê da yê hatîye guherandin. Raman ji van gotinan ewe ku nezanê guhdarîya mirov bike baştire û çêtire ji wî yê nezan bit û guhdarîya mirov jî neke.

1.11. Di Yek Gotinê Da Dijayetî

Dijayetî di hemû zimanan da heye ku yek gotin dijî gotinek din ya wî zimanî be. Egerê vê çendê jî ewe ku ew kesê ew gotine gotî wî ew gotin li gorî rewşa xwe ya wî demê gotîye. Eger em binêrin li wê gotina dibêje “Mirov rojekê dibe û yekê jî dimirit” yan “mirina li nav şerî çêtire, ji mirina li ber derî” (Hecî Cefer, 1986: 99). Dê bînî ev herdû gotine yên mêranîyê ne. Behsa hindê dikin ku ew kesên ev gotine gotîn çavnetirs bûne. Di vê gotinê da bo me eşkere kirîye ku eger mirov çend bitirsit jî dê her rojekê bimirit. Vêca bila mirina bi mêranî bit baştire ji mirina tirsnoka, mirin

êke bo her kesekî. Gotinek dî bi tamamî ramana wê dijî ramana van gotinaye. “Qun fireh be , da ‘emr dirêj bî” (Hecî Cefer, 2013: 266). Yanî bila mirov trisonek bit da têt jî bit. Ya eşkere dibe zelumê tirsonek dê dûrî şer û astengan bit, yanî dê pirtir parastî bit. Ev herdû gotine dijî yekin. Li vêrê pêdivîye ku ev herdû gotin bêne nivîsîn. Jiber ku dê bite kerestekê baş bo vekolerên folklorê. Dîsan wek berî niha me amajepêkirî ku her gotinekê çîroka xwe heye, lewma nivîsîna van gotinan dê pirtir rewş û kawdanên wê gotinê bo me eşkere bikin .

Eger em sehbikin van gotinên mezinan dê bînin dijberîyek run û aşkera dê bo me eşkere bibe. “heke dijmin bibîte gul bêhin nekê” (Hecî Cefer, 1986, 112). Li gel vê gotinê “destê nekarî gez bikî, têt maçî bikî” (Dêrşewî, Mela Mehmûd, 1980: 11). Ev herdu gotine dijî yekin di ramanê da. Her gotinek ji vana sûd û mifayên xwe yên heyîn nabit çî gotin ji vana bêne paşgoh avêtin. Li vêrê nabit mirov gotinek ji vana wergirt û biparêzît û ya dî jî bi puç û bê mifa bizane. Jiber ku her gotinek pirtûkeke bo vekolerên folklorê.

1.12. Di Gotinên Mezinan Da Vegêr

Gotinên mezinan berhemê civakîne û civak jî ji takekesan pêktê. Her gotinek mezinan ji layê kesekê ve hatîye gotin, piştî hîngê ji layê civakî ve hatîye pesendkirin û di nav hemû civakê da belavbûne û bûne beşek ji folklorê wî gelî. Hinek gotinên mezinan ji layê kesên jîr, nujdaran (hekîman), siwarçakan, xweşmêran, jinan, keçan û gencan hwd. hatîne gotin. Lêbelê eger em ji layekê dî ve li gotinên mezinan binêrn, renga mirov bişêt destnîşan bike ka ew gotin ji layê kîjan texa civakî ve hatîye gotin gencî yan pîrî ve yan hwd.

Mînak:

“Kabanîyê çav kilê, tijî mala te kersilê” (Hecî Cefer, 1986: 87). Eger em sehbikin ramana vê gotinê, dê hînbîn di nihe jî da bo gelek kabanîya têtê gotinê. Jiber ku bes giringîyê bixemil û ciwanîya xwe didin, paqijî ya mala xwe ya jibîrkirî. Eger em li vê gotinê temaşekin têt dîtin ku ev gotin yan ji layê regezê nêr ve yê hatîye gotin

yan jî ji layê jinek malkerve yê hatîye gotin. Di piranîya gotinan da zehmete mirov destînîşan bike ka gotin ji layê kê ve hatîye gotinê.

Em dê hinek ji wan gotinan bînin û dê eşkere bikin ka ev gotine ji layê kîjan taxa civakî ve hatine gotin. Gelek ji gotinên zelaman gotîn li ser jinan wek curekê şikandinê yê têda bo jinan. Herwisan yên jinan gotîn li ser jinan wek curekê pesna têda berçav dikeve. Eger em sehbikin gotinên mezinan yên xweşmêran gotîn dê bîni bawerî bi xwe bun yê têda. Di babetê vegêrê gotinên mezinan da me piştbestina xwe danîye ser ramanê. Vergêrê Gotinan bi vî şiklî tên honandin.

1. Gotinên Zelaman: Ev gotinin ku ji devê zelaman hatine girtinê. Ji wan gotinan da ji mînak pirin.

Mînak:

Ew mal xirab bibit ewa jin tê da bibit malxiwê (Dêrşewî, Mela Mehmûd, 1980: 11). Ji vê gotinê eşkere dibe ku ev gotine ji layê zelaman ve hatîye gotinê da ku xelkê pal bidin hindê ku serûkanîya malî nekeve destê jinan. Ev gotine wî demî ya hatîye gotinê demê jin buye malxiwêya malê. Ku hemû karûbar û pisyarkirin ji jinê hatîne kirin. Renge vegêrê vê gotinê ev gotin ya gotî da ku xelkî hişyar bike û bibêje wana ew mala jin bibe malxiwê ew mal dê xirab bit. Yanî xwe ji vê çendê dûr bikin.

Mînak:

Garan hat zevîyê, kabanî bezî teşîyê (Hecî Cefer, 1986: 90). Ev gotine behsê hindê dike ku gelek ji jinan çavê wan yê li karê wana, ne li karê pêdivîye. Ji vê gotinê eşkere dibe, ku hemû deman guhê jinan bes yê li karê wana. Dîzika kevanî bişkênit bêdenge (Dêrşewî, Mela Mehmûd, 1980: 121). Ev gotine wî demî ji layê zelaman ve hatîye gotin. Demê jin karekê bike û nedirêda hîngê dê jin xwe liser bêdenge bike. Ev gotine tê gotinê demê kabanî tişteke xelet bike û li xwe nede eşkerekirin, dê vê gotinê bibêje “Guhê xwe bide mezina, bila xelet bo te bêjin” (Hecî Cefer, 1986: 91). Mebest ji vê gotinê ewe her karekê genc hizr bike ku dê û bav yan mezinê wî xelet bo bibêje, li gorî hizra gencî. Lêbelê di rastî da ew bav yan mam yan xal yan bapîr pirtir başî û qencîya zarokên xwe dizanin. Eger li gorî hizra mirov nebaş be jî her başîya xwe yê hey jiber ku wana ji me pirtir serbor hene.

Mînak:

Malxwêtî ket dest jinê da kehrik birî û berxik hişt li bin livayê da (Dêrşewî, Mela Mehmûd, 1980: 270). Ev gotine behsê serederîya jinê ya nedurisit ligel birêvebirna malê dike. Ku gelek caran biryarên jinê bo rêvebirina malê nedirust û biryarên şaşin .

2. Gotinên Xweşmêran: Ji wan gotinan da ji mînak pirin.

Mînak:

Goştê mêra ne bi kêşan û pîvane (Hecî Cefer, 1986: 89). Yanî mêranî û zelumî ne bi serûsîma ye. Liber sîbera şêrî be bila şêr te bixut (Hecî Cefer, 1986: 93). Ev gotine ji layê zelaman ve hatîye gotinê ku zelaman handide bila serederîya me ligel mêran be û bila zîyan bigehe mirov. Mêr kuştin bisanahîye lêbelê tolvekirin bi zehmete (Hecî Cefer, 1986: 96). Yanî karê dumahîkê yê mêrane ku ew jî tolvekirine. Berhemê hemû kar û kiryaran li dumahîyê eşkere dibe. Ku zelum û xweşmêr li dumahîya her kar û kiryarekê eşkere dibe. Teyr bi çenga difirin û mêr bi mêra dixurin (Dêrşewî, Mela Mehmûd, 1980: 217). Ji vê gotinê eşkere dibe ku ji layê xweşmêran ve yê hatîye gotinê.

3. Gotinên Jinan:

Di van gotinan da eşkere dibe ku jinan ev gotin gotîne. Gotinên jinan gotîn hindek ji wana pesnên jinanin û hinekên din jî wekî danûstandinê ne di navbera jin, keç û xesîyan da.

Mînak:

Heçî bivêt mala xwe bi destê xwe xirab bike bila du jina bînit (Dêrşewî, Mela Mehmûd, 1980: 87). Ev gotine jinan yê gotî, jiber ku piranîya jinan nelgel hindê ne zelum ji jinekê pirtir bînit.

Mînak:

Ez çum çîyayê dêran, min xwelî avêt bi bêran, gelek jin hene çêtirin ji mêran (Öncü, Mehmet, 2009: 210). Ev gotine jinan yê gotî wek bersiv bo zelaman ku

dibêjin jin kêmtire ji zelumî. Lêbelê vê gotinê bo me eşkere kirîye ku jinên heyîn çêtir û baştir ji zelaman di kar û kiryarên rojane da. Dayê ewa tu dibêjî min li der daye (Dêrşewî, Mela Mehmûd, 1980: 109). Ev gotine jî jinan gotîye wekî dîyalogê ye dinavbera keç û dayîkê anko demê dayîk şîretan li keça xwe bike. Lêbelê keç bersiva dêya xwe dide û dibêje ew karê tu şîretan li ser wî babetî li min dikî, minê ji destday. Şêr şêre çi jine çi mêre (Celalî, Mela Êsiv 2014: 189). Di vê gotinê da jinê hewildaye bihayê xwe weke yê zelaman lê bike. Me bûk anî bi lezûbez, me lêdan rez û pez, sivka malê her bîm ez (Dêrşewî, Mela Mehmûd, 1980: 276). Ev gotine jinan gotîye. Jinekê ev gotine gotîye ku bûk bo xwe anîye. Gelek pare lê mezaxtîne heta anîye. Lêbelê her karê malê xema xesîyê ye. Jin qedrê jinan dizanin (Hecî Cefer, 1986: 63). Yanî zelum rêz û bihayê jinan nizanin yan jî li pêşçav nagirin. Heke guh nede jinê, para nakey ber minê (Hecî Cefer, 1986: 123). Ji vê gotinê eşkere dibe ku hemû deman jin pirtir û baştir aborîyê di parên malê da dikin. Yanî ev gotin tê eşkere kirin ku hemû deman jin para bo malê kom dikin .

4. Gotinên Hekîman:

Di vî corey da ji ramana gotinan xweya dibe ku ev gotine yê jilayê hekîman ve hatîne gotin. Mînakên vî corî pirin.

Mînak:

Zadê kelî hêj germ, xirabe biken devî (Hecî Cefer, 1986: 60). Eger em sehbikin ramana vê gotinê dêbînî ku şîretek gelek bimifa bo saxlemîyê ya têda. Sipî bona pirça serî, paş deme, pêş xeme (Hecî Cefer, 1986: 68). Vê gotinê eşkere kirîye egerê spîbuna pirça mirov çîye. Gelek xwarî xulî ser bîye, pîçek xwarî serferaz bîye (Hecî Cefer, 1986: 88). Ev gotine şîretek gelek bimifa bo me eşkere kirîye ku hemû deman egerên nexweşîyan gelek xwarine. Nan û dew, têşta ji drew, nan û mast têşta rast, nan û şîr ew têşta mîr (Hecî Cefer, 1986: 106). Ev gotin mifayên şîrî li têşta dide eşkere kirin ku şibihandin kirîye bi têşta mîra.

1.13. Îdyom (Idiom)

Di zimanê Kurdî da hinek dibêjin îdyomê; îdyom yan biwêje. Ev her du nave têne bikaranîn. Di zaravê Suranî da di bêjinê qiseyî nesteq.

Di ferhengên Ewropî da dibêjine biwêjan “idiom”, di Tirkî da “deyim” û di ‘Erebî da di bêjinê “tabîr”. Îdyom bi gelek rengan û ji alîyê gelek kesan ve hatiye pênasekirin. Îdyom ewe ku bê ku navê tiştekê bînê dê bi renekê neyekser, derbirîne jê bikî. Îdyom ew derbirîneye ewa watayeka taybet heyî ku cudaye ji watayên wan peyvên di nava wê derbirîne da hatin (Şêrzad Sebrî, 2011: 55).

Kurdnas Ezîz Gerdî bi vî rengî pênasa îdyomê dike: “Ewe peyvek yan komeka peyvan bîne ku wateyeka dirust a xwe hebe her di wê demê da di hevokekê da wateyeka din bide û merema pê wateya dawî be. Dîsan dikare wateya dirust û resena peyvan be” (Gerdî, Ezîz, 1975: 2). Ji pênasa mamoste Ezîz Gerdî bo me dîyar dibe ku îdyom ewe mirov hinek peyvan bikarbîne û armanca mirov ne ramana yekê ya wan peyva be. Belkî merema mirov ramana duyemîn be.

Mînak:

Demê kesek bibêje kesekê din “zik reş” merema wî ne ewe ku “zikê wî reşe” belkî merema wî ewe ku “yê hesûde” navê çî başî yan mifa bigehe beramber yan xelkê. Herwisa dibe “zikê wî kesî jî reş be”. Lêbelê ev ne merema wî ye belkî merem pê ewe ku hemû tişt bu xwe bitenê divê. Anko renga merema axaftinkerî ramana yekê be û renga ya duyê jî be. Lêbelê di îdyomê da merema axaftinkerî ramana duyem e.

Mînakek din; dema dibêjin kesekî “ziman dirêj” merem pê ew nîne ku zimanê wî yê dirêje û yê cîyawaze ji yê hemû mirovan. Belkî merem pê ew e ku ew kese yê “pirbêje - gelek daxive- geveze”.

Di ferhenga Webster-1913' anda îdyom bi gelek derbirînan hatiye pênasekirin. Em dê bitenê yek pênasê ji wan dîyarkîn ku dibêje; “îdyom ew derbirîneye ku mirov nikare wateya wê ji wateya peyvên wê werbigire” (Şîlan Umer, 2009: 11). Anko mirov nikare ramana dirust ya îdyomê ji wan peyvan bîne

derê yên ku îdyom jê dirust bûye. Ya herî girîng di îdyomê da wergirtina dewrûberî ye. Jiber ku eger mirov di îdyomê da dewrûberî newergire, çî girîngî jibo îdyomê namîne.

Mînak:

Ew îdyoma dibêje “pişta wî negire” (Hecî Cefer, 2006: 38). Ev jibo wî kesî tê gotin dema kesek li ser karekê yan di dîwanekê da piştgirîya kesekî bike li ser yeke din û ew kes nerazî be dê bibêje “pişta wî negire”. Anko piştgirîya wî neke di axaftinê da yan jî nebe piştevanê wî di karên wî da. Eger em sehbikin wateya peyvên vê îdyomê bê wergirtina dewrûberî çî bihayê xwe nîne. Di îdyomê da dewrûber rolekê girîng dibîne di destnîşankirina wateya îdyomê da ku heta wî radeyî bê dewrûber ramana bi dirustahî ya îdyomê nayê destnîşankirin.

Îdyomên her zimanekê taybetin bi wî zimanî ve, eger axaftinkerekê wî zimanî nebe di ramana wê îdyomê tînegihêje. Ev jî wê çendê jibo me dîyar dike ku merema îdyomê ji wateya wan peyvên wê nayê dîyarkirin.

Îdyom ligor hinek yasayên zimanî yên taybet dirust bûne. Hinek îdyom li gor yasayên rêzimanî yên zimanî dirust bûne û hinekên din jî yasayên rêzimanî derketine (Hûda Ebdulqadir, 2015: 14). Eve wê çendê jibo me dîyar dike ku îdyom jî wekî gelek babetên din yên edebî mîna hozan hwd. pêgîr nîne bi yasayên rêzimanî. Eger wergêran bo îdyoman bête kirin bêguman ya serkeftî nabe. Jiber ku îdyomên çî zimanan wekî yek nînin.

Mînak:

Eger em sehbikin îdyoma dibêje “ser dahol” bi çî rengan ev nayê wergêran bo çî zimanan. Jiber ku taybete bi zimanê Kurdî û zarê kurmancî ve, eger em vê îdyomê wergêrine ser zimanekê din. Bêguman dê merema xwe winda bike. Xwe eger wergêran jibo bêkîrin jî ji alîyê peyvan ve dê wergêranek çewt û şaş be. Lêbelê ya pêdivîye bizanîn eger îdyom hate wergêran bo ser zimanekê din, divê wergêrî şarezayeka baş di kelturên herdu zimanan da hebe, da bikare bi wê şarezaiya xwe îdyomekê beramberî wê îdyoma wî zimanî wergêranê bo dike, bo bibîne, da ku bi dirustahî di merema wê têbigebe.

Wêje yan îdyom ji zarokan heta mezinan bikar tînin. Eger em sehbikin vê îdyomê “detkem betop” (Ararat Ehmed, 2004: 14). Ji alfyê zarokan ve hatîye dirustikirin û bikaranîn. Li demê zarokek topa hevalê xwe dihavêje cihek dûr yan tiştekekê lê bike, dê jêra bibêje eger tû topa min neynî “detkem be top” anko eger tu topa min neynî ez te dikim top. Em sehbikin merema vê îdyomê ku ew kesê xwedanê tepê dê wî bêşîne yan dê tola xwe lê veke yan jî divê ew her wê topê bo bîne yan yeke din a wek wê.

Îdyoman di zimanê Kurdî da cihekê mezin girtîye. Mil bi milê gotinên mezinan di axaftina rojane da têne bikaranîn. Ev jî bi sedemê hindê ye ku bêhtirya wêjeyan ramana wan ya li pişt ramana serekî ya ron û eşkera ye. Gelek ji xelkê bêhtir hez ji hindê dikin ku jibo gehandina peyama xwe peyvên ramanên wan veşartî bikarbînin. Jiber ku bi vê rêkê dê bêhtir bikare merema xwe bigehîne kesê beramber.

Mînak:

Eger xwendekarek dereng bê di pulê da û mamoste jêra bibêje “ma ne hêj zûye tû hatî” yan jî jêra bibêje “bixêr hatî mamoste” wê demê dê ew xwendekar hest pêbike ku mamoste ji wî hêrs buye, lewma wisa pêra axivîye.

1.14. Cudahîyên Gotinên Mezinan û Îdyoman

Di gelek jêderan da gotinên mezinan û wêje wekî yek hatîne temaşekirin. Lêbelê di rastî da gotinên mezinan û wêje ji hev cudane. Ev xalên jêr hinek cudahîne yên îdyom û gotinên mezinan:

1. Deqê gotinê di axaftinê da guhertin bi ser da nayê. Berevajî (bileks) îdyoman ku li gor axaftinkerî dimîne û di şîyan daye guhertina bi ser da bîne (Ararat Ehmed, 2004:13).

Mînak:

Xanyê te tozûbaye. Mirov dikare li gor kesê yekêm û duyêm û yekjimar û pirjimar guhertina bi ser da bike.

-Xanyê min tozûbaye

-Xanyê me tozûbaye

-Xanyê te tozûbaye

-Xanyê we tozûbaye

-Xanyê wan tozûbaye

Herwisa mirov di îdyomê da dikare bo regezê nêr û mê biguhere, bê ku ramana wê têk biçe. Lêbelê di gotinê da mirov nikare van guherîna bike, eger mirov bike jî dê ramana xwe ji dest bide.

Mînak:

Îdyoma “çirayê wî geş bû” yan jî mirov dikare bêje “çirayê wê geş bû” yan jî bêje “çirayê wan geş bû”. Ev îdyome yek ramanin anko Xwedê zarokek da wî yan mirov dikare bêje ku bextek baş bo wî yan wan dirust bû. Ev çende di gotinê da nabe.

Mînak:

Dizê negirtî sultane (Hecî Cefer, 1986: 50). Eger mirov destkarîyê di vê gotinê da bike wê demê dê wateya xwe winda bike.

2. Dibe îdyom peyvek yan du peyv be yan girê yan hevok be. Lêbelê berevajî gotinê ye ku gotin hevokek wata dare.

Mînak:

Îdyoma “serserî” ramana wê ewe ku kesekê bêaqile, kara dike bêhizrkirin, hizra paşerojê nake hwd. Lêbelê gotin hevokeka têr ramane.

Mînak:

Yê nekit zehmet naxut ne'met. Ev gotine li ser karkirinê ye û hevokeke bi ramanek dirust.

3. Merema îdyoman wateya wan ya duyê ye. Lêbelê renge wateya yekê jî merem be. Lêbelê bêhtirîya caran wateya duyem merem e. Ev jî berevajî gotinane ku

merema wan ramana yekê ye. Lêbelê di gotinê da jî gelek caran mirovî merem pê wateya duyem e.

Mînak:

Îdyoma “hêka bê zerike” (Hecî Cefer, 2006: 171). Anko mirovekê bê bawere yan jî mirovekê bê mifaye. Berevajî gotinê ye ku ya watadare.

4. Di gotinê da mirov dikare bêje mezina ya gotî. Lêbelê di îdyomê da mirov nikare bêje mezina ya gotî.

Mînak:

Em dikarin bêjin mezina gotîye “dûr here, zû were”. Lêbelê em nikarin bêjin mezina ya gotî “seyê pê sotîye” (Hecî Cefer, 2006: 8).

5. Binyatê îdyomê ser bi zimanî ve ye û gotinên mezinan ser bi folklorê ve ne.

6. Hinek îdyomên heyîn mirov dikare bibêje dîroka dirust bûna wan bo demekê dûr û dirêj nazivire.

Mînak:

Îdyoma “tozûbaye” bo demê piştî ji navçûna rijêma berî niha ya Îraqê li 2003' anda dizivire, demê xelkî tirumbêlên hikumetê bo xwe tînan, gotinê “tozûba”. Piştî wê demê tuxûbê vê îdyomê berfirehtir lê hat. Bi borîna demî bo wan xanyan jî hate gotinê yên bê desturîya hikumetê têne avakirin. Herwisa jibo wan tiştan jî bikar tê yên jêderê wan nedîyar be, evca çi xanî yan tirumbêl yan her tiştêkê din be. Lêbelê dîroka gotinan dûr û dirêje. Dibe ji ramana hinek gotinan dîroka wan bête zanîn. Lêbelê bi şeweyekê gelek kêr û ew dîrok jî dizivire bo demekê dûr û dirêj.

7. Mirov dikare bibêje di îdyoman da behsa rewşa niha dike. Lêbelê ev berevajî gotinane ku berdewamî ya tê da (Îdrîs Ebdullah, 2014: 22).

Mînak:

Eger mirov pîr bû, aqil lê dîr bû (Hecî Cefer, 1986: 124). Li vir jibo me eşkere dibe ku berdewamî di vê gotinê da heye. Lê belê îdyom newisane. Îdyom bo rewşek demkîye.

Mînak:

Ez dizanim av di ser çira diçit belê nabêjim. Ji vê îdyomê xweya dibe ku ya borîye.



BEŞA DUYEM: DI GOTINÊN MEZINAN DE LAYENÊ PERWERDEKIRINÊ

2.1. TÊGEHÊN PERWERDEKIRINÊ

Perwerdekirin:

Di vî babetî da em ê behsa perwerdê bi rengeke giştî bikin. Herwisan dê behs li perwerdekirinê kin di gotinên mezinan da bi rengeke taybetî. Em dikarin bêjin ku sîstemê perwerdê, bingehyekê bihêze bo hemû komelgehên. Ku eger perwerdekirin li gorî astê pêdivî be, wê ew mîlet bi pêşda here. Karê yekane yê ku pêşdaçuna mîletan ji hev cuda dike sîstema perwerdekirinê ye. Ew gelên sîstema wan ya perwerdekirinê baş be ji gelên din pirtir bi pêşdaçûne ji hemû layenên jîyanê ve. Jibo zanîna her tiştî gereke mirov di destpêkê da wî çemkî bi xwe nas bike, paşê mirov li ser bixebite. Destpêkê em dê behs li pênaseyên perwerdekirinê bikin. Pênasên perwerdekirinê jî wek gelek babetên din yek pênase nîne. Her gel û zanayekê li gorî hîzrên xwe pênasekirine.

Mînak:

Perwerdekirin, kiriyarek civakîye. Civak bi xwe bi wî karî radibe. Mebest pê ewe ku rewşenbîrya xwe bo nîfşên dahatî veguhêze. Bi merema wê yekê ku civakî bo hîzrkirinek dirust, encamdana karên baş hwd. werin perwerdekirin .

Perwerdekirin, perwerde hatîye pênasekirin ku amrazekê civakîye bo dirustkirina takekesan bi curekê peywendîyeka komelayetî û rewşenbîrî di nav da hebe (al-Ezabî, 2011: 29).

Perwerdekirin, herwisa hatîye eşkere kirin ku perwerdekirin kiriyarek komelayetîye ku li gel pêkhatên civakî tevlihev dike. Ew jî reng dide li ser sîmayê ji derveyê komelgehê. Herwisa kar dike li ser geşepêdana kesayetî ya civakî (al-Ezabî, 2011: 29).

Perwerdekirin ewe mirov kesekî yan gelek kesan beramber xwe li ser hinek binema û bingeheyana perwerde bike. Evca ew binemaye baş be yan xerab be yê mirov nîşanî beramber dide. Ji vê yekê ra dibêjin perwerdekirin.

Perwerdekirin pêkhatîye ji çend pêkhateyan. Her pêkhateyekê karê xwe heye. Pêkve girêdan di navbera van pêkhateyan da heye. Ev pêkhatê kar û rolê wan destnîşankirne.

Jan Jak Ruso li ser pewerwerdekirinê dibêje; perwerdekirin erkek tirsname. Li vêrê mebest bi tirsnameyê hestiyarî û tirs ji wê qonaxê ye. Ku zarok li demên berdawam wergirtinê daye di nav xêzanê da. Dayîkek xudan şîyan û kesayetîyek bi xwe bawer û hişyar dê zarokek wekî xwe pêşkêşî civakî bike. Beruvajî jî jinek bawerî bi xwe ne û kêma kesayetî û bêşîyan. Bêguman dê kesekê wekî xwe pêşkêşî civakî û qutabxanê û xwendîgehê bike (Suzan Taha Resul, 2007: 66) .

Perwerdekirin pêdivîyek girîngîya jîyana her kesekîye. Bê perwerdekirin jîyanê çî bihayê xwe namîne .

Ji van pênasayan jibo me eşkere dibe ku perwerdekirin di hemû pênasan da bi civakî ve hatîye girêdan. Yanî perwerdekirin kiriyarek bi komîye ku hemû civak pê radibin. Perwerdekirin hêzeke serekeye di pêşkeftina hemû gelan da. Eger perwerdekirin baş be, hingê ew gel wê di hemû biwarên jîyanê da mîna biwarên aborî, civakî, runşinbîrî hwd. bi pêşdaherin. Karên perwerdeyî, girîngîyek berpirsyarane û rewîştîne ku di çarçoveyekê hestiyar, pêgîr û di xweşa mirov da ye. Ku bo avakirin û perwerdekirina nîşkekê ye jibo dahatî (al-Bidirî, 2004: 5). Ji vê çendê bo me eşkere dibe ku karê perwerdekirinê gelek girînge. Gereke bi hestkirin bi berpirsyarîyê were encamdayin. Ev kare kiriyarek hestiyare û dibe ew kare li xweşa mirov here. Ku karê perwerdê gereke jibo avakirina civakek herî baş û zexim be.

Gelek cureyên perwerdekirinê hene. Takekes heta dibe kesekê xudan perwerde baş û zexim. Gereke ji hemû cureyên perwerdekirinê sîd û mifa bibîne. Perwerdekirin jî dabeşî çend cureyan dibe.

Li jêr çend cureyên perwerdekirinê me nîşandaîne:

1. Perwerdekirina Hizrê: Perwerdekirina hizrê ji wê yekê destpê dike ku takekes li ser hizrên baş û bi mifa ware perwerdekirin. Her dem hizrên baş bike. Wisa nîşanî mirov bide ku mirov hemû deman hizrên baş ji her tiştî bike. Yanî mirov di jîyana xwe da bibe kesekê geşbîn. Hizrên baş û bibaşî li her tiştî binêre.

Her liser perwerdekirina hizrê Zerdeşt pêxember (s.x.l.) dibêje; gereke mirov hizra baş ji her tiştî bike.

2. Perwerdekirina Derûnî: Ev perwerdekirin gelek girînge jibo takên civakî. Perwerda derûnî hemû deman mirov aram dike. Bi ramanek din eger mirov pewerda derûnî wergirtibe. Hemû deman wê mêşkê mirov aram be. Girîngiya perwerda derûnî gelege, jiber ku eger mirov bi perwerda derûnî neyê perwerdekirin. Wî demî dê civak nexweşiya xwe ji mirov bibîne. Eger derûnê mirov nebaş be, dê mirov zîyanê bighîne hemû civakê

3. Perwerdekirina Zanistî: Ev curê perwerdê ji xêzanê destpê dike. Eger di xêzana mirov da kêmasîyên vî curê perwerdê hebin. Wî çaxî wê perwerdekirina mirov gelek zorî û astengan bikşîne ku heta were perwerdekirin. Di vî cureyî da xêzan û xwandingeh û civak hemû pêkve pişkdarin. Eger yek ji vana kêmxemîyê bike di perwerdekirinê da, hîngê dê kêmasî di hemû perwerdekirinan da çê bibe.

Mînak:

Eger kesek çend baş hizr bike û ji layê zansitî ve bi perwerdek herî baş hatibe perwerdekirin. Lêbelê eger kêmasîyên wî yên perwerdeya derûnî hebe. Wî demî perwerdeya hizrî û zansitî jî mifayî li wî nake û civak jî jê nabîne.

Di perwerdekirinê da, gelek rêkên perwerdekirinê yên heyin ji wan rêkan jî guhdan û dîtin (Ebdullah Omer, 1999: 20). Eve yek ji baştirîn cureyên perwerdekirinê ye .

Li gel van cureyên perwerdekirinê, gereke xudankirin jî hebe. Di perwerdekirinê da gereke xudankirin jî hebe. Ev herdu karên hanê du karên jihev cudane. Eger perwerdekirin hebe û xudankirin nebe. Wê ew perwerdekirin jî bêmifa

be. Dîsan eger xudankirin hebe û perwerdekirin nebe wê ew xudankirin jî bi kêr tiştêkê neyê. Gereke perwerdekirin û xudankirin herdû bi hev re werin meşandin. Xudankirin têrkirina hezên mirov yê bercestone mîna xwarinê, vexwarinê, geştikirin hwd .

Yekemîn kesa karê perwerdekirinê dike dayîke. Dayîk berî hemû kesan bi karê perwerdekirinê radibe. Hemû dayîk zarokên xwe hînî karên baş dikin. Teqez ji dayîkê bê wê zarokên xwe ji karên nebaş û xerab bi dur bigre. Cihê zarokî di xêzanê da, li destpêkê zarok bi dayîkê ve girêdaye. Ev çende jî siruştî bi dayîkê daye. Ser perwerdekirina dayîkê bo zarokên wê gelek bîrûboçunên zana hene ku her yekê tiştêk jêra gotîye. Zîmanasê Rûsî B. Nîkîtin li dur vê çendê dupatîyê li ser rolê perwerdeya dayîkê, di nav xêzana Kurdî da dike. Bi rengekê ku her dayîkekê perwerde û fêrkirina stranên nîştîmanî, şayî, suwarçakî û nivîsîn, bi stuyê xwe ve girtîye (Suzan Taha Resul, 2007: 66). Yanî dayîk dinav gelê Kurd da bi mamosta yekemîn tê hejmartin. Ev jî jibo rola wê a girîng tê zanîn. Eger dayîk zarokê xwe baş perwerde neke hîngê perwerdekirinê din jî mifayê wan hindik dibe.

Zêdetir ji vekolînên meydanî dupatîyê li ser wê yekê dikin ku fêrkirina jinê bi berhemînanek bi hêz dihejmêrin. Çiqas astê jinê yê rewşenbîrî û fêrkirinê bilindtir be, dê pêgehandina nîfşê dahatî pirtir lê bike (Suzan Taha Resul, 2007: 67). Ev yek gelek girîng tê jibo perwerdekirineka saxlem. Eger astê dayîkê yê rewşenbîrî û têgehiştîne bilindibe, hîngê ew zarokên li ber destê wê dayîkê da tînin perwerdekirin, wê gelek pirtir mifa ji perwerdekirinê bibînin .

Di perwerdekirinê da perwerdeya fermî û nefermî heye. Yanî ew perwerdeya mirov li xwangingehan bi dest dixin, dibe ya fermî ya ne li xwangingehan, dibe ya nefermî. Ev herdû cureyên perwerdeyê temamkerên hev in. Dibe herdû bi hev re jî werin meşandin.

Eger em sehbikin layenê perwerdekirinê di gotinên mezinan da. Dê bo me êşkere bibe ku gotinên mezinan bi taybetî û folklor bi giştî, jêder û seçaawayekê baş in bo perwerdekirinê. Di gotinên mezinan da tiştê herî zehif tê dîtin, perwerdekirina civakîye li ser layenên baş bo perwerdekirina civakêkê.

Mînak:

Perwerdekirina civakî jî, bi gelek babetên din di folklorê da hatîyekirin. Lêbelê babetê ji hemûyan pirtir perwerdekirina civakî pê hatîye kirin, gotinên mezinanin. Di hemû gotinan da mirov dikare perwerdekirinê di piranîya gotinên mezinan da bibîne. Perwerdekirin bi axaftinê tenê nabe. Gereke jibo perwerdekirinê karên mirov jî li gorî wê perwerdê be ya ku mirov dibêje. Gotinên mezinan ji baştirîn paşvemayên civakîne. Girîngîya perwerdekirinê veguhastîye bo parastin li ser berdawamîya civakî û mana wî. Girîngînedan bi layenê perwerdekirinê di gotinên mezinan da, dê bibe egerê ji destdana layenekê mezin ji gotinên mezinan. Gotinên mezinan rêka hizrkirina dirust nîşanî mirov dide .

Perwerdekirina bi gotinên mezinan, di çend qonaxan da darbas bûye. Ku her yek ji van qonaxan çendîn gotinên mezinan bo hatîne gotinê. Miletê Kurd girîngîyek mezin daye perwerdekirinê. Ev girîngîdane jî di hijmara zor a çîrok, serhatî, yaryên folklorê û gotinên mezinan reng vedaye. Lêbelê pirtir layenê perwerdekirinê di gotinên mezinan da eşkere dibe. Jiber ku di her gotinekê da şîret û amojgarî têda tê dîtîn. Qonaxên perwerdekirina zarokî dibine çend qonax ku ew jî :

- 1- Qonaxa 1 – 3 salîyê (Savabon)
- 2- Qonaxa 4 – 6 salîyê (Zarokînî)
- 3- Qonaxa 7 – 12 salîyê (Hestikirin)
- 4- Qonaxa 13–18 salîyê (Sinêleyî - ciwantî) (Ansîklopedîya Parêzgeha Duhokê, 2017: 233).

Qonaxa 4 – 6 Salîyê :

Di vê qonaxê da zarok yê hestîyare û mêşkê wî neşet gelek tiştan werbigire. Bi tenê bav û kalên me yê vîyayîn ku ji hinek karên xerab bi dur bigire. Mînak jî li ser vî babetî zorin. Mîna hişyarkirin ji derewê, axiftinên zêde , dizî, bêrêzî, rêzgirtin hwd. Di vê qonaxê da, bi tenê hinek pêzanînen giştî bi zarokî tên dayin. Di qonaxa (4 - 6) salîyê da zarok bi dayîk û bavan ve girêdaye. Dayîk û bav jî li gorî şîyanên xwe dê hinek tiştên kêmbi zarokî dibêjin. Bav û kalên me ev qonaxe bi girîng zanîye, jiberku di vê qonaxê da perwerdekirin bo zarokî girînge. Perwerdekirina vê qonaxê wekî bingehekêye bo qonaxên din yê zarokatîyê. Ev qonaxe bi tenê hinek

têbînyên giştî bi zarokî tên dayin. Ezmanê dirêj, darkukê serê xudanî ye (Ansîklopedîya Parêzgeha Duhokê, 2017 : 233). Di vê qonaxê da astê têgehiştina zarokî gelek kême. Bo perwerdekirina zarokî bi tenê hinek tiştên sivik û rehwan têne gotinê. Da ku zarok mifay jê werbigire. Bo vê mebestê jî mifa ji gîyanewerê darkuke hatîye wergirtin. Ku karê vî gîyanewerî bi tenê dubarekirine, evê çendê jî karîgerîya xirab li ser navê vî gîyanewerî kirîye. Bav û kalên me ziman dirêjî wekî vî karî daye eşkere kirin. Herwisan di vê qonaxê da zarok hes dike çîrok jêra werin gotinê. Her li gel çîrokê jî gelek caran zarok di ber gotina çîrokê da dinivin û dixew diçe.

Mînak:

Ew çîroka her heft têjikên bizinê demê li malê dihêle û ji têjikên xwe ra dibêje derî li kesê venekin. Dema guhê xwe nedine dayîka xwe ka çi bi serê wan tê. Ji vê çîrokê bo zarokî eşkere dibe ku zarokên guhê xwe nedine dayîka xwe wê poşmanî bi serda were. Wê zarok tuşî astengan be.

Qonaxa 7 – 12 Salîyê:

Di vê qonaxê da hestê têgehiştinê lidef zarokî peyda dibe. Zarok dişêt rûdanan şilove bike, eger û encamên gelek rudanan eşkere bike. Ew gotinên bo vê qonaxê hatîne gotinê, pirtirin ji yê qonaxa (4 – 6) ne.

Mînak:

Gotinên mezinan yê bo vê qonaxê hatîne gotinê. Yê tîni li avê digert, yê bîrsî li nanî (Hecî Cefer, 1986: 126). Ji vê gotinê bo zarokî tê eşkerakirin ku gereke mirov bi destê xwe nanê xwe bixwe. Mezinan destek daye zarokê ku eger birçî yan tîn bu, gereke ew bixwe wê pêdivîya xwe têr bike. Yarî bînekê di xuşin (Hecî Cefer, 1986: 127). Ji vê gotinê bo zarokî tê eşkerakirin ku eger kesekî yarî – henekan pêra bike, gereke ew zarok bo demekê li gel bike. Ne hemû gava xwest biçe cem û henekan pêra bike. Mirî û zîndî bi avê paqij dibin (Hecî Cefer, 1986: 103). Vê gotinê bo zarokî eşkere kirîye ku bi avê hemû tişt paqij dibe. Zarok handaye ku gereke xwe bi avê paqij bike. Eger dest yan her cihekê din pîs bu, gereke bi avê xwe paqij bike .

Qonaxa 13 – 18 Salîyê:

Di vê qonaxê da astê têgehiştinê lidef zarokî hinek bilind dibe ku dişêt kesayetîyek serbixwe bo xwe ava bike û bibe xudan biryar. Herwisan rolê xwe di nav xêzanê da bibîne. Di vê qonaxê da zarokî divê kesayetîya xwe bo dawrûberên xwe, çî xêzan, heval hwd. biselmînit. Bi vê egerî jî gelek karên metirsîdar dike daku derdurên wî danpêdanê bi hêz û şîyanên wî bike (Ansîklopedîya Parêzgeha Duhokê, 2017: 235). Dîsan di vê qonaxê da zarok hinek karan dike bi tenê beramberî wî haydarî hêz û şîyanên wî bibe. Di vê qonaxê da zarok bi hêrse. Di vê qonaxê da zarok naxwaze kes amojgarîyan bi rengeke rasterast lê bike. Di dana biryaran da zarok divê hemû deman biryarên wî li duv wî be. Hez nake ku yek biryarên xwe li ser bisepîne. Gereke di vê qonaxê da xêzan hestîyarîya zarokê xwe li pêş çav bigire.

Mînak:

Yê bi kêr xwe nehêt, bi kêr hevalê xwe jî nayêt (Hecî Cefer, 1986: 126). Yanî ev gotin wê yekê ji me re eşkera dike ku ew kesê bi kêr xwe neyê bi kêr hevalê xwe jî nayê. Bav û kalên me ev gotin bo zarokê xwe gotîye da ku li demê hevaleyê ji xwe re bibîne, gereke hevaleyê baş bibîne. Eger hevalê wî ji xwe re baş nebe wê çewa ji wî re baş be.

Mînak:

Mezinahî li hemû kesa nayêt. Mirina li gel hevala dawete (Hecî Cefer, 1986: 96). Nede avêt giran da te nebet (Hecî Cefer, 1976: 107). Nîv mêre nabît tere (Hecî Cefer, 1986: 107).

Piştî vê qonaxê zarok berev qonaxa herzekarîyê (ciwanîyê) ve diçit. Di qonaxa herzekarîyê da guhertinên leşî û derûnî, bi ser zarokî da tên. Ew guherînên di vê qonaxê da dirust dibin, dibine egerên hindê ku guherandin di biryarên herzekarî da dirust dibin, bi rengekê ku amojgarî û şîretan bi rengeke rasterast wernagire. Em li gotinên vê qonaxê binêrin dê bibînin ku gotin bi rengeke wisa hatîye gotin ku hestê herzekarî neşkêne yan jî wê hizrê neke ku ew gotin kartêkirinê li kesayetîya wî dike. (Ansîklopedîya Parêzgeha Duhokê, 2017: 233). Rêncberê xwe be axayê mala xelkê

be (Dêrşewî, Mela Mehmûd, 1980: 127). Li gel mezinbuna zarokî, bav û kalên me hest bi hindê kirîye ku nabe di mal da rune xwarê bêkar bimîne. Lewre ev gotin bo vê qonaxê hatîye gotinê. Destekê dide zarokê bo karkirinê. Kesê kar bike, wekî axayane di nav xelkê da. Gelek gotinên din jibo vê qonaxê hatîne gotinê. Rih dibin bost lêbelê neyar nabit dost (Dêrşewî, Mela Mehmûd, 1980: 126). Xezîna zêra xilas dibeî lêbelê şulê mêra xilas nabit (Hecî Cefer, 1986: 42).

2.2. PIRAKTÎKA PERWERDEKIRINÊ DI GOTINÊN MEZINAN DA

Di vî beşa hanê da em dê li gorî şîyanên xwe hinek wan layenên perwerdekirinê di gotinên mezinan da eşkere bikin. Yê ku bav û bapîrên me bi wan gotinan civak perwerde kirine. Helbet hemû gotinên mezinan di nav xwe da perwerdekirine. Her babetekê di jîyana me a rojane da bi kar tê di nava gotinan da cîyê xwe girtîye. Mebesta bav û bapîrên me ji gotina gotinên mezinan avakirina civakekê ser başî, rastî, rêzgirtin û hevalînî h.w.d. bê perwerdekirin. Gotinên mezinan weke pêdivîyek jibo civakî di çaxên pêşîn û niha jî da hatîne holê. Di hemû dem û zemanan da pêdivîya mirov bi perwerdeyê heye. Eger civak çend pêşda here û çawabe wê her pêdivî bi perwerdekê herî baş hebe. Mezinên me jî ev yek bi girîngî wergirtîye. Lewre di gotinan da layenê perwerdekirinê bi biha yek berz û bilind jêra hatîye dayin. Layenê perwerdekirinê di gotinên mezinan da dibîne çend beşan, ji wan jî:

2.2.1. Perwerdekirin Li Ser Rastîyê

Rastbêjî, rastgotin, nekirina derewa ev hemû peyve li jêr van navan di gotinan da derbas bune. Mebest jî bi tenê ewe ku mirov di axaftina xwe a rojane da derewan neke. Ev babete yeke ji babetên herî girîng û bi biha ku kesayetîya mirov bi rengeke herî bi rêz û hurmet dide nîşan dayin. Bav û kalên me babetên nekirina derewan bi girîng zanîne. Lewre di gelek gotinan da derbas bune. Helbet eger em binhêrin civakî dê girîngîya vî babetî ji me re eşkere bibe. Çûnkî di hemû deman da civakî pêdivî û pêwîstîya bi babetê nekirina derewan yê heye. Eger em li gotinên li ser nekirina

derewan binêrin, dê ji me re eşkere bibe ku mezinên me gotinên bi vî cureyî her jibo zarok heta mezinan gotîne. Jiber ku hemû kesan pêdivîya bi vî rewîştê herî girîng heye. Ev rewîşte xaleka herî girîng a kesayetîya mirov dide eşkerekirin. Ev rewîşte weke pîverekê ye jibo serederîkirin û têkelîkirina li gel xelkê û dewrûberan. Çunkî eger ev rewîşte li cem hinekan hebe wî demî mirov xwe jê dur digire, mirov naxwaze pêra hevaltîyê bike. Kesên ev rewîştê baş li cem wan tunebe, hemû deman di çavên xelkê da kêmin. Yanî cîyê wan di nav astên civakî da, hertim li astên xwarê ne anko astên herî kêmtir yên civakî. Rastbêjî bi gelek reng û şeweyan di gotinên mezinan da hatîye bikaranîn. Di hinek gotinan da zîyan û xerabîyên kirina derewan hatîne gotin. Di beşeke din a gotinan da mifayên rastîyê hatîne gotin. Herwisan di hinek gotinên din da encamê kirina derewan hatîye eşkere kirin. Bi van rengan behsa derewê di gotinên mezinan da hatîye kirin. Li jêr em dê hinek gotinên li ser vî babetê bidine eşkerekirin.

Dawîya derewan pûçe (Celalî, Mela Êsiv, 2014: 48). Bav û bapîrên me ji me re eşkere kirîye ku dawîya derewan bê mifaye. Eger mîrov li derewa xwe çend mifayî û sûdê jê bibîne Lêbelê li dawîyê dê ew hemû mifaye bi boş here anko pûçe bi kêr tiştêkê nayê. Ji vê gotinê bo me eşkere dibe ku eger derew çend bimîne û eşkere nebe wê her demekê rastî were holê.

Werîsê direwa yê kurte (Hecî Cefer, 1986: 125). Eger kesek çend derewan bike wê her wextek were ku derewên wî, eşkere bibin. Bi ramanêke din tê wê mebestê ku derew demeke dirêj namîne wê rastî di demeke kin de were meydanê.

Axivtinên derewîna dîwarê ser befirêye (Hecî Cefer, 1986: 12). Mezinên me kirina derewan şibhandîne dîwarê ser befirê. Dê her demek were ku berf bihele, eger berf helîya wê ew dîwar jî bihele. Yanî dawîya derewan her rastî derdikeve holê.

Rastî di nav agirî da nasojît (Hecî Cefer, 1986: 58). Ji vê gotinê tê xweya kirin ku eger çend rêk werin danîn di rêya rastîyê da, wê her rastî were eşkere kirin.

Hesp bi hevsaran mêr bi qewil û qeraran (Celalî, Mela Êsiv, 2014: 96). Ev gotin tê wê ramanê ku eger hespî hevsar nebe bi kêr karekê nayê. Herwisan mêr jî bi axaftinan nebe, nebe mêr.

Yê kû nebêje û bike şere. Yê kû bibêje û bike mêre. Yê bêje û neke kerê nêre (Celalî, Mela Êsiv, 2014: 203). Ev gotin behsa wê yekê dike ku eger mirov axaftinek

got gereke mirov bi cî bîne. Ew kesê axaftina nebêje û bike şibhandîye şêran, şêr jî li cem Kurdan weke keseke bi hêz û xwudan şîyan hatîye dîyarkirin. Evca ew kesê xwedan axaftin be weke şêrîye, di nava gel da.

Eger bêjî masî çermige bawer nakem (Roxzadî, Elî, 1385: 35). Ji vê gotinê tê xweyakirin ku eger kesek gelek derewan bike, paşê ew rastîyê jî bêje nayê bawerkirin.

2.2.2. Perwerdekirin Li Ser Karkirinê

Pêşinanên me xwestine ku take kesên civakî ser wê yekê werin perwerdekirin ku ew bi xwe keda destê xwe bixwun. Eve babetekê gelekê girînge jibo jîyana rojane a mirovan. Di vî babetî da pêşinanên me bizav kirine ku berê hemû taxên civakî bidine karkirinê. Ji xwe miletê Kurd her di kevin da hemû xêzanê bi hev re kardikir. Eger zelumê malê çoba cotî bêguman da hev jîna xwe jî bi xwe re bit, daku li demê westîyanê yan bînedanê çayek yan xwarinek bi hev re xwariba. Herwisa li gel endamên din ên malê da bi hev re karkirin jiber ku da zû ew kar xelas be. Evca karê şivantî û bêrîvanî be yan her karekê din heba. Karkirin bingehe û binemayekê herî girînge jibo avakirina civakan.

Mezinên me her di zû da hest bi girîngîya vî babetî kirîye. Pêşinanên me çendîn gotin jibo perwerdekirina civakî li ser karkirinê gotîne. Bi van gotinan, mezinên me şîyayîne civakî bi rengekê baş li ser karkirinê perwerde bikin. Di babetê karkirinê da gotinên mezinan ev babete bi xweşî û keyfa di jîyanê da ve girêdaye. Anko her kesekê berdewam kar bike dê li dev xelkê û di nav civakî jî da yê serfiraz be. Hemû deman kesê kar bikir, yê xweştirîye di nav xelkê da û berovajî karkirinê, kesê bêkar her dem yê kême li ber çavê xêzanê bi tayîbetî û hemû civakî bi rengekê giştî. Di karkirinê da mezinên me civak destek kirine ku şerm ji karkirinê nekin. Ya şerim ewe mirov destê xwe beramber hinekan veke û parsektîyê (xazûkîyê) bike. Gelek gotin li ser perwerdekirê hatîne gotin, em dê hinekan li jêr bidine eşkere kirin.

Mînak:

Yê nekit zehmet naxut ne'met. Di vê gotinê da mezinên me ji me re eşkere kirîye ku her kesê zehmetê nebînit naxut nemetê. Evê gotinê encamê karkirinê yê bo me dîyarkirî ku bi karkirinê dê mirov zêdetir nî'metan bidest bixe.

Şuxil bu dur, ocax bu kor (Celalî, Mela Êsiv, 2014: 187). Ev gotin behsa wê yekê dike ku gereke hemû kes bi hev re kar bikin. Nabe şuxil bi dorê be, eger yek neke ya din jî neke, bi vî awayî dê mal, ocax, bajar hwd. ji nav here. Kor bi ramana neman yan jî navçun di vê gotinê da hatîye.

Zehmeta gîyanê te zêdebîna nanê te (Hecî Cefer, 1986: 61). Mezinên me, em perwerdekirine ser wê yekê ku mirov çend xwe bi westîne wê pirtir qezenc bike. Eger mirov gelek kar bike wê berhemê wî jî gelek be.

Tu ne'met bê zehmet nabe (Celalî, Mela Êsiv, 2014: 197). Evê gotinê em perwerdekirine ku xwe bi westînin jibo pêhtir bi dest xistina xweşîyên dinyayê. Yanî mirov çîqa zêdetir zehmetê bikşîne, wê ew qas pêhtir nemetan bibîne.

Betalî, xirab malî (Hecî Cefer, 1986: 23). Perwerdehîya di vê gotinê da ji me re dibêje ku bêkarî û betalî, mala mirov xerab dike.

Dostê xwe hîmî masî girtinê bike, masî xwarin rihet e (Celalî, Mela Êsiv, 2014: 45). Ev gotin me perwerde dike ku eger mirov ji bira, heval, dostê xwe hes bike, bila hîmî kar bike. Mînaka vê gotinê gotî, masî girtine. Her kes di kare masîyan bixwe, lê hinek kes dikarin bigirin. Mebesta vê gotinê ewe ku mirov hevalê xwe hîmî kar bike, çonky her kes di zane bixwe.

Şol çeke hewce boyê veke (Hecî Cefer, 1986: 74). Di vê gotinê da mezinan piştgirî daye me ku xwe hîmî karkirinê bikin. Eger mirov hemû şolan bizanibe, her wextê pêwîstîya mirov pê çêbu, dê bi karî wê pêwîstîya xwe pê xelas bikî.

2.2.3. Perwerdekirin Li Ser Kêm Axaftinê

Hemû deman pêşinanên me bi rêka gotinên mezinan yê heskirî xelkê xwe bi baştirîn perwerde werin perwerde kirin. Rewîstek herî baş û bi mifa yê ku mirov di çavên xelkê da mezin bike, kêm axaftine. Gelek gotin li ser kêm axaftinê di gotinên mezinan da yê hatîne gotinê. Di hinek gotinan da mifa û sûdên kêm axaftinê hatîne

eşkere kirin. Hinek gotinên din nebaşî û zîyanên axaftina zêde hatîne gotin. Babetê kêma axaftin û gelek axaftin herdû bi hev re peywendîdarin, jiber ku eger yek li cem mirov hebe yê din namîne û eger yê din hebe a yekemîn namîne. Di gelek gotinan da ev babete bi şeweyên cuda derbas buye. Gelek gotin ser wê çendê hatîne gotin ku teqez mirov kêma baxive wê kêmtir xelet bibe. Babetê zêde axaftina di cîyê xwe da jî dikeve bin vî babetê hanê ve. Gelek gotinan ser wê yekê hatîne gotin ku mirov li dem û wextê pêdivî bi axive. Yanî mezinên me em haydar kirine ku ne her demê dilê me xwesit bi axivin, belkî dibe hizr bikin ka dê çî û jibo çî bi axivin. Jiber ku da axaftina me puç neçe. Herwisa hinek gotinên din yên li ser pir axaftinê, di gotinan da li jêr navê pîrbêjîyê hatîne gotin. Di perwerdehîya li ser kêma axaftinê da, gotin hene jibo zarokî heta gencî û pîran jî tene dîtin. Mînakên gotinan yên li ser perwerdekirina civakî jibo kêma axaftinê pirin. Em dê hinek ji wana eşkere bikin.

Mînak:

Du caran guhdar bike carekî bibêje (Celalî, Mela Êsiv, 2014: 44). Evê gotinê em perwerdekirine ku kêma baxivin û pêhtir guhdarîbikin. Ji berku Xwedê jî devek daye me û du guh. Ev jî tê wê ramanê ku hindik bi axivin.

Axivtinê sê cara bîne ber gotinê, paşî bêje (Hecî Cefêr, 1986: 13). Ev gotin tê wê ramanê ku hemû deman ya baş ewe ku mirov, berî bi axive gereke hizr xwe di wê axaftinê da bike û paşê bibêje. Ev yek jibo wê çendê ye da ku li demê axaftinê da mirov poşman nebe. Axaftina bêhizr kirin dê mirov poşman bike. Hemû hewlên mezinên me ewe ku mirov di jîyana xwe da serkeftî be. Jiber vê yekê jî çendîn gotin li ser kêma axaftinê gotîne. Hebûna kesên serkeftî dê civakek serkeftî pêşkêşî mirovatîyê bike.

Eger axaftin zîv bit ne axaftin zêre (Dêrşewî, Mela Mehmûd, 1980: 6). Zêr tiştê gelek bi bihayê, li cem hemû kesan û li hemû deran. Zîv jî bi bihayê belê kêmtir ji zêrî. Mezinên me zêr û zîv bi kêma axaftin û axaftina zêde şibihandine.

Ziman girtî serê riheteye (Celalî, Mela Êsiv, 2014: 213). Yanî eger ziman genc û rast xeber de serê mirov rehetê. Mirov toşî arîşan nabe, eger zimanê mirov pir xeber nede.

Ziman paleyê xwedîyê xwe ye (Celalî, Mela Êsiv, 2014: 210). Ji vê gotinê tê xweyakirin ku zimanê mirov her tiştê mirovîye. Eger zimanê mirov baş be wî demî dê mirov jî baş be.

2.2.4. Perwerdekirin Li Ser Çareserkirina Arîşan

Wek me berî niha gotî, ku pêşinanên me hemû tişteke em pêdivî ji me re gotîye. Evca perwerdekirin li ser çareserkirina arîşeyan, girîngîya xwe a tayîbet û karîgerîya xwe li ser jîyana me heye. Lewre mezinên me ev babet jibîr nekirîye û gelek gotin li ser gotîne.

Çi derd di bê derman nînin (Hecî Cefer, 1986: 35). Yanî her derd û nexweşîyekê dermanê xwe heye. Ev gotin li wan deman tê gotin wextê ku mirov li ser kar yan arîşeyekê radiweste, nekare çi bike, wê ev gotin were gotinê. Di wî çaxî da dê hinek bêhna mirov fireh be, dê mirov bizanibe ku hemû derdan dermanê xwe yê hey.

Asteng bê derece nabin (Dêrşewî, Mela Mehmûd, 1980: 23). Ev gotin me li ser wê yekê perwerde dike ku eger arîşe çend mezin be jî wê her dermanekê wê hebe. Yanî bila mirov bêhêvî nebe, eger nexweşîya mirov çend mezin be jî wê her çareserkirinek jêra hebe.

2.2.5. Perwerdekirin Li Ser Zû Hişyarbuna Spêdeyan

Ev layenê perwerdekirinê bu civakî li hemû dem û wextan girînge. Weke dîyar zû şîyarbun li spêdehîyan karek zehmete. Lewre pêşinanên me bi gelek gotinan em haydar kirine ko zû şîyarbuna spêdeyan bi xêr û mifaye. Di vî layenî da behra herî pêhtir gotin bu gencan hatîne gotin. Çunkî genc hes dike ku zu şîyar nebe li spêdehîyan. Lewre pêşinanên me yên xwastine gencan û hemû taxên din ên civakî ji vî karê henê haydar bikin. Zû şîyarbuna spêdeyan di gotinan da bi bereket hatîye. Pêşinanên me zû ji xewrabun di hinek gotinan da kirîye mercê yekane yên mirovên

bi aqil, jêhatî, serkeftî hwd. Em dê li gorî şîyanên xwe hinek wan gotinan dîyarkîn ên ku em li ser zû şîyarbun ji xewa spêdehîyan perwerdekirin.

Mînak:

Şerê sibê ji xêra êvarê çêtire (Celalî, Mela Ûsiv, 2014: 186). Ev gotin behsa wê yekê dike ku eger mirov li spêdeyan zû şîyar bibe baştîre ji xêra êvaran. Ji berku spêde zû bi xwe xêre, çibe wê ji xêra êvaran çêtir be. Di vê gotinê da mifayeke din jê tê wergirtin. Ew zû şîyarbuna spêdeyan jî mifayên herî başin jibo leşê mirov. Pêşînanên me ev yeke jî bi girîng wergirtine û di gotinên xwe da bikar anîne.

Şevê zû dergehî bigre eş tîn, subê zû dergehî veke xêr tîn (Hecî Cefer, 1986: 74). Perwerdehîya di vê gotinê da em hînî wê yekê kirine ku gereke spêdeyan zû şîyar bibin. Herwisa şevan jî zû herin malên xwe, jiber ku da spêde zû şîyar bibin. Çunkî spêdeyê zû xêr tîn.

Ê ku zû radibe, malê xwe bi bereket dike (Öncü, Mehmet, 2009: 228). Evê gotinê em perwerdekirine ku eger em spêdeyan zû rabibin, wî çaxî malê mirov bi bereket dibe.

2.2.6. Perwerdekirin Li Ser Bi Destveyînana Maldarîyê

Evî layenî peywendîyek xurt bi jîyana me a rojane ve heye. Em dişên bêjin ku di vî layenî da xweşî û tama jîyanê jibo mirov tê xweyakirin. Mezinên me perwerdekirin li ser bi destxistina maldarîyê bi gelek gotinan ji me re eşkere kirîye. Da ku civak sûd û mifayî jê wergire. Pêşînanên me di gotinan da kesê maldar û zengîn wek kesên herî baş û girîng di nav civakî da dane xweyakirin. Ev çende kirîye da ku gel berê xwe bide vê çendê. Maldarî jî bi gelek rengan di gotinan da hatîye gotin. Em jî dê hinek wan gotinan eşkere bikin.

Heke îxbal hate serî bi zire wekî kerî xelik dê bêj te aferî (Hecî Cefer, 1986: 109). Ev gotine behsa wê yekê dike ku eger mirov bi mal û saman be, çi karî bike wê xelik, dewrûber, civak hwd. jê razîbe û tê bêjin ev kareke başe.

Heke îxbal çû ji bal, xelik dê bêjin, ey bê me'rîfetê bê kemal (Hecî Cefer, 1986: 113). Ev gotin dijberî gotina dine. Ev tê wê ramanê ku eger hejar be wî çaxî ci karê bike wê li xweşa xelkê neçe.

Heyî be kurê seyî be (Dêrşewî, Mela Mehmûd, 1980: 289). Ev gotin bi rengeke eşkere ji me re dibêje ku eger mirov bi mal û hal be, wê xelik rêz û biheyek zêde bidine mirov. Ev gotin tê wê ramanê jî ku eger mirov zengîn be, girîng nine mirov kurê kêbe.

Malê te hebe her kes dostê te ye (Celalî, Mela Êsiv, 2014: 155). Ji vê gotinê xweya dibe ku ew kesê malê wî hebe, hemû kes di xiwazin dostîniyê pêra bikin.

Xwedî malo bi xaltî û bi xalo. Bê malo bê xaltî û bê xalo (Celalî, Mela Êsiv, 2014: 86). Evê gotinê em perwerdekirine ku maldarî gelek girînge jibo mirov. Heta wê rade yê ku eger yek zengîn be, wê mirovên wî çêbibin. Ev gotin tê wê ramanê.

2.2.7. Perwerdekirin Li Ser Nerakirina Minetan

Gelek gotinên mezinan, em perwerdekirine ku mineta kesê nerakin. Di dest xistina hêvî û armancên xwe da, em bi hêz û şîyanên xwe bi dest bixin. Pêşînanên me hemû wextan yê heskirin ku her rewîstek jîyana mirov têxw tengasîyan, me jê dur bike. Yek jî ew rewîstê ku paşeroja mirov zelal nake, ewe ku kesek minetê li mirov bike, eger karek ji mirov re kir. Mezinên me gelek gotin ser wê yekê gotîne ku bila mirov nexweşîyan bikişîne. Lêbelê bila mirov mineta kesê hilnede. Mînakên ser vî cureyê perwerdekirinê pirin.

Mînak:

Goştî gonî xot bixoy le minetî qesabî baştire (Reşas, Hemîd, 2010: 165). Ev gotin tê wê wateyê ku bila mirov goştê xwe bixwe. Lêbelê mineta goşt firoşî nekeve ser mirov. Di demên pêşîn da, goşt firoş hindik bun. Lewre eger ji kesekêre karek bi kira, wê minetek lê bikira. Mezinên me ev yek bi kareke ne nebaş dîtine. Lewra ev gotin li ser vê yekê gotîne.

Qencîya bê me'rîfetî wek nanê bi avê ketî (Hecî Cefer, 1986: 96). Ji vê gotinê eşkere dibe ku eger kesek qencîyê li mirov bike, di ser qencîya xwe da minetê bike, wî demî wê qencîyê yan wê başîyê çi girîngîya xwe namîne.

Şuşeyek jehr vexwe, lê şuşeyek minet venexwe (Celalî, Mela Êsiv, 2014: 189). Evê gotinê em perwerdekirine ku eger mirov jehrê vexwe baştire ji wê yekê ku yek minetekê li mirov bike.

Dixwum nan û avê min mineta kesê navê (Dêrşewî, Mela Mehmûd, 1980: 118). Perwerdeya vê gotinê ewe ku mirov nanê xwe bi avê bixwe, baştire ji wê yekê ku yek xwarnekê bide mirov û minetekê di ser wê xwarnê ra li mirov bike.

Serê bin minetan biçîte nav zîyaretan (Nîhad Se'dullah, 2001: 9). Evê gotinê em perwerdekirine ku bila li ber mineta kesê nebin. Eger mirov mirîbe, baştire ji wê yekê ku li ber mineta kesên din be.

2.2.8. Perwerdekirin Li Ser Zû Encamdana Karan

Di vî curê perwerdekirinê da pêşînanên me bi gelek gotinan em haydar kirine ku karên xwe zû biqedînin. Di hinek gotinan da nebaşîyên gîrokirina karan ji me re eşkere kirîye. Mezinên me bi gelek gotinan gîrokirina karan ji me re eşkere kirîye ka çend nebaşîyên xwe hene. Ji xwe mirov dê her wî karî encam bide. Lêbelê zû yan dereng. Çi qasî zûtir be wê ji mirov re baştir be. Herwisan wê derunê mirov rihettir be. Zû encamdana karan fere, jiber ku dibe rojêke din mirov kareke din hebe. Pêşînanên me bi çendîn gotinan em perwerdekirine ku ev rewîştê henê bi me re be li her cîh û wextekê. Mînak li ser vî curê perwerdekirinê pirin, em jî dê hinek ji wana li jêr binivîsin.

Mînak:

Xwarina evro bi hêle bu sibahî şolê evro ne hêle bu sibahî (Hecî Cefer, 1986: 46). Di vê gotinê da tê xweyakirin ku eger xwarin bê paşxistin jibo rojêke din, asaîye û tişt nabe. Lêbelê nabe encamdana karan were paşxistin. Jiber ku mirov nizane wê roja were çibibe.

Kurmanc kere, hingê ruynit ew rê libere (Dêrşewî, Mela Mehmûd, 1980: 241). Yanî eger mirov karek li ber be gereke mirov zû xwe jê xelaske. Mezinên me em paldane wê yekê ku her karekê hebe zû biqedînin. Ew kesê karê xwe gîro bike di vê gotinê da weke kerî lê kirîye.

Her tiştêkî belayek heye, paşêxistinê gelek bela hene (Dêrşewî, Mela Mehmûd, 1980: 289). Yanî gereke mirov hemû deman karê xwe paşnexe, heke şîya zû encam bide, jiber ku paşxistinê gelek nebaşîyên xwe hene.

Şolê bi wextî weku mirê ser textî (Hecî Cefer, 1986: 72). Ji vê gotinê xweya dibe ku eger karên mirov di dem û wexta xwe da be, mirov weke mîrê ser textîye. Evê gotinê em perwerdekirine ku hemû deman karên xwe di wexta wan da bicîbînin.

2.2.9. Perwerdekirin Li Ser Hilbijartina Hevalan

Gelek gotinan em perwerdekirine li ser wê yekê ku çawa hevalî ji xwe re hilbijêrin. Girîngîya vî babetî mezinên me li berçav wergirtîye û çendîn gotin li ser gotîne. Mirov dikare bê gelek tiştan jîyana xwe derbas bike. Lêbelê mirov nikare bê heval jîyana xwe derbas bike. Lewre mezinên me jibo me dîyar kirîye ka dê li gel kê û çawa hevaltîyê bikî. Girîngîya Hilbijartina hevalan gelege. Lewra di çendîn gotinan da reng vedaye. Di hinek gotinan da sûd û mifayên hevalê baş ji me re gotîne. Di hinek gotinên din da nebaşîyên hevaltîya xeraban ji me re eşkere kirîye. Hemû gotin jibo wê yekêne ku mirov bi dirustahî hevalê baş ji xwe re destnîşan bike û pêre eleqedar be. Mînakên ser vî curê perwerdekirinê pirin.

Mînak:

Hevalê parî naçit arî (Dêrşewî, Mela Mehmûd, 1980: 288). Yanî hevalê xwarinê naçit alîkarîyê bike, eger hevalê wî pêwîstî pê hebe. Lewre li ser me pêdivîye, weke mezinên me em perwerdekirin ku wî hevalî ji xwe re bigirin ê ku nehevalê parî be yanî ne hevalê nanî be.

Hevalînî bi sanahîye, belê jêkvebûn zehmete (Hecî Cefer, 1986: 117). Ev gotin nîşanî me dide ku hevaltî hêsane. Lêbelê berdewamî dan bi wê hevaltîyê

zehmete. Herwisa ev gotin nîşanî me dide ku eger du heval ji hev veqetan, wî çaxî wê eşkere bibe ka ew heval çewa bû.

Heke hevalê te bu av, nede nav (Hecî Cefer, 1986: 117). Bi vê gotinê mezinên me ji me re dibêjin ku eger hevalê mirov xwe bo mirov kire av, gereke mirov nede nav. Ew hevalê xwe jibo mirov kêmbike gereke mirov jî wê çendê li berçav wergire.

Hevalêt xwuşîyê di zavin, hevalêt tengîyê di kêmin (Hecî Cefer, 1986: 121). Ew perwerdeya di vê gotinê da heye ji me re gotîye ku li ser hîlbijartina hevalî mirov haydar be. Bo xweşîyan heval pir zorin. Lêbelê ên nexweşî û tengasîyan hindikin.

2.2.10. Perwerdekirina Jinan

Perwerdeya jinan bi gutinan dibe çend curek, ji wan jî:

2.2.10.1. Perwerdekirin Li Ser Neguhdarîkirina Jinan

Di vê perwerdekirinê da mezinên me bi gelek gotinan em hişyar kirine ku guhdarîya jinê nekin. Eger em li civakê binêrin dê ji me re xweya bibe, guhdarîkirina jinê kareke başe. Lêbelê mezinên me bi hijmareke gotinên mezinan, em paldayîna wê yekê ku li ser hemû karan û di hemû wextan da guhdarîya jinê yan regezê (netewê) mê nekin. Herçende hindek gotinên kêmbike hene behsa wê yekê dikin ku guhdarîkirina jinê kareke başe û bi mifaye jibo zelumê. Hinek gotinên din behsa wê yekê kirine ku guhdarîya regezê nêr bo mê gelek mifa ye.

Mînak:

Mêrê li bin hikmê jinê, rûspî nabî li dinê (Hecî Cefer, 1986: 96). Ev gotin ji me re dibêje ku gereke mêr ne li ber axaftina jinê be, her tiştê got bi cîbîne. Herwisan tê wê ramanê ku her kesê ji pêdivî pêhtir guhdarîya jinê bike, rûspî nabe li dinê.

Du bê aqil hene li dinê, yê diçît li rê bi tinê, yê guhê xwe bidete jinê (Hecî Cefer, 1986: 51). Ev gotin tê wê ramanê ku gereke mirov guhdarîya jinê neke. Ew kesên guhdarîya jinên xwe dikin, bi bêaqil dane eşkerekirin. Helbet guhdarîkirina jinê li hemû deman ne xerabe. Jiber ku hinek caran zelum hizrekê nake. Lêbelê jin wê hizrê dike. Evca guhdarîkirina jinê di malê da fere. Di hinek karan da jin ji zelumê

jêhatîtire. Eger em li dûv van gotinan herin, wê jîyana me têkeve hinek nexweşîyan. Lewre jibo xweşkirina jîyana me gerek mirov bi regezê mê jî bişêwire.

Berxên li ber bizinê, mişkên li terazinê, mêrên bi xebera jinê bi hesabê mirinê (Celalî, Mela Êsiv, 2014: 19). Di vê gotinê da pêşinanên me sê kar şibihandîne mirinê. Yek ji wan karan mêrê guhdarîya jinan bike, weke mirnê ye, yanî kesê wisa be weke mirîya ne.

2.2.10.2. Perwerdekirin Li Ser Lêxistina Jinan

Herçende li ser lêxistina jinan, çî başî bu zelumî pêve nayê. Lêbelê mezinên me di hinek gotinan da, zelum pal daye wê yekê ku jina xwe bikute û lêbixe. Ev lêxistine jibo wê yekê ye, da ku jin guhdarîya zelumê xwe bike û li bin fermana wî dernekeve. Di kevin da tê gotin lêxistina jinan li cem Kurdan mêranî bu. Ew zelumê li jina xwe ne xistiba, ne zelum bu. Herwisa di vî cureyê perwerdekirinê da niha rêjeyeke kêr nebe li gor vê perwerdekirinê nameşe. Jiber ku sût û mifayên vî curê perwerdekirinê nînin, heta başîyekê bîne, hezar xerabîyan bi xwe re tîne. Lewre millet li gorî vê perwerdeyê nameşe. Pêşinanên me hinek gotinên gelek kêr li dor vî cureyê perwerdekirinê gotîne. Herwisa di hinek gotinên din da, dijberî vî curê perwerdekirinê, gotin hene. Ev gotinên li jêr hinek mînakî jibo perwerdekirin li ser qotana jinan.

Mînak:

Dar bi sipêna, jin bi pêna (Hecî Cefer, 1986: 50). Ev gotin tê wê ramanê ku jin bi pêhna serast dibe. Yanî qotan bo jinê fere, da ku guhdar bibe.

Darê bi tinê hikmê jinê (Hecî Cefer, 1986: 54). Ji vê gotinê xweya dibe ku bi tenê dar hikmî li jinê dike. Ev jî tê wê ramanê ku gereke, mirov ligel jina xwe bi darî pê ra biaxive.

2.2.10.3. Perwerdekirin Li Ser Hilbijartina Hevjinê

Ev curê perwerdekirinê bi girîngî di gelek gotinan da hatîye behskirin. Helbet girîngîya vê perwerdekirinê bo civakî gelege. Pêşinanên me ev girîngî li ber çav wergirtîye. Lewra bi sedan gotin li ser gotîne. Hilbijartina jineke baş, binyate jibo

avakirina jîyaneke bextewer. Jina baş û bi merîfet, dê nîşekê baş û xizmetkar bo civakê berhem bîne. Perwerdekirin û xwudankirin a zarokan li ser mile jinane, çunkî zelum mêvane li malê. Bi tenê dayîk zarokan perwerde dike. Dayîk çawa be zarokan jî weke xwe perwerde dike. Perwerdeya zarokan dayîk û bav bi hev re dikin. Lêbelê dayîk pêhtir ji babî erkê perwerdekirinê bi sitûyê xwe ve digire. Lewre mezinan gotîne me ku gereke dayîkeke hêja û baş bo zarokên xwe hilbijêre. Ev gotinên li xwarê çend mînakên jibo hilbijartina jineke baş bo hevaltîya jîyana mirov.

Mînak:

Dewara nekire li nîsanê û jina nebijêre li dîlanê (Dêrşewî, Mela Mehmûd, 1980: 119). Evê gotinê em perwerdekirine ku kirîna dewara li nîsanê û hilbijartina jinan li dîlanê, kareke nebaşê. Jiber ku li dîlanê hemû deman keç dibêr xemil û rawşa xwe re diçe, mirov nikare keçê bi sirûştî bibîne.

Avakirina malan di destê jinan da ye (Celalî, Mela Êsiv, 2014: 17). Perwerdeya di vê gotinê da ewe ku avakirin a malan di destê jinan daye. Yanî eger kesek bixwaze ku malekê ava bike, gereke jineke baş ji xwe re bibîne, çunkî ew jin dikare malekê ji mirov re ava bike.

Jina bîne ji eslîya, avê bîne ji kanîya, da bibînî ecêbîya (Hecî Cefer, 1986: 62). Ev gotin me li ser wê yekê perwerde dike ku mirov jina ji wê malê bîne a ku esîl bin, bi nav û dengê xwe di nava xelkê da. Wî çaxî dê mirov tiştê seyirmend bibîne.

Jina bêkes û nanê reş û dewê tiriş, mala min xirab kir (Hecî Cefer, 1986: 64). Ev gotin behsa wê yekê dike ku mirov jina bêkes nîyne ji xwe re. Ji berku jina bêkes, dê hindik fedî bike, ne wekî wê ye a ku ji bab û birayên xwe şerim bike. Di vê gotinê da jina bêkes, nanê reş û mastê tiriş, şibhandîne hev ku hemû bi hev re mala mirov xerab dikin.

Jina bîne ji mala da xoharzî bidin bi xala (Dêrşewî, Mela Mehmûd, 1980: 162). Evê gotinê em perwerde kirine ku ew mala baş be, bila mirov xizmatîyê pêra bike. Jiber ku dê zarokên mirov bi xalên xwe ve diçin.

Jina nebijêre esil xêre (Dêrşewî, Mela Mehmûd, 1980: 162). Ji vê gotinê tê xweyakirin ku gereke mirov li eslê jinê bi pîrse ne li canî û bejna wê. Ew kesê li eslê jinê bi pîrse dê yeke baş û xizmet xweş bi dest bixe.

Bîstana nedane ber nihala, jinê nehîne ji xirabe mala (Hecî Cefer, 1986: 19). Vê gotinê li ser du karan em perwerdekirine. Perwerde a yekemîn dibêje ku mirov

bîstanan li ber nihalan neke. Çunkî li demê av rabona wê zîyan bigihêje mirov. Perwerde a duyem ewe ku malên xerab keçên wan ji xerabin. Gereke mirov ji xwe re neyine.

Çome derîkê rezî, min dît qazana bi kezî, min dayîk dît, dilê min ji keçê teztî (Hecî Cefer, 1986: 19). Pêşinanên me bi gelek gotinan em perwerdekirine ku eger dayîka keçê çawabe, wê ew keç jî wisa be. Yanî keç jî dê mîna dayîka xwe be. Gotineke din jî weke vê a hey. Dayê bibîne dotê bistîne (Dêrşewî, Mela Mehmûd, 1980: 122). Vê gotinê em perwerdekirine ku bo xwastina kiçê, gereke mirov dayîka wê bibîne, paşê keça wê bixwaze.

2.2.10.4. Perwerdekirin Li Ser Neînana Du Jinan

Li dor vî babetî mezinan, ji me re gotine ku yê du jinan bîne wê jîyana wî têkeve nexweşîyan. Yanî bi gotinên xwe ên pir biha em ji wê yekê dûrêkirine ku du jinan bînin. Di çendîn gotinan da xerabîyên du jinîyê ji me re eşkere kirine. Herwisa di hinek gotinên din da, du jinî bi rewîşteke baş daye zanîn. Lêbelê sê jinî bi xerabî û nexweşîyan ve girêdaye. Mînak jî pirin ser vî curê perwerdekirinê.

Mînak:

Mala pir jina, av nema, li meşk û kona (Hecî Cefer, 1986: 99). Yanî ew mala ji jinekê pêhtir têda be, abur di wê malê da nîne. Her jinek dê ji alîyê xwe ve her tiştî bi zêdeyî mezêxe.

Mêrê bi du jina dergevanê (Hecî Cefer, 1986: 99). Perwerdeya di vê gotinê da nîşanî me dide ku ew kesê du jinan bîne, hemû wextan hişyare. Evê gotinê mêrê bi du jinan şibehandîye dergevanan ku ne şevên wî şevî û ne rojên wî rojin.

2.2.11. Perwerdekirin Li Ser Rêzgirtina Mezinan

Mirovên mezin di gelek gotinan da rêz û bihayê kesên mezin bo me eşkere kirîye. Helbet eger em sehbikin gotinên mezinan dê bînin kesên mezin bi binema û bingeha civakî hatîne danîn. Jiber ku hebûna kesên mezin weke çavkanîya jîyanê ne, her tişt û başîya hebe mirov di kare ji wana hîn bibe. Li dor vî babetî me yek gotin ne

dît ku bi xerabî behsa mezinan yan pêşînanên me kiribe. Mîfayên hebûna kesên mezin bo civakî, xêzanê hwd. pirin. Mîrov çend behs bike her hindik dibe. Em jî dê li gor şîyanên xwe hinek ji wan gotinan li jêr binivîsin.

Mînak:

Mîrovêt mezin gunehêt wan çîyane, xêrêt wan mijin (Hecî Cefer, 1986: 98). Yanî eger mirovên mezin çend xerab bin, xerabîya wana jî bi mifaye. Ji xwe xêrên wan bi xwe mifane.

Mala bêmezî, xirab bûye (Hecî Cefer, 1986: 99). Ji vê gotinê bo me xweya dibe ku her maleka mezin têda nebe wêrane. Kesên mezin mala ron dikin, helbet eve jî bi şîret, amojgarî û axaftinên wan ên pir bihane.

Heke mezin, bûne ker, divê pêt xwe lê nehejin (Hecî Cefer, 1986: 112). Ev gotine nîşanî me dide ku eger kesê mezin yan kesê pîr çend bêaqil be nabe mirov bi bêaqilîya wî pêra eleqedar be.

Mezin bibit ker gerek mirov nedit ser (Dêrşewî, Mela Mehmûd, 1980: 288). Eger mezin çend kesek jar û bêked be, nabe mirov li gorî wê çendê pêre eleqedar be. Yanî mezinên me bi vê gotinê, em perwerdekirine ku kesê mezin çawabe, rêz û biha gereke jêre were dayîn.

Karîte bişkê destek ranawestî (Deştêkî, Umer Şêxelah, 1985: 59). Yanî eger mezin neman, piçûk bêmfane.

2.2.12. Perwerdekirin Li Ser Hizrkirina Mirinê

Li dor perwerdekirina ser vî babetî pêşînanên me, gelek şîret û amojgarî li me kirine ku em karbikin jibo roja dumahîkê. Bi vê perwerdekirinê em şîretkirine bo encam dayîna xêran. Herwisan di gelek gotinan da mirin li bîra me anîye. Dîsan di hinek gotinên din da mirin anîye hizra mirov da ku mirov jibo wê rojê xebatê bike.

Mînak:

Mirov ji çî tîrnabît, ji bilî axê (Hecî Cefer, 1986: 99). Yanî li dinyayê mirov çend bike, mirov tîr nabe, heta dimire. Dîsan tê wê ramanê ku bi tenê ax mirov tîr dike. Mirov çend salan di dinyayê da be, çî caran jê tîr nabe.

Mirov rojekê dibe, êkê dimerît (Hecî Cefer, 1986: 99). Evê gotinê em perwerdekirine mirin li hizra mirov be. Her kesek ji me hebe wê rojekê bimire. Pêşînanên me, em perwerdekirine ku hemû wextan hizrkirina mirinê li ser hizra me be.

Mirin kerê beqalane, ber derê hemî malane (Hecî Cefer, 1986: 98). Evê gotinê mirin şîbihandîye bi kerê beqalan, jiber ku kerê beqalan diçe ber derê mala her kesî. Wisa mirin jî berderê mala hemû kesane. Yanî gereke mirov xwe jibo mirinê hazir bike.

Mirin hespê boze. Li der mala her kesîye (Celalî, Mela Êsiv, 2014: 213). Ev gotin bi ramana xwe weke ya berî xwe ye. Yanî mirin ber derê mala her kesî ra derbas dibe. Wê rojekê têkeve mala mirov da jî.

2.2.13. Perwerdekirin Li Ser Mêrxasîyê

Di vî cureyê perwerdekirinê da mezinên me ji me re eşkere kirîne ku gereke mirov mêrxas be. Mêrxasî weke rewîstekê regezê nêr, di nav Kurdan da, bihayek zêde jêra hatîye dayin. Mêrxasî di gotinan da, bi gelek reng û cureyan hatîye. Em dê hinek mînakên li ser mêrxasîyê eşkere bikin.

Mînak:

Heke mîr mîr bît, bila xencera wî kêr bît (Hecî Cefer, 1986: 113). Evê gotinê em perwerdekirine ku mêranî ne bi xenceraye, eger mirov mîr bit, bila xencera mirov kêr bit.

Mêrxasî ji dehan yek şere, neh zanîne (Celalî, Mela Êsiv, 2014: 152). Ji vê gotinê em hîn dibin ku mêrxasî ne bes tenê şere. Belkî mêrxasî zanîne, eger kesek, çend mêrxas be. Lêbelê zanîn li gel nebe, qezencê jê nake.

Mêranî bi çarde rengane, ne bi rexit û fişekane (Hecî Cefer, 1986: 98). Ev gotin tê wê ramanê ku mêranî ne bes rexit û fişekin, belkî bi çiarde rangane, yek ji wan rexit û fişekin.

Mirov ne bi nanekî nandar dibe ne jî bi darekî mêrxas dibe (Celalî, Mela Êsiv, 2014: 150). Yanî ne her kesê darek li yekê da, wê bibe mêr. Mêranî ne carekê tenê ye, gereke li hemû deman mêr be. Herwisan mirov bi nanikê jî nabe nandar, gereke gelek caran mirov nan bide, heta bibe nandar.

2.2.14. Perwerdekirin Li Ser Xêrkirina Bi Hişyarî

Di perwerdekirina li ser kirina xêran bi hişyarî, mezinên me, em şîretkirine ku mirov xêrê li gel hemû kesan neke. Jiber ku kesê ne hejayî xêrê be, wê ew xêr ji mirov re bibe nexweşî û nebaşî. Herwisan pêşinanên me, em perwerde kirine ku xêran li gel wî kesî bikin ên xêr pê biçin, da ku xêra mirov cîyê xwe bigre.

Mînak:

Qencîyê di gel wî kesî bike yê bête berçav (Hecî Cefer, 1986: 96). Ji vê gotinê xweya dibe ku eger mirov xêrê li gel kesekê bike û neyê pêşçavan, wî çaxî bila mirov neke baştir dibe.

Ewê min pê fikir xêr, li min bu gurg û şêr (Hecî Cefer, 1986: 15). Yanî di kirina xêran da gereke mirov bizanibe dê xêrê ligel kê bike. Jiber ku xêr û başî li hemû kesa nayê. Kesên nebaş û necamêr nabe mirov xêrê li gel bike, weke mezinên me ji me re gotin.

Qencîya ne di cih da bela ye (Celalî, Mela Êsiv, 2014: 213). Perwerdeya divê gotinê da me hîn dike ku jibo kirina qencîyê mirov baldarbe. Eger qencî di cih da nebe mirov tê nebaşîyê jê bibîne.

2.2.15. Perwerdekirin Li Ser Encamdana Karan Bi Binyateke Baş

Di vî babetî da pêşinanên me, kirina karan bi rast û dirust, bi giringî daye zanîn bo jîyana me a rojane. Hemû kar, eger bi binyateke baş werin encam dayîn, wê

demê dilê mirov rehet dibe. Eger mirov karên xwe bi binyateke baş neke, wî demî dê mirov du caran wî karî bike. Jiber ku cara yekemîn bi nivî maye û cara duyem dê mirov bi dawî bîne. Li dor vê perwerdekirinê mezinên me em agehdarkirine ku hemû karên xwe bi binyateke baş encam bidin. Em dê hinek mînak li ser encamdayîna karan bi rengeke baş û binyatek dirust, li jêr binivîsin.

Mînak:

Dîwarê li ser cemedê, her yê heriftîye (Hecî Cefer, 1986: 53). Yanî eger mirov karên xwe bi binyateke baş neke, wê bê gotin dîwarê ser cemedê ye. Bi wateyeke din ev gotin ji wan karan re tê gotin ên ku xerab bûna wan eşkere be. Eger binyateke baş nedane ji dîwar re, wê bikeve. Ew karên bêbinyat wisane heçko dîwarê li ser befirê, eger befir helîya wê ew dîwar jî bihele.

Asinê bê esas, nedibite şîr, nedibite das (Hecî Cefer, 1986: 13). Eger binyatê hêsin tunebe wî demî ne dibe das ne dibe şûr. Ji vê gotinê xweya dibe ku eger karê mirov bi binyateke baş nebe, bi kêrî çî tiştan nayê.

Şolê ne ji dil, wekî kirasê bêsermil (Hecî Cefer, 1986: 72). Eger kiras çend ciwan be. Lêbelê eger bêsermil be çî bihayê ciwanîyê jêra nîne. Karê ne ji dil şibihandîye kirasê bêsermil. Perwerdeya di vê gotinê da ewe ku dema mirov karan dike, gereke mirov ji dil bike. Da di wî karî da serbikeve.

2.2.16. Perwerdekirin Li Ser Hişyarbûna Ji Dijmin

Gelê Kurd her di kevin da, bi egerê cihê wan yê girîng, gelek dijmin ji wan re çêbune. Mezinên me her di zû da hîsa vê yekê kirîye. Lewra bi çendîn gotinan gelê Kurd ji dijminên wan şîyarkirine. Herwisan di hinek gotinan da kesê bêaqil û dijmin bi yek şibihandîne. Jiber ku herdû nebaşîyê ji mirov re tînin. Ev jî hinek mînak li ser perwerdekirina şîyarbuna li ser dijminî.

Mînak:

Av radizê lê dijmin narazê (Celalî, Mela Êsiv, 2014: 17). Ev gotin ji me re eşkere dike ku dijminê mirov hemû deman hişyare, li ber mirov rawestayê. Dijmin lê

digere ku mirov çavê xwe lê bineqîne da ew jî êrişî mirov bike. Ji xwe hemû wextan çavên dijminan li gelê Kurd bun, her wextê ket da ew êrişa xwe lê bike.

Dijminê te çiqas piçuk be jî hesabê mezin jê re bike (Celalî, Mela Êsiv, 2014: 56). Perwerdeya di vê gotinê da nîşanî me dide ku eger dijminê mirov çiqas lawaz be jî, gereke mirov hizreke mezin jêra bike. Herwisa ev gotin ji me re eşkere dike ku dijminê mirov çî piçûk yan mezin be ferq tune. Dijmin her dijmine çî piçûk yan mezin.

Dijmin li pîyan dost li serîyan dinhêre (Celalî, Mela Êsiv, 2014: 52). Ev gotin tê wê ramanê ku dijmin tu caran çavê wî li hêza mirov venaqete. Gereke mirov hişyarî xwe be. Dostê mirov çavê wî herdem li hizrên mirovîye ka mirov çî dike û çî nake.

Dinya bît bihost, neyar nabîte dost (Hecî Cefer, 1986: 48). Ev gotin ji me re dibêje ku tu caran dijminê mirov nebe dostê mirov. Yanî ev gotin me perwerde dike ku bawerîya xwe bi çî rengan bi dijminê xwe neynin.

Dijminê xwe bi esîdê³ koşt (Dêrşewî, Mela Mehmûd, 1980: 119). Ev gotin ji me re dibêje ku eger mirov bi hêza xwe nikare dijminê xwe, gereke mirov li rêyeke din bigere û bi wê rê mirov neyarê xwe ji nav bibe.

Heke dijmin bibîte gol bêhin nekê (Hecî Cefer, 1986: 112). Perwerdeya vê gotinê ji me re gotîye ku dijminê mirov çiqas xwe baş bike, bila mirov bawerîya xwe pêneyne. Dijmin xwe çend baş bike, li dawîyê her dijmine. Evca bila mirov hişyarî xwe be.

2.2.17. Perwerdekirin Li Ser Yekgirtinê

Vî cureyê perwerdekirinê beşeke pir ji gotinên mezinan bi xwe ve girtîye. Ji berku ev babet di jîyana gelê Kurd a rojane da dihate dîtin. Girîngîya vê perwerdekirinê di wê çendê da ye ku yekgirtin kilîla bidestxistina armanc û hêvîya ne, jibo her gelekê yekgirtî be. Gelê Kurd her di kevin da kêmasîyên vî curê

³ Esîd, danhêre li ber ron û şîranîyê tê çêkirin. Binyatê vê gotinê, dibêjin li gundekê du kes bune neyarên hev. Yek ji wana kir û nedikir nedîşîya ê din. Gelek hizrên xwe kirin, paşan got ezê pêra hevaltiyê bikim. Wî vexwand mala xwe bo nanxiwarinê. Esîd jêra çêkir û gelek şîrî kir. Neyarê da bêjit min bese, da ê din bêjitê ka vê jî ser xatira min bi we. Heta bo spêde neyarê wî mîr, hindî xwarin dabûyê. Ji wî çaxî were ev gotin tê bikaranîn (Dêrşewî, Mela Mehmûd, 1980: 119).

perwerdekirinê hebûn. Lewre mezinên me bi çendîn gotinan, xwestine ev rewîştê henê di nav me da nemîne. Di hinek gotinan da, başîyên yekgirtinê ji me re gotîne. Di hinek gotinên din da nebaşîyên ne buna vî rewîştê ji me re gotîne. Mînak jî li ser vî babetî pirin.

Mînak:

Tifaq çîya werdigerîne (Celalî, Mela Ûsiv, 2014: 195). Weke em dibînin ku çîya gelek bi hêze. Lêbelê eger yekgirtin li cem mirov hebe. Wî demî hêza yekgirtin û tifaqê ji hêza çîyan pêhtir dibe. Mezinên me yekgirtin şibhandîye hêza çîya jiber ku a yekgirtin dike tu tişt nake. Ev gotin tê wê mebestê ku tifaq û yekgirtin dikare çîya wergerîne.

2.2.18. Perwerdekirin Li Ser Nebelavkirina Gotegotan

Pêşînanên me di perwerdekirina civakî da, kêr xemî di çî babetan da nekirîye. Her babetekê hebe ku mîletî pêdivî pê hebe, wê di gotinên mezinan da were dîtîn. Eger babetek çend piçûk be jî, her mezinên me, em ji xerabî û nebaşîya wî babetî bi durxistine, bi gotinên xwe. Babetê belavkirina gotegotan babeteke nebaş û ne hêjayê gelên pêşkeftîye. Nebaşîyên vî babetî, li ser civakî pirin. Lewre mezinan em ji vî rewîştê henê haydar kirine ku xwe jê dur bigrin. Di gelek gotinan da ji me re gotîne ku ew tiştê mirov bi çavê xwe nebîne bila mirov nebêje. Em dê hinek mînakan li ser vî curê perwerdekirinê li jêr binivîsin.

Mînak:

A ku te nedît nebêje (Celalî, Mela Ûsiv, 2014: 13). Evê gotinê em li ser wê yekê perwerdekirine ku axaftinan di nava gel da belav nekin, heta ku ji wê axaftinê piştrast nebin. Herwisan wan axaftinan nebêjin ên ku mirov nedîtîn.

Heta tu nebînî bi çavê xwe, nebêje bi devê xwe (Hecî Cefer, 1986: 121). Evê gotinê em perwerdekirine ku ew tiştê mirov bi çavê xwe nebîne, bila mirov nebêje. Di nava civakî da ev rewîşte gelek belave, dê yek derewekê bike û xelkê din dê belav kin û li ser zêde jî bikin. Lewre mezinên me hest bi vî karê nebaş kirîye, bizavkirine me ji vî rewîştê xerab bi dur bigre.

Tiştê tu nebînê bawer neke (Hecî Cefer, 1986: 31). Vê gotinê em perwerdekirine ku ew tiştê mirov bi çavê xwe nebîne, bila mirov bawer neke. Eger çend kes ji mirov re bibêjin jî bila mirov wê bawer bike a mirov di bîne.

2.2.19. Perwerdekirin Li Ser Rêzgirtina Cîranî

Perwerdekirin li ser rêzgirtina cîrana di gelek gotinan da derbas buye. Bi gelek rengan behsa cîrantîyê di gotinên mezinan da hatîye kirin. Hinek gotinan em paldayîne wê yekê ku rêz û hurmetê li cîranê xwe bigirin. Di hinek gotinên din da behsa cîranê xerab û yê baş kirîye. Herwisa di hinekên din da, cîran bi nêzîktir ji bav û bira danaye. Ev gotinên li jêr hinek mînakin li dor cîrantîyê di gotinên mezinan da.

Mînak:

Heke tişteke te winda bu, heft cara mala xwe lêk bide, paşî pirsyara cîranê xwe bike (Hecî Cefer, 1986: 111). Evê gotinê em perwerdekirine, li ser wê yekê ku hemû wextan hizrên baş ji cîranên xwe bikin. Yanî eger tişteke mirov winda bu, gereke di pêşîyê da mirov li mala xwe lê bigere paşê pirsra cîranê xwe bike.

Li malê xwe muqîyet be, cîranê xwe şermezar neke (Hecî Cefer, 1986: 93). Ev gotin tê wê ramanê ku bila guhê mirov li mala mirov be, bila cîranê xwe neke diz. Lêbelê eger mirov li mala xwe miqate nebe wî çaxî bila mirov gazinan li cîranê xwe neke.

Cîranê nêzîk çêtire ji birayê dur (Hecî Cefer, 1986: 33). Ev gotin me perwerde dike ku cîranê mirov baştîre ji birayê mirov yê dur. Jiber ku eger arîşek çêbu, ew dê zûtir bigihêje mirov ji birayê mirov yê dur.

Pisyara cîranî bike, berî xanî avakey (Hecî Cefer, 1986: 28). Eger xaniyê mirov çend xweş be. Lêbelê cîranên mirov nebaş bin, wê ew xanî bi xweşa mirov neçe.

2.2.20. Perwerdekirin Li Ser Deyîndarîyê

Weke me di destpêkê da gotî, her layenekê baş ê perwerdekirina mirov, di gotinên mezinan da xweya dibe. Perwerdekirin li dor babetê deyîndarîyê, di beşek ji gotinan da tê dîtin. Jiber ku evî babetî peywendeyeke xurt bi jîyana mirov a rojane ve heye. Mezinên me ji me re gotîne ku eger me deyîn kirin bila zû vegeînin bo xwedana. Herwisa bila mirov soza xwe bi cî bîne.

Mînak:

Mirov bimirî deyîn namirî (Dêrşewî, Mela Mehmûd, 1980: 273). Evê gotinê em perwerdekirine ku eger yekê qerek yan deynek, li mirov hebe, gereke mirov her wî qerî jêra vegeîne. Çunkî eger mirov bimire jî, ew qer namire.

De'wa deyînî, her dane (Hecî Cefer, 1986: 51). Yanî eger yekê qerek li moriv be, miheqeq dê bide, evca zû yan dereng. Ev gotin ji me re dibêje ku eger mirov pere yan tişteke din ji yekê qer kir, bila mirov di demê xwe da jêra bizivirîne.

2.2.21. Perwerdekirin Li Ser Merdanîyê

Mezinên me bi gelek gotinan em perwerdekirine ku di her kar û kiryarekê da, em merd bin. Merdanî di gotinên mezinan da bi dil ve hatîye girêdan. Herwisa di çendîn gotinan da merdanî bi dewlemendî û hejarîyê ve nehatîye girêdan. Jiber ku merdanî di dilî daye. Dîsan di gelek gotinên din da qelsîti yan temayî bi rewîşteke xerab û nebaş di civakî da hatîye zanîn. Gotin hene ku behsa wê yekê dikin ku perên qelsan û merdemêran weke hev dicin, yan jî yên qelsan pêhtir dicin. Ev hinek mînakin li ser perwerdekirin li ser merdanîyê.

Tema'î fenayî (Hecî Cefer, 1986: 31). Timahî kêmahî ye (Celalî, Mela Îsiv, 2014: 198). Evan gotinan em perwerdekirine ser wê yekê ku timahîyê di karên xwe da nekin. Jiber ku timahî dibe sedemê kêmahîyê. Eger mirov hizr bike ku dê bi timahîyê qezenc bike, wî çaxî mirov xelete, jiber ku timahî pêhtir dimezêxe. Yanî mezinên me ji me re gotine gereke merd bin.

Temayî ji zengîna ne, merdî ji feqîrane (Hecî Cefer, 1986: 31). Vê gotinê ji me re xweya kirîye ku kesên zengîn timahin û ên hejar di merdîn. Yanî timahî û merdanî ne bi zangînî û hejarîyê ve girêdaye.

Timahî birakuji ye (Celalî, Mela Êsiv, 2014: 195). Ji vê gotinê xweya dibe ku timahî gelek zîyanên xwe ên heyin, weke bira kujîyê ye.

Bibe mêvanê feqîrê merd, nebe mêvanê zengînê nemerd (Hecî Cefer, 1986: 23). Yanî mirov bibe mêvanê hejarê merd, gelek baştîre ji mêvantîya zengînê nemerd. Di gelek gotinan da mezinên me em şîretkirine ku serederîya me li gel kesên merd be.

2.2.22. Perwerdekirin Li Ser Nerakirina Xeman

Di gelek pendan da, tê xweya kirin ku mezinên me, yên xwestine xweştirîn jîyan ji me rebe. Ev jî bi wê yekê ye ku her tişteke mirov ne rihet bike, mezinên me, em jê dûrxistine. Gelek karên heyîn ku mirov ne rihet dikin. Lêbelê ew karê ku mirov berdewam pê ne rihet dibe, ewe mirov qehran ji xwe re çêbike. Çendîn gotin hene ku em durxistine ji vî rewiştê nebaş.

Mînak:

Qedehek jehr vexwe lê misqalek qehr venexwe (Celalî, Mela Êsiv, 2014: 215). Ji vê gotinê xweya dibe ku vexwarina jehrê baştîre ji a qehrê. Yanî nabe mirov xwe dilgiran bike û xwe bi xembêxe jibo dinyayê.

Tiştê çû nede dû (Celalî, Mela Êsiv, 2014: 196). Perwerdeya di vê gotinê da ji me re dibêje ku eger tişteke borî, bila mirov li pey nekeve. Ji xwe ew tişt çu, çi dibe bila bibe, gerek nake mirov li pey bi xem bikeve.

2.2.23. Perwerdekirin Li Ser Çandina Darûberan

Hinek gotin hene ser wê yekê ku pêşinanên me em handayîne bo çandina dar û dirextan. Di hinek gotinan da mifayên hebûna daran ji me re gotine û di hinek

gotinên din da xemil û rewşa darûbaran ji me re gotîne. Ev jî hinek mînakin ser çandina dar û dirextan.

Mînak:

Warê bêdar mîna bûka bê şal (Celalî, Mela Êsiv, 2014: 196). Bûk bi xeml û rewşa xwe bi nav û denge. Eger mirov tişteke can bibîne mirov dişibihîne bûkê. Xemil û rewşa bûkê jî şale, eger bûk çend ciwan be. Lêbelê bêşal be wî çaxî ciwanîya wê bi nayê dîtîn. Ew warê bêdar be weke bûka bêşare. Yanî ew cihe bê xeml û rewşe.

Ne gundê bê rez, ne konê bê pez, ne mêrê dibêjit ez (Hecî Cefer, 1986: 106). Evê gotinê sê rewîştên nebaş ji me re gotîn ku gereke mirov dijberî wan be. Yek ji perwerdeya di vê gotinê da ewe ku ew gundê bêrez be çi girîngîya xwe nîne, xemlên gundan rezin, eger rez nebe wî çaxî bila gund jî nebe.

2.2.24. Perwerdekirin Li Ser Vîyana Welatî

Yek ji wî rewîştê ku mirov şanazîyê pê dike, vîyana miletê mirov e. Mezinên me ev layenê perwerdekirinê bi girîng wergirtine. Bi sedan gotinan em haydar kirine ku ji miletê xwe hez bikin. Ê ku miletê xwe nas neke xwe jî nas nake. Vîyana miletî bi gelek rengan di gotinên mezinan da hatîye. Em jî dê li gorî şîyanên xwe hinek ji wan gotinan eşkere bikin.

Mînak:

Kolkê pîrê xweştire ji birca mîrê Cizîrê (Dêrşewî, Mela Mehmûd, 1980: 233). Evê gotinê em perwerdekirine ku axa mirov yan welatê mirov ji xanî û qesra mîran xweşti re. Gereke mirov kolka xwe nede bi qesra mîran.

Rovîyê miletê xwe, nede bi şêrê bîyanî (Hecî Cefer, 1986: 58). Evê gotinê em perwerdekirine ku hemû wextan miletê xwe ji kesên bîyanî pêhtir hezbikê. Wek di vê gotinê da eşkere ku eger miletê mirov rovî jî be, bila mirov ji kesên bîyanî pêhtir hezbikê. Jiber ku ew rovî dê pêhtir di mifayê mirov da be, ji ê bîyanî.

2.2.25. Perwerdekirin Li Ser Azadîyê

Pêşînanên me em perwerdekirine ku bi azadî û serbestî bijîn. Di çendîn gotinan da behsa jîyana azad kirîne. Ji me re gotîne ku azadî xelateke Xwedê daye me, kes nikare ji me bistîne. Gelek gotinan azadî û mirinê bi hev re girêdayîne. Çunkî jîyana mirov têde azad nebe, wê jîyanê çî bihayê xwe nîne.

Heke azadî nîne, mirin jîne (Hecî Cefer, 1986: 111). Evê gotinê em perwerdekirine ku gereke jibo azadîyê mirov bixebite. Yanî eger mirov azad nebe bila mirov bimire, jibo mirov daha baş dibe.

Bila mirovê mirî bît, neku dibin zûlma dijminî bît (Hecî Cefer, 1986: 23). Yanî eger mirov bimire baştîre ji wê yekê ku di bin gef û sitema dijminî ve bijî.

Bila mirov gayê salekê bît, neçeleka sed sala bît (Hecî Cefer, 1986: 21). Evê gotinê em perwerdekirine ku bila mirov salekê bixebite, neku sed sala koletîyê bike.

2.2.26. Perwerdekirin Li Ser Nerahêlana Xwezîyan

Di vî curê perwerdekirinê da, mezinên me bi gelek gotinan va em hişyarkirine ku xwezîyan nexwazin. Helbet rahêlana xwezîyan çî mifa têda nîne. Lewre mezinên me bi rengeke ciwan di gotinan da em ji vî rewîştê xerab haydarkirine. Di hinek gotinên din da, pêşînanên me ji me re gotine ku bila xwezîyan nexwazin, bila kar bikin da xwezîyan bi dest bixin.

Mînak :

Bi xwezîyan dest nagihêje baqê kezîyan (Celalî, Mela Êsiv, 2014: 21). Perwerdeya di vê gotinê da me hîn dike ku bi xwezîyan tu cara mirov nagêhêje daxwazî û armancan. Gereke mirov li gorî wê daxwazîyê bixebite. Mirov çend xwezîyan bixwaze tu tiştêk pêve nayê, evca a ji xwezîyan mezintir xebate, mirov ji bo xwezîya xwe bixebite.

Jîyan dareke dibêjinê awat, ji berê wê naxoy bê hewil û xebat (Hecî Cefer, 1986: 64). Perwerdeya di vê gotinê da me hîn dike ku ev jîyana em têda, gereke

mirov bixebite, ne bes xwezîyan bixwaze. Bi xwezîyan mirov tu tiştî bidest naxe. Mezinên me em perwerdekirine ku eger me daxwazîyek hebe, bila jibo wê daxwazîya xwe xebatê bikin, heta bidest bixin.

Xweyê hêvîya her rovî ye (Dêrşewî, Mela Mehmûd, 1980: 93). Bi hêvîyan tu caran mirov nagehêje daxwazîyan. Gereke li gel hêvîyan mirov bixebite jî.

2.2.27. Perwerdekirin Li Ser Nefirotna Erdê (Zevîyê)

Di vî curê perwerdekirinê da mezinên me, ji me re gelek gotin gotîne da ku erdê xwe nefiroşin. Erd yan zevî di vê rê da tê wê wateyê jî ku xanî, avahî, cîyê çandinê, rez û bostanan bi xwe ve digire. Firotna erdan li def pêşînanên me kareke xelete. Çunkî pere bimîne tê û diçe. Lêbelê erd dimîne û naçe. Ev jî hinek mînakin li dor vî curê perwerdekirinê

Mînak:

Firotna zevîyê ji mecburîya xwudanî ye (Hecî Cefer, 1986: 77). Mezinên me em perwerdekirine ku tu caran erdî ne firoşin. Jiber ku hebûna erdî gelek mifayên xwe hene. Eger mirov neçar nebe bila mirov malê xwe nefiroşe.

Xwedanê milkî naêxit xolkî (Nîhad Se'dullah, 2001: 9). Yanî xwedanê milkî, çi caran xolkê xwe nahêle. Bi wateyeke din xwedanê milkî hemû wextan wê genc be, xulk yan sîmayê xwe çi caran winda nake.

2.2.28. Perwerdekirin Li Ser Nerakirina Hesûdîyê

Evî curê perwerdekirinê gelek girîngîya xwe a civakî heye. Lewre mezinên me di gelek gotinan da em ji vî rewîştê xerab bi dûr kirine. Helbet ev rewîşte dibe egerê nexweşîyan bo mirov, çunkî eger ev rewîşte li cem mirov hebe, mirov çi xweşîyê bi jîyana xwe nabe. Çunkî wê çavê mirov li xwezîyên kesên din be. Hesûdî di gelek gotinan da bi çavbirçîtî hatîye nîşandan. Ev jî mînake li ser vî curê perwerdekirinê.

Mînak.

Zikê birsî têr dibe belê çavên birsî têr nabin (Nîhad Se'dullah, 2001: 8). Evê gotinê ji me re eşkere kirîye ku eger zikê mirov birçîbe, mirov dikare têr bike. Lêbelê eger çavên mirov birçîbin tu caran têr nabin.

2.2.29. Perwerdekirin Li Ser Nekirina Pesnên Xwe

Di vî curê perwerdekirinê da pêşînanên me, em li ser wê yekê agahdar kirine ku pesnên xwe nekin. Mezinên me di gelek gotinan da behsa wan kesan kirîne yê ku pesna xwe dike, helbet bi xerabî behsa wan kesan kirîye.

Mînak:

Ê ku xwe pesinan, kete tengîya mezinan (Öncü, Mehmet, 2009: 228). Mezinên me bi vê gotinê em perwerdekirine ku ew kesên pesnên xwe bike, wê têkeve tengasîyên mezin.

Heçîyê medhoke, fitoke (Hecî Cefer, 1986: 122). Vê gotinê em perwerdekirine ku pesnên xwe nekin. Ew kesên pesnên xwe dikan, hemû deman kêman dibin.

Di vî beşî da me bizavkirin layenê perwerdekirinê di hinek gotinan da eşkere bikin. Her çende ev xebate beşeke kême li ser layenê perwerdekirinê di gotinên mezinan da. Gelek layenên din yê perwerdekirinê yê di gotinên mezinan da hene. Lêbelê bi tenê me hinek layen behs kirin. Eger me hemû layenên perwerdekirinê yê di gotinên mezinan da behskirana, ev xebata yê gelek dirêjbîya.

Gotinên Mezinan Û Îdyomên Di Tezê Da Hatîne Bikaranîn

A ku te nedît nebêje.

Adarê befrê xwe havête guhêt darê, çû nema heta êvarê.

Aqil taca zêrîne lêbelê di serê hemû kesa da nîne.

Aqir tacî sere belam Leserî hemû kes nîye.

Asinê bê esas, nedibite şîr, nedibite das.

Asteng bê derece nabin.

Av radizê lê dijmin narazê.

Ava li dov berîyê wekî maça li bin perîyê.

Ava xastî, naçit hestî.

Avakirina malan di destê jinan da ye.

Avê berê ber aşa birin. Tu pisyara kengira dikey.

Avê vexo ji kanîya, jinê bîne ji eslîya, da bibînî e'cêbîya.

Aw bitba le pirdî, namerd meperewe.

Axaftina şev û roja nabit êk.

Axaftina şevê ya êvara nahêle.

Axaftina xoş, bihara dilane.

Axivtinê sê cara bîne ber gotinê, paşî bêje.

Axivtinên derewîna dîwarê ser befirêye.

Bedestî xoy agir berdawete malî xoy.

Beq dibêje, heke newîrim dê dirim.

Beqal wê difiroşit tişta liba hey.

Berxê nêr bo ser birîne.

Berxê nêr day bo kêrê.

Berxê nêr her jibo kêrê ye.

Berxê nêr, seba kêr.

Berxên li ber bizinê, mişkên li terazinê, mêrên bi xebera jinê bi hesabê mirinê.

Betalî, xirab malî.

Bi destê xwe agir berda mala xwe.

Bi gulekê nabe bihar.

Bi xwezîya kes negehişte cotê kezîya.

Bi xwezîyan dest nagihêje baqê kezîyan.

Bi zimanê xweş mar ji kunê derdikevît.

Bibe mêvanê feqîrê merd, nebe mêvanê zengînê nemerdd.

Bibîne zehmetê, bixwe nemetê.

Bihar bi gulekê bitenê nayê.

Bihare, gurgî hare.

Bila ez xwarina şêrabim, neku nêçîra rovîya bim.

Bila mirov gayê salekê bît, neçêleka sed sala bît.

Bila mirovê mirî bît, neku di bin zilma dijminî bît.

Bila mirovê mirî bît, neku dibin zûlma dijminî bît.

Bîstana nedane ber nihala, jinê nehîne ji xirabe mala.

Bixêr hatî mamoste.

Ceh dibêjît: Genimo, heta di bîte rimo, ez dê bi feqîrara gehimo. Genim dibêjît cehî:
Ceho, cehano, heta ez dibime nano tu dê bî alîka ker û golcano.

Cîranê nêzîk çêtire ji birayê dur.

Cotîyaro ew çîye tu diçînî? Got: Dema hişîn bî tê bibînî.

Cotyaro ew çîye tu diçînî? Got: Dema hişîn bî tê bibînî.

Çi biçînî ewey dedurûyewe.

Çi biçînî tê wî bibînî.

Çi derd di bê derman nînin.

Çirayê wî geş bû.

Çome derîkê rezî, min dît qazana bi kezî, min dayîk dît, dilê min ji keçê tezî.

Dar bi sipêna, jin bi pêna.

Dara xwezîyê kes li ber siha wê ne rûniştîye xwarê.

Darê bi tinê hikmê jinê.

Dawîya derewan pûçe.

Dayê bibîne dotê bistîne.

Dayê ewa tu dibêjî min li der daye.

De'wa deyinî, her dane.

Deçim aş xerab debê, deçim kanî zûha debê, bê dewletî weha debê.

Dengê daholê ji durve xweşe.

Derdê şivên tim peze .

Destê nekarî gez bikî, tê maçî bikî.

Destê neket, bo birînê başe.

Destê tinê deng jê nayê.

Detkem betop.

Dewara nekire li nîsanê û jina nebijêre li dîlanê.

Di nexweşyan da bira “bi ramana heval yan dost hatîye” eşkere dibin.

Dijmin li pîyan dost li serîyan dînhêre.

Dijminê te çiqas piçuk be jî hesabê mezin jê re bike.

Dijminê xwe bi esîdê koşt.

Dijminek geleke, sed dost pîçekin.

Dinya bît bihost, neyar nabîte dost.

Dinya ware, axiret male.

Dinya ware, axiret male.

Dîwarê li ser cemedê, her yê heriftîye.

Dixwum nan û avê min mineta kesê navê.
Dizê negirtî sultane.
Dîzika kevanî bişkênit bêdenge.
Dost û dijmin le tengawî da beder dekewin.
Dostê xwe hîmî masî girtinê bike, masî xwarin rihet e.
Du bê aqil hene li dinê, yê diçît li rê bi tinê, yê guhê xwe bidete jinê.
Du caran guhdar bike carekî bibêje.
Duhin li, çirê ke, û seyra, melê ke.
Dûr here, zû were.
Ê ku çu helebê hat, ê ku çu helawê nehat.
Ê ku xwe pesinan, kete tengîya mezinan.
Ê ku zû radibe, malê xwe bi bereket dike.
Eger axaftin zîv bit ne axaftin zêre.
Eger axaftin zîv bit neaxaftin zêr e.
Eger bêjî masî çermige bawer nakem.
Eger bibî be pula, dinya bidey be kula, debê birzî le naw xola.
Eger bira piştî bira bê, meger qeder layî Xwa bê.
Eger bum şivanê gundekî, ji her malekê di sitînim nanekî.
Eger ga keft, sîkard zor dibin.
Eger minal siwarî ker bikrêt gewrebê danî zil ebê.
Eger mirov pîr bû, aqil lê dîr bû.
Eger se bo hevalê gurgî, pezî çi halê xwo namînt.
Em çûne qîvara, em hatin êvara.
Eqil be gewreyî û piçûkî nîye.
Ew kanîya te av jê vexwarî, darûbera têwerneke.
Ew mal xirab bibit ewa jin tê da bibit malxiwê.

Ew mirovê şehrezaye, ewê makerê ji pêşve binyasît, heke li dur zivirî faîde nakit.

Ew xem, bo ew dem.

Ewê hate himbankê, ew dê hête qazankê.

Ewê min pê dikir xêr, li min bu gurg û şêr.

Ewey masî bigrêt qingî ter ebêt.

Ewî marî bi destê min nekuje.

Ey bihar, roj bûne zeman, kabanî bûne beqal, rêk bûne hizar.

Ez çum çîyayê dêran, min xwelî avêt bi bêran, gelek jin hene çêtirin ji mêran.

Ez dizanim av di ser çira diçit belê nabêjim.

Ezmanê dirêj, darkukê serê xudanî ye.

Firotna zevîyê ji mecburîya xwudanî ye.

Ga dimirit çerim dimînit, mêr dimirit nav dimînit.

Garan hat zevîyê, kabanî bezî teşîyê.

Garan hat zevyê, kabanî bezî teşyê.

Gelek xwarî xulî ser bîye, pîçek xwarî serferaz bîye.

Goştê mêra ne bi kêşan û pîvane.

Goştî gonî xot bixoy le minetî qesabî baştire.

Guhê xwe bide mezina, bila xelet bo te bêjin.

Gul bê sitrî nabe.

Hecheckek nake havîn.

Heçî bivêt mala xwe bi destê xwe xirab bike bila du jina bînit.

Heçîyê medhoke, fitoke.

Hêka bê zerike.

Heke azadî nîne, mirin jîne.

Heke dijmin bibîte gol bêhin nekê.

Heke dijmin bibîte gul bêhin nekê.

Heke guh nede jinê, para nakey ber minê.
Heke hevalê te bu av, nede nav.
Heke îxbal çû ji bal, xelik dê bêjin, ey bê me'rîfetê bê kemal.
Heke îxbal hate serî bi zire wekî kerî xelik dê bêj te aferî.
Heke mêr mêr bît, bila xencera wî kêr bît.
Heke mêr mêr bît, bila xencera wî kêr bît.
Heke mezin, bûne ker, divê pêt xwe lê nehejînin.
Heke ne dit hakimê heyî, xwelî li serê hatimê teyî.
Heke nezan bît û guhdar bît çarek diçîtê, ema heke nezan bît û neguhdar bît çi care naçinê.
Heke tişteke te winda bu, heft cara mala xwe lêk bide, paşî pirsyara cîranê xwe bike.
Heke ya Xwedê hat ya e'bdâ betale.
Hel destim gurg demixwa, da denîşm aw demba.
Her car cerik biçîte avê, dumahîya wî şikandine.
Her car cerk bi saxî ji bîrê nazvirîteve.
Her kur di çavên dîya xwe da egîdeke.
Her tişteki belayek heye, paşêxistinê gelek bela hene.
Hesp bi hevsaran mêr bi qewil û qeraran.
Heta mirinê kirine.
Heta tu nebînî bi çavê xwe, nebêje bi devê xwe.
Hevalê parî naçit arî.
Hevalêt xwuşîyê di zavin, hevalêt tengîyê di kêmin.
Hevalînî bi sanahîye, belê jêkvebûn zehmete.
Hewa sare, cilik stare, hewa germe, cilik şerme.
Heyî be kurê seyî be.
Hosta necar binive wekî her car şev yeke dergeh hizar.

Hosta nepar were binve wekî her car şev yeke û dergeh hezar.

Îlonê, tam done.

Însan tovê mirinê ye.

Ji hêlînê, çu kulînê.

Ji kerê weye, maker hurî ye.

Jin cîwane, mêr kale, mal xerab. Rojê ewre, bi şev sayî, sal xerab.

Jin heye terşa mala, jin heye rewşa mala.

Jin qedrê jinan dizanin.

Jin û mêr tevir û bêr.

Jina bêheya wek girara bê xwê ye.

Jina bêheya wek girara bêxwê ye.

Jina bêkes û nanê reş û dewê tiriş, mala min xirab kir.

Jina bîne ji esliya, avê bîne ji kanîya, da bibînî ecêbîya.

Jina bîne ji mala da xoharzî bidin bi xala.

Jina nebijêre esil xêre.

Jina nebijêre esl xêre.

Jina şermîn bi şarekê, mêrê şermîn bikarekî.

Jina şermîn bi şarekê, zelumê şermîn bi parekê.

Jintîyê jiber jintîyê mal kir, hewîyê jiber hewîyê xwe ciwan kir.

Jîyan dareke dibêjinê awat, ji berê wê naxoy bê hewil û xebat.

Kabanîyê çav kilê, tijî mala te kersilê.

Karê evro nehêle bo sibehî.

Karîte bişkê destek ranawestin.

Kî wefaye, ew biraye.

Kolkê pîrê xweştire ji birca mîrê Cizîrê.

Kurmanc kere, hingî ruynit ew rê libere.

Lawê derewîn, dixwut carek firavîn.
Li malê xwe muqîyet be, cîranê xwe şermezar neke.
Liber sîbera şêrî be bila şêr te bixut.
Ma ne hêj zûye tû hatî.
Mala bêmezin, xirab bûye.
Mala mêrane, kanya zêrane.
Mala pir jina, av nema, li meşk û kona.
Malê te hebe her kes dostê te ye.
Malxwêtî ket dest jinê da kehrik birî û berxik hişt li bin livayê da.
Me bûk anî bi lezûbez, me lêdan rez û pez, sivka malê her bîm ez.
Mêr kuştin bisanahîye lêbelê tolvekirin bi zehmete.
Mêranî bi çarde rengane, ne bi rexit û fişekane.
Mêrê bi du jina dergevane.
Mêrê fedyok bi kundekî, jina fedyok bi gundekî.
Mêrê li bin hikmê jinê, rîspî nabît li dinê.
Mêrga bi firîz, gayê dev gilîz, zelumê hîz çî cara lê nabine payîz.
Mêrxasî ji dehan yek şere, neh zanîne.
Mezin bibit ker gerek mirov nedit ser.
Mezinahî li hemû kesa nayêt. Mirina li gel hevala dawete.
Mijê çîya mişt, befîr runişit.
Mîn kir te kir, erzê binavê xwe kir.
Mirî bi xêr bit, mirî şo bi xwe tê.
Mirî ne mel'ûn bit gor lê teng nabit.
Mirî û zîndî bi avê paqij dibin.
Mirin hespê boze. Li der mala her kesîye.
Mirin kerê beqalane, ber derê hemî malane.

Mirina li nav şerî çêtire, ji mirina li ber derî.
Mirov bimirit deyîn namirit.
Mirov ji çi têrnabît, ji bilî axê.
Mirov ne bi nanekî nandar dibe ne jî bi darekî mêrxas dibe.
Mirov rojekê dibe û yekê jî dimirit.
Mirov rojekê dibe, êkê dimerît.
Mirov ser sê tiştê tê kuştin: li ser namusa xwe, axa xwe, malê xwe.
Mirovê bîyanî hizar sala bidê guştê ranî, duymahîyê dê li ser key peşêmanî.
Mirovêt mezin gunehêt wan çîyane, xêrêt wan mijin.
Nan û dew, têştê ji drew, nan û mast têştê rast, nan û şîr ew têştê mîr.
Ne gundê bê rez, ne konê bê pez, ne mêrê dibêjit ez.
Ne kiçê bide kurî bêwejinê.
Ne le hewraz bikêşe tûtunê.
Ne malê bibewe ser male babê jinê.
Neçe bajêra bê dirav, neçe gunda bê mirov.
Nede avêt giran da te nebet.
Newal xalîye rovî tê de walî ye.
Nezanê neguhdar derdê wî ye derdek bêderman.
Nîv mêre nabît tere.
Pêy nawê xot be hewal wergirtinewe mandûbikeyit, çunkî her pêt radegeyên rê.
Pisyara cîranî bike, berî xanî avakey.
Piştê wî negire.
Piştî her serevrazîyekê nişêvîyeke.
Qedehek jehr vexwe lê misqalek qehr venexwe.
Qedrê mêvanî serferazîya xudanî.
Qencîya bê me'rîfetî wek nanê bi avê ketî.

Qencîya bê me'rîfetî wek nanê bin av ketî.
Qencîya ne di cih da bela ye.
Qencîyê di gel wî kesî bike yê bête berçav.
Qun fireh be , da 'emr dirêj bî.
Rastî di nav agirî da nasojît.
Rastî di nav agirî da nasojît.
Rêncberê xwe be axayê mala xelkê be.
Rêncberê xwe be, axayê mala xelkê be.
Rih dibin bost lêbelê neyar nabit dost.
Rovîyê milletê xwe, nede bi şêrê bîyanî.
Sê bê'aqil hene li dinê, êk yê biçt peya rêkê bitinê, dû yê li evrazya bikêşt tîtnê, sê yê malê barket biçîte mal baba jinê.
Sebir tehle, belê berê wî şirîne.
Sed bi êkîne, êk bi sedaye.
Ser dahol.
Serê bin minetan biçîte nav zîyaretan.
Serê du berana li dîzekê nayê kelandin.
Serserî.
Seyê bi te'dayî biçîte nêçîrê, nêçîrê naket.
Seyê pê sotîye.
Sibat naçît bê gîya, adar naçît bê gulî.
Sipî bona pirça serî, paş deme, pêş xeme.
Şêr şêre çî jine çî mêre.
Şerê sibê ji xêra êvarê çêtire.
Şêrî got rovî, te ev zanînahe ji kuve anîye? Got: Bi xwîna li teşka gorî da.
Şevê zû dergehî bigre êş tîn, subê zû dergehî veke xêr tîn.

Şol çeke hewce boyê veke.
Şolê bi wextî weku mirê ser textî.
Şolê ne ji dil, wekî kirasê bêsermil.
Şuşeyek jehr vexwe, lê şuşeyek minet venexwe.
Şuxil bu dur, ocax bu kor.
Tema'î fenayî.
Temayî ji zengîna ne, merdî ji feqîrane.
Teyr bi çenga difirin û mêr bi mêra dixurin.
Tifaq çîya werdigerîne.
Tifenga dûr hukim nede destê nezanî, dê bît qetlê serê xudanî.
Timahî birakuji ye.
Tiştê çû nede dû.
Tiştê tu evro dikarî bikî, nehêle bo subehî.
Tiştê tu nebînî bawer neke.
Tu ne'met bê zehmet nabe.
Warê bêdar mîna bûka bê şal.
Warê bêxudan, çi lê şîn nabît.
Werîsê direwa yê kurte.
Xaletê bêhna deyîkê jê dihêt.
Xanyê te tozûbaye.
Xêr xudanê xwe dinîyasît.
Xezîna zêra xilas dibeî lêbelê şulê mêra xilas nabît.
Xudanê sebrê be, mîrê misrê be.
Xwarina evro bi hêle bu sibahî şolê evro ne hêle bu sibahî.
Xwarina evro bihêle bo subahî, şolê evro nehêle bo subahî.
Xwedanê milkî naêxit xolkî.

Xwedê êkê dikete hizar, hizara dikete êk.
Xwedê gotîye: Ji te hereket ji min bereket.
Xwedê hêlîna teyrê kore jî çê dike.
Xwedê heqê vî destî bo wî destî nayêlît.
Xwedê hind baranê dide hingê erd ragirt.
Xwedê rizqê gurgê kore jî dide.
Xwedî malo bi xaltî û bi xalo. Bê malo bê xaltî û bê xalo.
Xweyê hêvîya her rovî ye.
Xweyê sebrê di bit melikê Misrê.
Xwoş here dê bi belayê ra gehî, hêdî here dê bela bi tera.
Yan naçim aşî, yan ezê aşvanî bikûjim.
Yarî bênekê di xuşin.
Yê bêje û neke kerê nêre.
Yê bi kêr xwe nehêt, bi kêr hevalê xwe jî nayêt.
Yê biçit masîyan dê quna wî şil bit.
Yê gelek bixivît, wê xelet bît.
Yê kû nebêje û bike şêre. Yê kû bibêje û bike mêre.
Yê mêr kuj bît, tiblêt wî divajîne.
Yê neha bidet, dê deha sitînît.
Yê nekit zehmet naxut ne'met.
Yê nekit zehmet naxut ne'met.
Yê qenc qencîyê, yê xerab xerabîyê dibîne, lê zû yan dereng.
Yê tînî li avê digert, yê bîrsî li nanî.
Yê xwarî telefe, yê day selefe.
Zadê kelî hêj germ, xirabe biken devî.
Zarok fêqîyê nav malê ne.

Zehmeta gîyanê te zêdebîna nanê te.

Zik reş.

Zikê birçî têr dibin, Lêbelê çavê birçî têr nabin.

Zikê birsî têr dibe belê çavên birsî têr nabin.


Ziman dirêj.

Ziman girtî serê riheteye.

Ziman paleyê xwedîyê xwe ye.

Ziman sore, hereket kore.

Zimanê şîrîn marî ji kunî dînit der.



ENCAM

Di dawîya vê xebata akademîk da cih û girîngîya gotinên mezinan jibo folklorê miletan û nîşên nû zêdetir pêwîste. Li vir wekî encam em dikarin bi kurtî li ser çend xalan bisekinin.

Di zimanê Kurdî da gotinên mezinan “gotinên bav û bapîran yan jî gotinên berê” jibo gotinên mezinan hatîne bikaranîn. Kurdên di erdnîgarîya dinyayê belavbûne bi taybetî jî axa bav û kalên xwe ku diherike deh hezar salan Mezopotamîya û Aranê. Ev coxrafîya jî îro wek welatê Iraq, Îran, Tirkîyê, Ermeniya, Azerbaycan, Rojava, Komarên Asyayê û Gurcîya ne û ewan jî jibo gotinên mezinan dibêjinê “qiseyîn bavan, pêşgotin”. Kurdên Azerbaycanê û Komarên Asyaya naverast jî dibêjinê “gepîdî bavan”. Herwisa di zimanê Erebî da jî dibêjinê; derb el-mesel, emsal , mesel û beyan. Di zimanê Tirkî da jî “atasözü” derbas dibe. Di zimanê Osmanî da jî îbare, beyan û îstîlah jê ra hatîye gotin. Em dikarin li vir bibêjin ku ji hev cuda buna navê gotinên mezinan raste û feqet di ramanê da hemû wek hev in.

Gotinên mezinan beşeke girîng û bibiha a edebê folklorê gelên curbicurin. Bi serpêhatîyên di nava gel da karîger bûye û asta xwe dîyarkirine. Herwisa ji gotin û devên kesianên mezin û xwedî zanist hatîne girtin. Di gel vê ketine li ser zarê zimanên mezin û piçûkan û heta astekê ev gotin bûne destûrê jîyana civakî ,aborî û sîyasî a miletan.

Her gotinek mezinan ji encama rûdanekê yan jî serborekê hatîne ziman. Mirov dikare bibêje ku gotinên mezinan da pêwendîyeka xurt bi dîrokê ve heye. Jiber ku eger mirov bixwaze li dîroka miletekê mêze bike, dibe mirov li gotinên mezinan yê wî miletî binêre. Wî çaxî dîroka wê serdemê eşkere bibe. Ji ber ku her gotinek, dîroka demeke dîyarkirî dide nîşandayîn.

Gotinên mezinan çend ramanekên berz û bilind di nava xwe da hilgirtîne. Di zimanê Kurdî da hinek gotinên mezinan bi rengeke kurt û hinek jî bi rengeke dirêj hatîne nivîsandin. Lêbelê wateyeka bilind di nava wan da heye.

Gotinên mezinan di hişmêndîya civakê da cihê xwe yê girîng girtine. Ji zar devê gel wek pîr û kal, ihtîyar û ciwan, jin û mêr, xwendevan û nexwendevan jî di hemû astên civakê da, jibo encamekê di jîyana rojane da tîn bikaranîn. Lêbelê piranîya wan gotinên mezinan devkîne. Çunkî di nav çanda gelan da radestî guherandinê bûne û bûne malê vê serdemê.

Li ser komkirina gotinên mezinan, bi taybetî jî di nav gelê Kurd li sed salên dawîda, zêdetir ji layê zana û rewşenbîran, gotinên mezina di bin navên mijaran da hatine tomarkirin. Zêdetir pirtûk û belevok çêbûne.

Dîsan di gelek rojname û kovaran da jî girîngî bi gotinên mezinan hatîye dayînê li ser navê ‘‘Pêşgotin, Gotinên Mezinan, Gotinên Berê, Pendî Pêşînan, Pendî Peşînanî Kurd, Qisey Neteqî Kurdî, Watey Becê û hwd. Xebatên rojane çêbûne jibo ronî kirina civakê.

Gotinên mezinan di hemû layên perwerdehîyê da xwe didin nişandan, çunkî gotinên mezinan bi xwe di nav gel da çêdibin û gel jî dixwaze ku bi baştirîn cure were perwerdekirin.

Perwerde di gotinên mezinan da bi hemû rengan tê dîtin. Hemû rewîştên civakî yên Kurdan li serdemên pêşîn da, di gotinên mezinan da eşkere dibin. Di hinek gotinan da perwerdeyek têda heye ku li gel rewîşt û kawdanên niha em têda yek nagirin. Bu mînak eger em li hinek gotinan binêrin, tê bînî ku destek didine me ku li jinan bixin. Di tezê da ev layenê perwerdehîyê jî hatîye eşkerekirin. Her çende di niha da, ev rewîştê xerab hindik buye, lêbelê bi dawî nehatîye.

Di gotinên mezinan da wekhevîyek zêde, di nava gotinên mezinan yên gelên cîhanê da heye. Li ser vê yekê jî mirov nikare bibêje ku ev gotin taybete bi gelekê tenê ve jiber ku mirov dikare bibêje gotinên mezinan berhemên hemû civakên mirovayetîyêne. Bu mînak gotinên li ser karkirinê di gelek zimanan da hatîne gotin. Mirov nikare bibêje ku ev gotin ya gelekê tenê ye. Jiberku karkirin di nava hemû gelên cîhanê da, bi başî hatîye zanîn. Herwisa hemû gelan destek da ye karkirinê. Lewre mirov nema kare bibêje gelên din wergerandin kirîye.

Gotinên mezinan bi gelek reng û cureyan hatine gotin. Hinek ji wan gotinan hevokên kurt yan dirêjin. Hinek gotinên din li ser navê heywanan û ruwekan hatine gotin. Curyê hinek gotinên din, bi rengê pisyar û bersîvê ne. Herwisan hinek gotinên din mîna pênasekirinê (tarîfkirin) ne. Ku li destpêkê navê karekê yan tiştêkê tîne, paşê şirove dike.

Peyvên keleşor û folklore, ji hev cudane. Her peyvek ji vana di bikaranîna xwe da ji a din cudaye. Peyva keleşor peyvek giştîre ji a folklorê.

Folklor ji gelek beşan pêk tê. Di teze da dabeşkarî bo beşên folklorê, li gorî hizra zana û pisporan hatîye kirin. Hizrên wek hev û cuda hatine behskirin. Her beşek folklorî jî dibe çendîn beş, wek stranên Kurdî di bine stranên “govenda, serê zavano, şer û tazîyan hwd.

Gotinên mezinan di bikaranîna xwe da kevin nabin. Hinek gotin hene ku ew peyvên gotin pê hatîye gotinê, niha bikarnayên jî weke berî niha. Lêbelê ew gotin her weke berê niha bikar tê.

Gotinên mezinan û îdyom di derketinê da, hinek caran nêzî hev dibin. Lêbelê di naverokê da ji hev cudane. Renge îdyomekê zêdetir ji ramanekê hebin. Ku berevajî gotinê ye, di gotinê da gelek caran ramanek tenê heye. Beşa herî zêde a gotinan perwerde, şîret hwd ji me re dibêje. Koka îdyoman ser bi zimanî ve ye. Lêbelê a gotinên mezinan ser bi folklorî ve ye. Herwisa bi çî rengan îdyom nayên wergerandin.

ÇAVKANÎ

Çavkanîyên Nivîskî

Akreyî, Xalid Hacî, (2008), *Gotinên Mezinan*, Çapa duyemîn, Bajar Nîne: Weşanxaneya Pak.

Al-Bederî, Tariq Ebdulhemîd, (2004), *Îdaret al-Telîm al-Sefî*, Uman: Weşanxaneya Dar al-Seqafe.

Al-Cewherî, Mihemed, (2006), *Miqedîme fî Dîraset al-Toras al-Şe'bi al-Misrî*, al-Qahîre: Weşanxane nîne.

Al-Ezabî, (2011), *Navê Pirtûkê Nîne*, Bajar Nîne: Weşanxane nîne.

Al-Fera, Ebdulla Umer, (1999), *al-Medxel Îla Teknelocîya al-Telîm*, Uman: Weşanxaneya al-Eriz

Al-Sindî, Bedirxan Ebdulla, (1989), *al-Hikme al-Kurdîye*, Çapa Yekemîn, Bexda: Weşanxane nîne.

Amêdî, Sadiq Bihaedîn, (1973), *Îdyemêt Kurdî*, Bexda: Weşanxaneya Şe'eb.

Amêdî, Sadiq Bihaedîn, (2002), *Ji Folklorê Kurdî*, Çapa Yekemîn, Hewlêr: Weşanxaneya Wezaretî Perwerde.

Ararat Ehmed, (2004), *Qotoyî Etar*, Hewlêr: Weşanxaneya Danaz.

Ararat Ehmed, (2008), *Qotoyî Etar- Qotoyî Duyemîn*, Hewlêr: Weşanxaneya Aras.

Bamernî, Mistefa Nurî, (Sal Nîne), *Stiranêt Koçik û Dîwana*, Bexda: Weşanxane Nîne.

Berwarî, Umer Mihemed Amir, (2013), *Nexşê Li Berîne*, Çapa Yekemîn, Duhok: Weşanxaneya Xanî.

Buxarî, Ebû Abdullah Muhammed b. Îsmail, (1993), *Sehihîha Buxarî*, Dîmaşq – Beyrût: Darul İbnî Kesîr.

Buxarî, Ebû Abdullah Muhammed b. İsmail, (1993), Wrg GIRARÎ, Mela Seîd, *Sehihîha Buxarî*, Îstenbul: Step Ajans Matbaa.

Cîhan İsmâil Umer, (2011), *Şîret û Şîretkarî Di Hozana Civakî Ya Nalbendî Da*, Zanîngeha Duhok: Kolîja Adab, Têza Lîsansa Bilind, Duhok.

Deşteki, Umer Şêxella, (1972), *Pendî Kurdî*, Bergî Yekemîn, Hewlêr: Weşanxaneya Kurdistan.

Deşteki, Umer Şêxella, (1985), *Pendî Kurdî*, Bergî Sêyemîn, Bexdad: Weşanxaneya Dar al-Rîsale.

Doskî, Mihemed Emîn, Kurd Di Gotinêt Mezina Da, *Kovara Vejîn*, Hej: 12, r. 3-16.

Ebû Davûd, Suleyman b. el-Eş'as, (2009) *Sunena Ebû Davûd*, Dîmaşq: Dar'ur-Risaleti'l Âlemîyye.

Efan Heme Şerîf Husên, (2000), Her Pendêkî Kurdî Poxtey Çîrokêke, *Kovara Karwan*, Hej: 143, r. 101-103.

Ehmed al-Cizrawî, (2008), *Ba'z al-Şai' Mîn al-Mesel al-Kurdî al-'Erebî al-Muqarin*, Duhok: Weşanxaneya Xanî.

Ehmed Rehmanî, (2000), Dilopêk Lederyayî Berfirawanî Folklorî Kurdistanî Êran, *Kovara Karwan*, Hej: 145, r.71.

Eredînî, Mistefa Ebdulrehman Unis, (2013), *Serûkanî (Folklor û Keleporê Kurdî) Li Devera Behdînan*, Duhok: Weşanxaneya Hawar.

Ewrehmanî Hacî Marif, (1974), Lebarî Kurdnasîyewe Le Rusîya û Yekîtîya Sovyet, *Kovara Korî Zanyarî Kurd*, Hej: 2, Beşî Yekemîn, r. 499-519.

Fehmî Ezîz Kake Sor, (2000), Pendî Pêşînan, *Kovara Karwan*, Hej: 145, r.82-83.

Fehmî Hesên Reşad, (2013), *Rehendên Sîmantîkî û Piragmatîkî Di Deqê Şanoya Kurdî da*, Têza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Duhok: Sikola Adabê, Duhok.

Gerdî, Ezîz, (1999), *Kêşî Şîrî Kilasîkî Kurdî Ê Berawirdkirdinî Legel Erozi 'Erebî û Kêşî Şîrî Farisî Da*, Têza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Selahedîn: Kolîja Adab, Hewlêr.

- Hecî Cefer**, (1989), *Gotina Me Jî Heye, Kovara Karwan*, Hej: 81, r.32-38.
- Hecî Cefer**, (1999), *Ji Pendên Elmanî*, Çapa Yekemîn, Duhok: Weşanxaneya Kolîja Şerîetî.
- Hecî Cefer**, (2006), *Pejin Ê Gotinê Kurdî*, Hewlêr: Weşanxaneya Hecî Haşim.
- Hecî Cefer**, (2007), *Qefteka Stiranên Folklorî Li Devera Badînan*, Hewlêr: Weşanxaneya Aras.
- Hecî Cefer**, (2013), *Hindek Vekolîn Li Dor Folklorê Kurdî*, Çapa Yekemîn, Hewlêr: Weşanxaneya Şehab.
- Hecî Cefer**, (2013), *Hindek Vekolîn Li Dor Folklorê Kurdî*, Hewlêr: Weşanxaneya Şehab.
- Hirorî, Kamîran Derbaz û Sivan Şikrî**, (2001), *Stiran û Dîlan*, Duhok: Weşanxaneya Xebat.
- Huda Ebdulqadir Qasim**, (2015), *Sîmantîk û Piragmatîka Îdyoman Di Zimanê Kurdî da*, Têza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Duhok: Sikola Adabê, Duhok.
- Îbrahîm Ehmed Simo**, (2001), *Karîgerî Keleporî Kurdî Le Şanoyî Kurdî Da*, Duhok: Weşanxaneya Xebat.
- Îbrahîm Ehmed Simo**, (2017), *Di Navbera Folklor û Keleporîda*, Duhok: Weşanxaneya Xanî.
- Îdrîs Ebdulla**, (2000), *Pendî Pêşînan û Kû Pendêkî Deştî Hewlêr*, *Kovara Karwan*, Hej: 145, r. 89-92.
- Îdrîs Ebdulla**, (2014), *Edebî Millî û Folklorî*, Bergê Duyem, Hewlêr: Weşanxaneya Hacî Haşim.
- Îzedîn Mistefa Resol**, (1970), *Edebî Folklorî Kurdî*, Bexda: Weşanxane Nîne.
- Îzedîn Mistefa Resol**, (2011), *Dîrase fî -Edeb al-Folklor al-Kurdî*, Çapa Duyem, Erbil: Weşanxaneya Hacî Haşim.

Komelêk, (2009), *Serincêk Le Derwazey Folklorî Kurdewe*, Çapa Duyem, Hewlêr: Weşanxaneyê Aras.

Kurduyêv, Qenatê Kurdo, (1976), *Kumele Têkistî Folklorî Kurdî*, Wer: Şukur Mistefa û Enwer Qadir, Bexda: Weşanxaneyê Kurî Zanyarî Kurd.

Mazî, Çîya, (2006), *Ferhenga Gotinên Pêşîyan*, Hewlêr: Weşanxaneyê Hecî Haşim.

Mesûd Cemîl Reşîd, (2014), *Qonaxên Kêşnasîya Hozana Kurdî*, Duhok: Weşanxaneyê Xanî.

Mihna Faris, Nebîl Eub, Faîz Ezam, Hyl Bedir, Necat Salih, Elî al-Men, Fazîl Mensor, Macid Elyan, Ebo Şahîn Elî, Refîq Îbrahîm, Cemîl Xetîb, Malik Selalihe, Amal Elî, Hîşam Bedir, Henne Îdîn, Wer: Nezîr Xanim, (2013), *Menhec Telîmî fî al-Toras al-Dirzî*, al-Qudus: Weşanxaneyê Melot.

Mistefa Salih Kerîm û Mehmed Ehmed Mihemed û Mihemed Nurî Tewfîq û Ehmed Zengene, (1995), *Pendekanî Pîremêrd*, Bergî Yekemîn, Bexda: Weşanxaneyê al-Zeman.

Musaddeq Tovî û yd, *Ansîklopedîya Parêzgeha Duhokê*, Berg 5-6, Batman: 2017.

Mukrî, Kameran (Mihemed Ehmed Teha), (1984), *Edebî Folklorî Kurdî*, Bexda: Weşanxaneyê Zankoya Selahedîn.

Nîhad Sedolla, (2001), *Gotinê Mezina Nexşet Liser Kevrane*, Çapa Yekemîn, Duhok: Weşanxaneyê Kolîja Şerî'yê.

Nivîskar Nîne, (Sal nîne), *Serincêk Le Derwazey Folklorî Kurdewe*, Bexda: Weşanxaneyê Îrşad.

Nizar Mihemed Seyîd, (2011), *Çend Gotin û Pejnên Kurdan Ji Devera Badînan*, Duhok: Weşanxaneyê Hawar.

Nizar Mihemmed Seîd, (1984), *Gotina Pêşîya Di Hozana Nalbendî Da*, *Kovara Karwan*, Hej 20, r. 26-27.

Nuredîn Seîd, (1986), *Govend*, Çapa Yekemîn, Bexda: Weşanxaneyê al-Elaa.

- Nuredîn Seîd**, (1988), *Heyranok Zimanê Evîndara*, Çapa Yekemîn, Bexda: Weşanxaneyê Dar al-Hurîye.
- Öncü, Mehmet**, (2009), *Gotinên Pêşîyan*, Çapa Yekemîn, Stenbol: Weşanxaneyê Berdan Matbaacılık.
- Petî, Umer İbrahîm Ezîz**, (2016), *Folklorperweran Dedwên*, Çapa Yekemîn, Silêmanî: Weşanxaneyê Karo.
- Reşaş, Hemîd**, (2010), *Pendî Kurdî*, Duhok: Weşanxaneyê Spîrêz.
- Ridênî, Wesfî Hesen**, (1983), *Karînanî Folklorî Di nav Hozanê Mizîrî da*, *Kovara Karwan*, Hej: 15, r. 17-22.
- Rohat Alakom**, (2006), *Di Folklorê Kurdî De Serdestîyeke Jinan*, Vg: Mizwîrî, Azad Ebdulezîz, Çapa Duyemîn, Hewlêr: Weşanxaneyê Wezaretî Perwerde.
- Roxzadî Elî**, (1385 k), *Giwarey Kurdewarî*, Çapa Duyem, Senendec: Weşanxaneyê Întîşarat Kurdistan.
- Rustemî, Ehmed Mihemed Mîrza**, (2012), *Xorcên – Lêkolînewe û Babetî Folklorî*, Silêmanî: Weşanxaneyê Kemal.
- Sacîd Aware**, (1989), *Renc Le Pendî Pêşînanî Kurdî Da*, *Kovara Karwan*, Hej: 71, r. 113-114.
- Sedredîn Nuredîn Ebubekir**, (2005), *Berkotêkî Metelî Folklorî Kurdî*, Çapa Yekemîn, Hewlêr: Weşanxaneyê Wezaretê Ruşinbîrî.
- Suzan Taha Resul**, (2015), *Rolê Afret Le Bonyatnanî Komelgey Medenîda*, Têza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Selahedîn: Kolîjê Edebîyat, Hewlêr.
- Şareza, Kerîm Mistefa**, (1976), *Pendî Pêşînan Le Şirî Kurdîda Bexda*: Weşanxaneyê Korî Zanyarî Kurd.
- Şareza, Kerîm Mistefa**, (1983), *Pendî Pêşînan Le Riwaneyê Du Zanisteweyê*, *Kovara Karwan*, Hej: 7, r. 20-23.

Şareza, Kerîm Mistefa, (1987), *Rengdanewey Dîyarde Hawdijekan Le Pendî Pêşînanî Kurdî Da*, *Kovara Karwan*, Hej: 60, r. 18-32.

Şareza, Kerîm Mistefa, (1988), *Dost û Dijmin û Reng Daneweyan Le Pendî Pêşînanî Kurdî Da*, *Kovara Ruşinbîrî Niwê*, Hej: 119, r. 143-151.

Şarezorî, Elî Meruf, (1981), *Pendî Pêşînanî Kurd*, Bergê Yekemîn, Bexda: Weşanxaneyê al-Hewadis.

Şemrexî, Huseyn, (2009), *Mem û Zîn*, Istanbul: Weşanxaneyê Pak Ajans.

Şêzad Sebrî Elî, (2011), *Wate Di Navbera Sîmantîk û Piragmatîkêda*, Çapa Yekemîn, Duhok: Weşanxaneyê Xanî.

Şîlan Umer Hesen, (2009), *Îdyom Çeşin û Pêkhatinî Le Zimanî Kurdî Da*, Silêmanî: Weşanxaneyê Renc.

Şûkrîya Resûl, (1983), *Lêkûlneweyî Zanistî Folklor "Le Ewropa û Le Kurdistan"*, *Kovara Karwan*, Hej: 14, r. 16-24.

Şukrîye Resul, (1988), *Werz û Salnamey Kurdî Le Pend û Qisey Nesteqî Kurdî Da*, *Kovara Ruşinbîrî Niwê*, Hej: 117, r. 111-126.

Şukrîye Resul, (1997), *Rêgakanî Karî Meydanî Folklorî Kurdî*, Çapa Yekemîn, Hewlêr: Weşanxane Nîne.

Şukrîye Resul, (2008), *Edebî Folklorî Kurdî*, Hewlêr: Weşanxaneyê Mukrîyan.

Şukrîye Resul, (2009), *Rolî Margirî Rodîno Le Bojandinewey Keleporî Kurdî Da*, Çapa Yekemînîn, Hewlêr: Weşanxaneyê Zankoya Selahedîn.

Tîgrîs, Amed, (2001), *Gotinên Pêşîyan*, Stockholm: Weşanxaneyê Rewşen.

Umêd Ehmed Elî, (1980), *Çemkêkî Folklorî Kurdîye Derbarî Bîr û Bawerî Pêşînan*, Silêmanî: Weşanxaneyê Raperîn.

Wehîba Mihemed Seîd Yasîn, (2006), *Gotinên Pêşînan Li Devera Badînan*, Duhok: Weşanxaneyê Hawar.

Xal, Şêx Mihemed, (2000), *Pendî Pêşînan*, Silêmanî: Weşanxaneyê Serdem.

Xalid Hisên, (1985), *Dergehek Bo Folklorê Kurdî*, Bexda: Weşanxaneyaya al-Hurîye.

Xanikî, Kovan, (2011), *Usman Sebrî û Alîyek Ji Serbora Wî Ya Edebî*, Hewlêr: Weşanxaneyaya Hacî Haşim.

Xeyat, Abulezîz, (2002), *Heyranok*, Hewlêr: Weşanxaneyaya Wezaretaya Perwerdê.

Zero, Ehmed Ebdullah, (1985), *Mamikên Kurdî*, Bexda: Weşanxaneyaya Wezaretî Rewşenbîrî û Rageyandin.

Wane

Nîbar Bedî', (2012), *Kurdulojî, Lîsans, Adab, Kursê yekê, Beşa Zimanê Kurdî*, Zanîngeha Duhok, Duhok.